



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê

Şaxa Makezanîsta Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

**FONKSIYONÊN ÇÎROKAN
DI PERWERDEHIYÊ DE**

(Vekolîn- Tekst- Analîz)

Servan BAŞDAŞ

12711002

Şêwirmend

End. Hnd. Dr. Mustafa Aslan

Mêrdîn-2018

K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Lîsansa Bilind

FONKSIYONÊN ÇÎROKAN

DI PERWERDEHIYÊ DE

(Vekolîn- Tekst- Analîz)

Servan BAŞDAŞ

12711002

Şêwirmend

End. Hnd. Dr. Mustafa Aslan

Mêrdîn-2018

TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE'DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum “Fonksiyonên Çîrokana Di Perwerdehiyê De (Vekolîn-Tekst-Analîz)” adlı tezin/projenin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin/Projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim/Projemin sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin/Projemin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin/projemin tamamı her yerden erişime açılabilir.

21/06/2018

Servan BAŞDAŞ

KABUL VE ONAY

Servan BAŞDAŞ tarafından hazırlanan “Fonksiyonên Çîrokan Di Perwerdehiyê De (Vekolîn-Tekst-Analîz)” adındaki çalışma, 06/07/2018 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı’nda **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği / oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

[İ m z a]

Doç. Dr. Mehmet Zahir ERTEKİN (Başkan)

[İ m z a]

Öğretim Üyesi Dr. Nurettin BELTEKİN (Üye)

[İ m z a]

Öğretim Üyesi Dr., Mustafa ASLAN (Üye)

[İ m z a]

Doç. Dr. Nesim DORU (TYDE Müdürü)



T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi

Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü

Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

MASALLARIN EĞİTİMSEL İŞLEVLERİ

(Araştırma- Metin – Analiz)

Servan BAŞDAŞ

12711002

Danışman

Dr. Öğretim Üyesi Mustafa ASLAN

Mardîn-2018

T.C.

Mardin Artuklu Üniversitesi
Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü
Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı

Yüksek Lisans Tezi

MASALLARIN EĞİTİMSEL İŞLEVLERİ

(Araştırma- Metin – Analiz)

Servan BAŞDAŞ

12711002

Danışman

Dr. Öğretim Üyesi Mustafa ASLAN

Mardîn-2018

PÊŞGOTIN

Weku tê zanîn çîrok îro ro, ji ber sedemên cihêreng, li gora demên borî nikare hukmê xwe bidomîne. Cihê kal û pîrên me, ku hin ji wan wek gencîneya folklorê ne, bi piranî ji aliyê îcadên teknolojîk ve hatiye dagirtin. Xasma takekesên nifşên van 20-25 salên dawî bêtir di bin bandora teknolojîyê de maye. Loma jî dema ku mirov li nifşên bisiûd ên ku bi çîrokan mezin bûn bifikire, mirov dê bêtir fam bike bê nifşên niha çiqas zêde tişt wenda kirine.

Ev xebata hanê jî hewldanek e ku dixwaze di perwerdekirinê de girîngî û fonksiyonên çîrokan derxe holê, da ku nifşên navborî bêtir bikaribin jê sûd bigirin. Lewra qismek ji nifşên niha herçiqasî bikaribin çîrokan ji pirtûkan bixwînin jî, bi ya me ev hewldan nikare xwe bigihîne wê atmosfera perwerdeker a ku bi destên çîrokê û çîrokbêjan diafire.

Di amadekirina vê tezê de ji ber ku herdem bi zanîn û tecrubeyên xwe rê li ber min vedikir, gelek spasî mamoste û şewirmendê xwe birêz Dr. Mustafa ASLAN re dikim. Herweha spasî serokê juriyê mamosteyê birêz Doç. Dr. M.Zahir ERTEKÎN û endamê juriyê mamosteyê birêz Dr. NURETTİN BELTEKÎN dikim, da ku bi rexne û pêşniyarên xwe ronahî dan pêşiya vê xebatê. Spasdarî her pênc çîrokbêjên xwe H.Şukriyê Barmanî, Fethila BAŞDAŞ, Apê Hemîd, Hisênê Bilalî û Habîb SÎNCAR im ku xwe li ber vegotina çîrokan bi rojan ragirtin; spasiyên taybet jî ji bo H.Şukriyê Barmanî ku piraniya çîrokên vê xebatê ji vegotina wî nizilîn.

Servan BAŞDAŞ

Mêrdîn-2018

KURTE

Ev xebat li ser mijara Fonksiyonên Çîrokan Di Perwerdehiyê De de disekine. Di lêkolînê de têgeha perwerdehiyê di çarçoveya pîrsa “Fonksiyonên çîrokan di perwerdehiya zarokan û mezinan de çi ne?” hatiye nirxandin.

Armanca lêkolînê ew e ku bi destnîşankirina fonksiyonên çîrokan ên perwerdehiyê re hewl dide ku girîngiya tetbîqkirina wan a di dibistan û civakê de derxe holê. Ji bo wê jî ji 5 çîrokbêjên Herêma Mêrdînê 25 çîrok bi metodên hevpeyvîn û çavnêriyê hatin berhevkirin. Ev çîrok di çarçoveyên van metoda de jî hatin nirxandin:

- 1- Metoda “Hînkirina Derbirîna Gotinî” ya ku Ch.Charrier û R.Ozouf.
- 2- Metoda “Analîzkirina Peyamên Çîrokan” ên ku Muhsine H. Yavuz.

Di encama xebata vê tezê de derket holê ku çîrok hem di perwerdehiya zarokan de hem jî di perwerdehiya civakê de xwedî fonksiyonên girîng in. Ji ber vê jî divê ku çîrok di perwerdehiya zarok û civakê de bi materyalên modern ên ragihandin û perwerdehiyê bêtir bîn bikaranîn û ji bo teşwîqkirinê jî cihekî taybet ji çîrokan re were veqetandin.

Peyvên Sereke: Çîrok, Perwerdehî, Fonksiyon, Analîz.

ÖZET

Bu çalışma, Eğitimde Masalların İşlevleri konusu üzerinde durmaktadır. Araştırmada eğitim kavramı “Masalların çocuk ve yetişkinlerin eğitimindeki işlevleri nelerdir?” sorusu bağlamında ele alınmıştır.

Araştırmamız, masalların eğitimsel işlevlerinin belirlenmesinin yanısıra, bu işlevlerin okullarda ve toplumda uygulanışının önemini ortaya çıkarmayı amaçlamaktadır. Bu sebeple Mardin Yöresi’nden röportaj ve gözlem metodlarıyla 25 adet masal derlenerek değerlendirilmiştir. Masallar, aşağıdaki metodlar çerçevesinde incelenmiştir.

1- Ch. Charrier ve R. Ozouf’un “Sözel Anlatım Alıştırmaları” Metodu.

2- Muhsine H. Yavuz’un “Masalların Mesaj Analizi” Metodu.

Tez çalışmamızın sonucunda masalların hem çocuk hem de toplum eğitiminde önemli işlevleri üstlendiği gerçeği ortaya çıkmıştır. Bu gerçekten hareketle masalların çocuk ve yetişkinlerin eğitiminde modern iletişim ve eğitim materyalleriyle kullanımı ve teşviki için özel bir önem verilmesi gerekmektedir.

Anahtar Sözcükler: Masallar, Eğitim, İşlev, Analiz.

ABSTRACT

This work focuses on the function of stories in education. In the research, the concept of education is approached in the context of the question "what is the function of fairy tales in the education of children and adults?"

This research aims to draw attention to the importance of the application of these functions in schools and in society, as well as to determine the educational functions of the tales. For this, 25 fairy tales registered from Mardin Region are studied. The tales are examined within the framework of the following methods.

1- Ch. Charrier and R. Ozouf's "Verbal Expression Learning" Method

2- Muhsine H. Yavuz's "Method of Message Analysis of Cases".

The results of this study confirm my thesis that fairy tales have important functions in both child and community education. This means that a special attention should be given to the use and promotion of fairy tales with modern communication and educational materials in children's and adults education

Key Words: Fairy Tales, Education, Function, Analyze.

NAVEROK

PÊŞGOTIN.....	I
KURTE.....	III
ÖZET.....	IV
ABSTRACT.....	V
NAVEROK.....	VI
KURTEBÊJE.....	VIII
DESTPÊK.....	1
BEŞA 1: MIJAR, ARMANC Û RÊBAZ	4
1.1. MIJARA LÊKOLÎNÊ	4
1.1.1. Fonksiyona Perwerdehiya Çîrokan Bi Giştî	10
1.1.2. Fonksiyona Perwerdehiya Çîrokan Ji Bo Zarokan	12
1.2. ARMANC Û GIRÎNGIYA LÊKOLÎNÊ.....	16
1.3. ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ Û SÎNORÊN XEBATÊ.....	17
1.4. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ Û TEKNÎKÊN HATINE BIKARANÎN.....	18
1.5. PIRSGIRÊK Û ASTENGIYÊN LÊKOLÎNÊ.....	26
BEŞA 2: CURE, TEKST Û PEYAMÊN ÇÎROKAN	28
2.1. CÛREYÊN ÇÎROKAN.....	29
2.1.1. Çîrokên Ajalan	29
2.1.2. Çîrokên Bingehîn	30
2.1.3. Çîrokên Pêkenî, Pêkenokên Binukte, Çîrokên Derewan	31
2.1.4. Çîrokên Zîncîreyî	31
2.2. TEKST, PEYAM Û ANALÎZA ÇÎROKAN.....	32
2.2.1. Tekstên Çîrokên Ajalan	33

2.2.2. Tekstên Çîrokên Neasayî.....	46
2.2.3. Tekstên Çîrokên Rasteqîn.....	55
2.2.4. Tekstên Çîrokên Pekênî, Binukte û Derewan.....	64
2.2.5. Tekstên Çîrokên Zîncîreyî.....	73
BEŞA 3: NÎRXANDÎNA ANALÎZKÎRÎNA PEYAMAN.....	79
3.1. PEYAMÊN CIVAKÎ.....	80
3.2. PEYAMÊN PSÎKOLOJÎK.....	81
3.3. PEYAMÊN ABORÎ.....	83
3.4. PEYAMÊN ETÎK.....	86
ÇAVKANÎ.....	89

KURTEBÊJE

- r.** : rûpel
yd. : yên din
h.c : heman cih
h.b : heman berhem
h.r : heman rûpel
hwd. : her wekî din
wer. : werger
amd. : amadekar
tpg. : tîpguhêz
lêk. : lêkolîn
hj. : hejmar
bnr. : binêre
c. : cih

DESTPÊK

Di serdema ku îro mirovahî lê dijî de ji ber bikaranîna zêde ya cihazên teknolojiyê, bi giştî rêjeya xwendina pirtûkan û bi taybetî jî ya xwendin û guhdarîkirina çîrokan gelekî kêmtir bûye. Mixabin çîrok, ji wan cureyên pirtûkan in ku herî kêmtir xwendin. Ji ber ku van salên dawî filmên karton û anîmasyonên ku tên çêkirin, mijar û lehengên xwe ji çîrokan digirin, bala zarokan êdî ji çîrokan bi gelekî zêdetir çûye ser telewîzyon û sînemayê. Ev tespîta hanê pir eşkere cihguhertina rol û fonksiyona telewîzyon û çîrokê nîşan dide: “Muzîka sînyalê ya reklaman wekî ku fonksiyona lezbareyên ku zarokan li çîrokê germ dikin. Li gorî Kapferer îro ro reklamên telewîzyonê, fonksiyona serwestkirina zarokên biçûk a di derbarê dunyaya derveyî de, bi cih tînin.”¹

Ev xebat dê hewl bide ew çîrokên ku heta 15-20 sal berê di gelek qadên jiyana de, bi taybetî jî di civatan de, dihatin gotin di çarçoveya prensîbên Teoriya Fonksiyonê de li ser Fonksiyona Çîrokan a Perwerdehiyê bisekine. Li vir perwerde, di wateya xwe ya giştî de ye ango mebest jê ne tenê perwerdeya zarokan a li dibistanan e.

Em baş dizanin ku bi demê re kalî û pîrikên civaka me yê ku gelekê wan demekê di civatan de çîrokbêjin jêhatî bûn, hem kêmtir dibin hem jî wê gencîneya çîrokan ji bîr dikin. Li şûna quncikên wan êdî telewîzyon an jî tablet û telefonên mobîl rûniştine. Wekî ku C. Celîl dibêje, “divê di roja îro de em bêtir li defa hewarê bixin; ku em bicehdînin sêwirandinên cîmaetê ji windabûnê xelas bikin.”² Bi vê rastiya tehl ve girêdayî, êdî metirsiyeke belave ya civakî heye: Ji hevdû famnekirina zarokên Kurdînezan û kalî û pîrikên wan ên Tirkînezan. Celîlê Celîl vê metirsiyê, ya ku pêncî sal berê R.Lescot aniye ziman, weha radigihîne me: “Çîrokvan û dengbêj di nav heleqetiyên mexlûqetiyê yê teze da ji bona bi sinata xwe ve mijûl bibin cîyê xwe nabînin... Hinek mîrên temenmezî ji ortê diçin û li pey xwe şagirtan nahêlin, hinek jî wana qet tu tiştî nasêwirînin, yanî jî hostatîya wan a sêwirandinê kêmtir e...”

¹ Mustafa R.Şirin, *Masal Atlası*, Kök Yayıncılık, Ankara, 2007, r. 4.

² Celîlê Celîl, *Zargotina Kurdên Sûrîyeyê*, Wardoz, Amed, 2018, r. 13

Tune roj, ku zarbêj tişteki zargotinê ji bîr nekin.”³ Belkî bi munasebeta xebatên bi vî rengî kalik û pîrikên çîrokbêj dîsa wekî berê li serê quncikê rûnin û çîrokan ji neviyên xwe re vebêjin.

Heta niha gelek xebatên berhevkirina çîrokên Kurdî hatine kirin. Ev xebatên hanê ji aliyê dewlemendkirina arşîva çîrokan gelekî sûdmend in. Lewra, tê zanîn ku arşiv herdem ji bo xebatên lêkolînan daneyên zanistî didin lêkolîneran. Mirov dikare di çîrokan de li ser devok, rêziman, folklor, civak, psîkolojî, bawerî û hwd. de agahiyên wergire. Lêbelê di wan berhevokên çîrokên Kurdî de li ser fonksiyonên çîrokan lêkolîn nehatiye kirin.⁴ Dibe ku ev xebat hinekî din rê li ber xebatên bi vî rengî veke û valahiya ku di vî mijarê de heye, parîkî ji holê were rakirin.

Folklorê Kurdî, ji ber şert û mercên cihêreng bi piranî ji aliyê mîsyoner, balyoz, seyyah û lêkolînerên biyanî ve hatiye kirin. Bêşik, di nav Kurdan de jî xebata pêşengiya folklorê Kurdî Mela Mehmûdê Bazîdî cihekî girîng û seretayî digire. Lêbelê gur û geşiya xebatên folklorê Kurdan ên li gorî rêbazên zanistî piştî gelek tecrubeyên wan ên di rojname, kovar û damûdegezên Kurdî de rû dan. Di serê sedsala 20an de bi saya hin rewşenbîrên ji cihana zanistê haydar, hîmên xebatên folklorê Kurdî hatin danîn. Yek ji wan jî Kemal Fewzî bû ku di xebatên folklorê de daxwaza şopandina rêbaza zanistî kiriye. Law Reşîd jî bi rêbazeke sîstematîk gotinên pêşiyên li gorî naveroka wan dabeş kirine û ew şîrove kirine.⁵ Xebata vî teze jî

³ H.c.

⁴ Mînak; bnr.li pirtûkên Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmançî*, Zîya Avcî(amd.), Lîs, Stenbol, 2010; H.Cindî-E.Evdal, *Folklorê Kurmanca*, Avesta, Stenbol, 2008; O.Celîl-C.Celîl, *Zargotina Kurda II*, aram, Amed, 2013; Celîlê Celîl, *Çima Deve Xeyîdî?*, Wardoz, Amed, 2018; Bro Omerî, *Carekê Ji Caran*, avesta, Stenbol, 2013; H.Akyol, *Senem Xanim*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2000; Çiya Mazî, *Baxek Ji Folklorê Kurdî-Ji Derdora Mêrdîn-*, berbang, Stenbol, 2014; Hilmi Akyol, *Kew û Kew*, do, Stenbol, 2010; Îdrîs Farqînî, *Bi Zarê Êzîdîyan Çîrokên Gelêrî*, J&J, Stenbol, 2011; Feysel Ozdemîr, *Rûpelên Binaxkirî*, J&J, Stenbol, 2013; Mehmet Devîren, *Doxîn 18+*, J&J, Stenbol, 2013; Hilmi Akyol, *Dengbêj û Çîrokbêjên Amedê*, do, Stenbol, 2014; Hilmi Akyol, *Mamê Rovî*, do, Stenbol, 2008; Mahmut Barîk, *Ax Piştî Min*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2003.

⁵ K.Yıldırım, R.Pertev, M.Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, MAÜ TYDE Yay, Mardin, 2013, r.66-68.

hewldaneke xwespartina rêbazên zanista folklorê ye. Xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa 1ê de di bin sernavê “Mijar, Armanc û Rêbaz”ê de bi dorê ev binbeş hatin lêkolînkirin: Mijara Lêkolînê, Armanc û Giringîya Lêkolînê, Çarçoveya Lêkolînê û Sînorên Xebatê, Rêbaza Lêkolînê û Teknîkên Hatine Bikaranîn, Pirsgirêk û Astengîyên Lêkolînê. Herweha mijara Fonksiyona Çîrokan di binbeşa “Mijara Lêkolînê” de hat lêkolînkirin.

Di beşa 2yan de li ser “Çîrok û Cureyên Çîrokan” hat sekinandin. Li gorî hin folklornasan pênaseya çîrokê û cureyên wê yên ku li cihanê standartîze bûne, ligel hin mînakên wan ên di Kurdî de, hatin nasandin. Herweha “Tekst, Peyam û Analîza Çîrokan” hatin dayîn. Çîrok li gorî cureyan û ligel kunyenameyan hatin senifandin û rêzkirin. Di binê her teksta çîrokê de, bi hejmaran, peyamên çîrokan bêyî ku bîrê kategorîzekirin hatin nivîsandin. Di tekstan de devokên çîrokbêjan hatin parastin; lê carinan ji bo rê li ber tevliheviyê bê girtin, di jêrenot û kevanê de hin nîşe hatin dayîn.

Di beşa 3an de jî “Nirxandina Analîzkirina Peyaman” hat kirin. Di vê beşê de çarçoveya teorîk a analîzkirinê hat danîn û nirxandin hat kirin. Wek; Peyamên Civakî, Peyamên Psîkolojîk, Peyamên Aborî û Peyamên Etîk.

BEŞA 1: MIJAR, ARMANC Û RÊBAZ

Di vê beşê de di destpêkê de li ser Mijara Lêkolînê hatiye sekinandin. Paşê jî bi dorê dê li ser Armanc û Girîngiya Lêkolînê, Çarçoveya Lêkolînê û Sînorên Xebatê, Rêbaza Lêkolînê û Teknîkên Hatine Bikaranîn û herî dawî jî Pirsgirêk û Astengiyên Lêkolînê bê sekinandin.

1.1. MIJARA LÊKOLÎNÊ

Çawa ku tê zanîn di serdema me ya îro de bi giştî folklor û bi taybetî jî çîrok ketine bin nîrê jibîrkin û bêqîmetiyê. Mijara vê xebatê hewldanek e ji bo ku ev nîr ji stûyê çîrokê bê derxistin.

Çîrokên vê xebatê bi du sedeman hatine berhevkin. Sedema yekem kêfxweşkirin û ya duyemîn jî perwerdekirin e. Lewra Bascom, fonksiyonên folklorê di bin çar xalan de diyar kirine ku bi taybetî du heb ji wan palpişta çîrokên vê xebatê ne. Yek ji wan fonksiyonan xala yekem ku ew “kêfxweşkirin”e, ya din jî xala sêyem ku ew jî “xebatên perwerdeya wan çandên ku nexwendî ne”. Çar xalên ku Bascom diyar kirine ev in:

- 1-** Yek ji wan fonksiyonên herî girîng a folklorê kêfxweşkirin e.
- 2-** Erêkirina çandê û ya wan saziyên ku rîtuêlan raçav û tethîq dikin.
- 3-** Bi taybetî (lêbelê ne ev bi tenê) xebatên perwerdeya wan çandên ku nexwendî ne.

4- Berdewamkirina xebatên li ser qalibên reftaran ên girîng ku ji aliyê civakê ve hatibûn qebûl kirin lêbelê zêde jî hatine paşguh kirin.⁶

Di xala fonksiyona “kêfxweşkirin”ê de mebest ew çîrokên in ku di nav civatan de ji bo kenandin û kêfxweşkirinê tînin vegotin. Ev cure çîrokên Kurdî bi piranî argo ne û mustehceniyê dihewênin. Lê ev taybetmendiya wan ji bo kêfxweşkirina civatê tu caran nabe asteng. Lewra dema ku kesek dibêje “bisekine ez ji te re meseleyekê an çîrokekê bibêjim”, berî ku em çîrokê guhdarî bikin, yekser bişîrînek tê ser rûyê mirov. Piştî guhdarkirina gelek çîrokan jî mirovên wê civatê bi ken û laqirdiyan kêfxweş dibin.

Di xala sêyem ango xala ku bêtir li ser “xebatên perwerdeyê” disekine de mebest ne tenê perwerdekirina zarokan e; têgeha perwerdeyê di wateya xwe ya giştî de hatiye bikaranîn. Wekî ku tê zanîn, diyardeya xwendinê di nav hin heremên Kurdan de hîn jî ya tune yan jî pir kêr e. Ev jî derfetê dide ku em bêtir bala xwe bidin wan hêmanên ku hîn jî di nav civatan de zindî û fonksiyonel mane. Çîrok jî yek ji wan hêmanan e ku fonksiyona perwerdekirinê jî bi cih tîne.

Di vê xebatê de jî em ê hewl bidin ku fonksiyona çîrokê ya perwerdehî derxin holê. Ji ber vê jî em ê pêşîn li têgeha “Fonksiyon”ê bikolin, paşê bi dorê em ê li ser “Fonksiyona Çîrokan a Perwerdehî”, “Çîrok, Cureyên Çîrokan, Tekst û Analîza Peyamên Çîrokan” bisekinin.

Li gorî Richard Dorson, tetbîqa herî fêrbar a teza fonksiyonê ji aliyê William Bascom ve hatiye kirin. Bascom, venêrîna Malinowski ya di berhema *Di Psîkolojiya Kevnareyan de Mîl* (1926) de berfireh dike û balê dikêşîne ser fonksiyonên curbicur ên folklorê. Li gorî wî, “gotinên pêşiyên ji bo bicihkirina hukmên zagonî, mamik ji bo zîrektirkirinê, efsane ji bo erêkirina rabûn û rûniştinê, stranên gilî û gazincan jî ji bo eşkerekirina neyartiyên xefkirî dibin alîkar.”⁷ Loma jî antropolog bi qasî tekstê, kontekstê jî dikolin.

⁶ William R. Bascom, “Folklorün Dört İşlevi”, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 2*, Geleneksel Yay, Ankara, 2010, r. 78-81.

⁷ Richard M. Dorson, *Günümüz Folklor Kuramları*, (Wer. S.Gürçayır-Y.Özay), Geleneksel, Ankara, 2011, r. 34-35.

Di vir de fonksiyonên keresteyên çîrokan ên li ser civak û kesayetiye çî ne û gelo ev fonksiyon, di serdema me ya nûjen de pêdiviyên mirovan çiqas dabîn dikin? Hîn jî xwedî bandor in an tu bandora wan nemaye?

Dorson dibêje ku di xebatên folklorê de folklorê fonksiyonalîst nêzîkatiyeke teorîk a qanihker e. Antropologên Amerîkî yên pisporê mijara çandê ji ber ku li ser civakên nexwende dixebitîn, ew difikirîn ku bi taybetî pejirandina vê nêzîkatiyê ji bo van civakan guncawtir e... Ew, li ser pirsên wek “di çandê de fonksiyona folklorê çî ye û folklor çawa alîkariya berdewamkirina saziyên civakî dike?” disekinîn.⁸

Çobanoğlu jî di vê babetê de ji Dorson hin zanyariyên din radigihîne û dibêje ku ev rêbaz an jî mekteba lêkolînê ya ku ji aliyê hin dîroknasên folklorê ve wek “folklornasên ku meylê antropolojiyê ne” tê binavkirin, îro ro di xebatên folklorê nûjen de bi awayekî berbelav di bin sernavê “Teoriya Fonksiyonalîstiyê” de tê bikaranîn. Çarçoveya vê teoriyê bêtir ku ji xebatên hev haydar bin ji aliyê Bronislaw Kaspar Malinowski û Alfred Reginald Radcliffe-Brown ve hatiye çêkirin.⁹ Ji ber ku nêzîktêdayîna Brown, Struktural-Fonksiyonalîst e di navbera nêzîkatiyên Malinowski û Brown de hem cudatî hem jî xalên hevbeş hene:

Fonksiyonalîzm û Fonksiyonalîzma Strukturel di salên pêşîn ên sedsala 20an de bûbû berhema civaknasiyê. Li gel vê, aligirên wê referêkirina dîrokê nediparastin. Loma jî hewldaneke veqetîne ya ji peresanparêziyê (evolutionism) ye. Herweha ew, dîfuzionîzmê û hemû hewldanên nîjadnasiyê (ethnological) jî red dikin.¹⁰ Ligel van hevbeşiyên ew bi vê tespîtê jî ji hev vediqetin.

Radcliffe-Brown bi taybetî naxwaze ligel Malinowski navê wî wek “fonksiyonalîst” were nivîsandin. Di bingeha vê cudahiye de ev heye; mijûlbûna Malinowski ya li ser kesên biyolojîk û mijûlbûna wî ya li ser wan kesên ku hem aîdî

⁸ H.b., r. 33.

⁹ Özkul Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ, Ankara, 2012, r. 67.

¹⁰ Sibel Özbudun, Balkı Şafak, N.Serpil Altuntek, *Antropoloji, Kuramlar/Kuramcılar*, Dipnot Yay, Ankara, 2006, r. 100.

civakên cuzî (particular) ne û hem “rolên civakî” yên diyar dilîzin. Brown xwe dispêre civaknasiyeke ku alîkariyê ji rêbazên zanistên xwezayê digire.¹¹ Li vir ji ber ku Malinowski rasterast û bêtir bi mijarê ve peywendîdar e dê li ser kurtejiyan û xebatên wî were sekinandin.

Eleqeya Malinowski ya ku nîşanî berhema James George Frazer a bi navê *The Golden Bough (Şitla Zêrîn)* dida, berê wî da antropolojîyê. Malinowski di xebata xwe ya etnografîk de ya ku nêzî çar salan li Gravên Trobrîandê meşand; ligel danîna hîmên rêbazên lêkolîna modern bingeha ramana xwe ya çanda fonksiyonalîst jî ava kir. Helbet ev tecrubeyên wî ji hin antropolog û folklornasên pêşerojê re bûn modelin kêrhatî. Her çiqas Boas beriya wî di vî warî de xebitî be jî, damezrînerê herî girîng ên rêbaz û teoriya fonksiyonalîst Malinowski ye.¹²

Bronislaw Malinowski, vê rêbazê weha pênase dike: Fonksiyonalîzm, hevtemen e bi destpêka lêkolînkirina wan mirovên ku ne wekî me ne; ango wan mirovên ku ji çandên wan re hov û barbar tînin gotin.¹³ Herweha ew vê rêbazê dişibîne zarokê herî biçûk ê malbata dibistanên antropolojîyê û xwe jî wek bav û bijîşkê welidandîna vî zarokê dihesibîne.

Herweha derbarê mijarê de divê binê vê tespîta girîng bê xêzkirin. Tespît, ji R.Jakobson û P.Bogatyrev ve hatiye neqlkirin: Di folklorê de tenê formên karbendî (fonksiyonel) ku xwedî nirxeke karbendiyê ne, ji aliyê civakê ve tînin qebûlkirin. Li gorî wan dema ku berhemeke folklorî kete rewşeke bêkarbend ew dê di demeke kurt de bê jibîrkin û wînda bibe.¹⁴ Nirxandineke din a berfireh li ser teoriya fonksiyonê, xulaseya Bedran Hîkmet e. Li gorî wî, Teoriya karîgeriyê (B.Hîkmet ji bo têgeha “fonksiyonê”, “karîgerî” tercih kiriye) ya folklorê “ne tenê bi metna qeydkirî şîrove

¹¹ H.b., r. 125.

¹² Oya Köymen, “Bronislaw Malinowski”, *Türk ve Dünya Ünlüleri Ansiklopedisi*, Anadolu, İstanbul, 1983, c.7, r. 3711-3712.

¹³ B.Malinowski, *Bilimsel Bir Kültür Teorisi*, Kabalıcı Yay, İstanbul, 1992, r. 19.

¹⁴ K.Yıldırım, R.Pertev, M.Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, MAÜ TYDE Yay, İstanbul, 2013, r. 51.

kiriye. Wan, bala xwe daye rola folklorê ya ji bo takekes û civakê û peywenda ku hebûn û berdewamiya folklorê ferz dike, raxistine pêş çavan.”¹⁵

Ji bo ku rêbaza wî baş were fêmkirin, Malinowski pênc xal an jî “Aksiyomên Giştî Yên Fonksiyonalîzmê” diyar kirine:

“1- Çand, pergalek e ku di kakilê wê de amûr hene; mirov bi saya çandê hem li dora xwe û hem jî di pêvajoya dabînkirina pêdiviyên xwe de dikare pirsgerêkan bêtir çareser bike.

2- Çand sistemek e ku ji tiştê, kiryar û bîrûbaweriyên pêk tê. Di vê sistemê de her perçe wek amûreke erkdar ê armançekê cih girtiye.

3- Çand, tevahiyek e ku hêmanên wê yê tîvel bi hevdû ve girêdayî ne.

4- Kiryarên weha di çarçoveya spartekên heyatî yê girîng de xwe bi gelek saziyan bi rêk xistiye. Wek mînak; malbat, qilan, gund, bavik, ji bo alîkariya aborî, polîtîk, dadî an jî yekîneyên ku ji bo aktîvîteyên perwerdehiyê birêkxistî.

5- Ji aliyê dînamîkê ve yanî di çandê de hin hêl li gorî cureya aktîvîteyê tî cudakirin. Wek mînak; perwerde, kontrola civakî, aborî, sistêmên zanyariyan, sinc û bawerî, şeweyên vegotinê yê bihuner û afirîner.”¹⁶

Malinowski piştî ku çarçoveya giştî ya fonksiyonalîzmê bi van pênc xalên li jorê diyar dike, îcar berê xwe dide hewldana pênasekirina wê ya tîgehî. Malinowski berî her tiştî ew peywenda tîgeha fonksiyonê bi yê din re weha zelal dike: “ Divê li vir em ewilî bi eşkere behsa van tîgehan bikin: **Bikaranîn, sûdwegirtin û peywendîdarî.** Em dibînin ku di her aktîvîteyê de tiştek wek perçeyê reftarên teknolojîk, dadî, an jî rewresmî tî bikaranîn û ev tişt ji bo dabînkirina pêwîstiyekê ji mirov re dibe alîkar.”¹⁷ Ew, van pêwîstiyên wek pêwîstiyên bîngehîn ên biyolojîk bi nav dike. Li gorî wî ev pêwîstiyên bîngehîn ên biyolojîk ji kêlîka ku bertekên wan ên

¹⁵ Bedran Hîkmet, *Teorîyên Folklorê*, Lîs, Diyarbakır, 2016, r. 91.

¹⁶ H.b., r. 21-22

¹⁷ H.b., r. 25.

çandî bèn dayîn û pê ve pêwîstiyên nû yên çandî li xwe zêde dikan. Her pêwîstiya mirovî ya çandî ku lê hatiye zêdekirin rê li ber saziya pêwîstiyên, vedike.

Derbarê Teoriya Fonksiyonel de Nail Tan zanyariyên girîng dide û pênasayek weha dike: “Nazariyeya Fonksiyonalîst, ew teorî ye ku tevna berhem û bûyerên folklorê di nav pergala jiyana gel de bi awayekî rêkûpêk dirêse”.¹⁸ Tan, ekol û mektebên folklorê li gorî hin pîvaninan senifandiyê û armanca mekteba fonksiyonalîst weha raber dike: “Ev mekteb ji hêla wan zanyaran ve hatiye avakirin ku ew zanyar bixwe pêbawerên fonksiyon û rolên kifş ên berhem û bûyerên folklorê yên ku her yek ji wan di pergala çanda gel de ne.”¹⁹ Helbet ev mekteb xwedî metoda lêkolînê ye jî. Metoda fonksiyonalîst, “lêkolînê dike li ser fonksiyon, armancên bikaranînê û hêmanên çanda gel ên ku di jiyana civakê de erkdar in.”²⁰

Li gorî Daniel G.Bates, yê ku di ber famkirina rêxistinkirina civakê de herî zêde ked daye Malinowski ye. Ew dibêje ku hemû hêmanên wê civakê, pêdiviyên çandî yên mirovên wê civakê dabîn dikan. Civak jî ji bo ku van pêdiviyên dabîn bike, dest bi avakirina saziyên wek ol, huner, sîstema merivantiyê, huqûq û jiyana malbatê dike. Loma jî ew hêman, fonksiyonel in.²¹

Di vê qadê de bi giştî kêmaniya xebatan xwe nîşan dide. Xasma jî li ser lêkolînkirina keresteyên folklorê kurdî, ji xeynî hin îstîsnayan, kêmaniyêke berbiçav heye. Goldstein dibêje ku “folklornas bi amatoriye tên îthamkirin. Piştî berhevkirina keresteyên xwe bi wê yekê tên sûcdarkirin ku ew hema hema qet tişteki nakin. Mijûliya wan a zêde ya ku li ser teşe û meseleyên hûrik e bala rexnegirên folklorê nekişandiye.”²² Tespîta Goldsteinê ku li ser xebata berhevkirinê berhemeke sereke ya giranbuha diyarî folklornasan kiriye gelekî di cih de ye. Goldstein rexneya Gershon Legman jî weha raber dike: Bêyî lêkolînkirina li ser çîrokên gel û keresteyên

¹⁸ Nail Tan, *Folklor (Halkbilimi) Genel Bilgiler*, Halk Kültürü Yay, İstanbul, 1985, r.17.

¹⁹ H.b., r. 18.

²⁰ H.b., r. 112.

²¹ Daniel G.Bates, *21.Yüzyılda Kültürel Antropoloji*, İstanbul Bilgi Üniversitesi Yay, İstanbul, 2009, r. 27-8.

²² Kenneth S. Goldstein, *Sahada Folklor Derleme Metotları*, (wer. Ahmet E. Uysal), Başbakanlık Basımevi, Ankara, 1983, r. 5.

folklorê, weşandina wan a bi awayê rijî têrê nake. Tiştê ku divê bê kirin, şîrovekirina wan a watedar î têr û tije ye. Tenê bila li ser bingeha analîzekê be; we divê bila sosyo-analîtîk be, we divê psîko-analîtîk.²³

Folklor û keresteyên wê ji bo her civakê xwedî fonksiyonên cuda ne. Ji bo civaka Kurdan ji ber sedemên ku tînan zanîn, xwedî fonksiyonên taybet in. Ev yek jî ji sedema ku kurd ne xwedî derfeta perwerdeya bi zimanê xwe ne û tenê bi riya berhemên folklorî karîbûn zarokên xwe perwerde bikin. Li alîyekî din wekî tînan zanîn kurd bi sedan salan ne xwedî derfetên tomarkirina keresteyên folklorê xwe bûn; ev yek jî bû sedema wendabûna gencîneyeke dewlemend. Niha jî heta derfet hebin, ji bo metnên wan keresteyên ku bi kedên mezin hatine berhevkirin di refên pirtûkxaneyan de nerizin divê ku di dema berhevkerinê de hemû bertek, bandor û tevgerên vebêjer û guhdaran li gel hêmanên din ên zanistî bînin tomarkirin. Bascom li ser vê mijarê jî B. Malinowski weha vediguhêze; “metin, helbet pir girîng e; lê belê metneke ku peywenda wê tune be, mirî ye.”²⁴ Em ê li gorî vê teorîyê li ser rola çîrokan a perwerdehî rawestin.

1.1.1. Fonksiyona Perwerdehî ya Çîrokan Bi Giştî

Wekî tînan Fonksiyonên Çîrokan di xebatên akademîk de ji gelek aliyan ve hatine diyarkirin. Ev fonksiyon di sehayên wek zimannasî, psîkolojî, civaknasî û folklorê de hatine nirxandin. Ji ber ku her fonksiyonek bi serê xwe dikare bibe mijara xebateke akademîk, ne pêkan e ku em di vê xebatê de behsa tevan bikin. Loma jî ev xebat tenê bi fonksiyona perwerdehî ya çîrokan hatiye sînorkirin. Her weha di vê xebatê de têgaha “perwerde”yê ji wateya perwerdeya zarokan zêdetir di çarçoveya wateya xwe ya giştî ango bi awayekî giştî perwerdekirin de hatiye bikaranîn. Têgaha perwerdeyê li gorî gelek nêzîktêdayîn, sîstem û ekolên zanistan ên wek psîkolojî, pedagojî û perwerdeyê hatiye pênasekirin û nirxandin. Pênaseya herî berfireh ya perwerdeyê mebesta me ya ji perwerdehiyê dihewîne. Fikret Kanad têgaha “perwerde” yê, di çarçoveya “wateya herî fireh de, spartina nirxên medenî û kulturî

²³ H.b., r. 5.

²⁴ Bascom, W.R. “Folklorün Dört İşlevi”, h.b. r. 72.

yên millet û cemiyetekê ya ji bo nifşên pêşerojê” pênase dike.²⁵ Selahattin Ertürk jî dibêje ku “perwerde, prosesek e ku dixwaze bi riya tecrubeyên jiyane guherandineke mayinde û meqbûl li ser reftarên takekesan pêk bîne.”²⁶ Di vê çarçoveyê de peyamên çîrokan jî xwedî fonksiyonên perwerdehî ne. Mirov dikare vê pênaseyê li gorî mijara çîrokan jinûve weha formule bike: Di çîrokan de hebûna tecrubeyên jiyane, guherandinên mayinde û meqbûl li ser reftarên guhdaran pêk tîne. Bi vî awayî ew guhdarên ku çî zarok, çî jî mezin bin bi riya peyamên psîkolojîk, civakî, aborî û etîk ve perwerde dibin.

Di xebatên derbarê folklorê Kurdî de heta niha ev teorî zêde nehatiye bikaranîn. Ji ber vê rastiyê jî, ev tespît û rênîşanderiya derbarê xebatên folklorê Kurdî de ji bo rêberiya vê xebatê bû alîkar: Lêkolînên li ser fonksiyonên berhemên edebiyata kurdî ya gelêrî, nemaze ji bo ku awayê têkiliyên wan ên civakî, baştir were famkirin, ew ê gelek bi kêr werin.²⁷

Wekî li jor me amaje pê kiriye, Bascom, di gotareke xwe de behsa “çar fonksiyonên folklorê” dike û dibêje ku yek ji wan jî perwerde ye. Ew ji Raum neqil dike ku “bi taybetî kar û xebatên perwerdekirinê yê wan çandên ku (lêbelê ne bi tenê ev) nexwendî ne. Li vir ji bo zarok bîna terbiyeyê çîrokên hûtan tîna bikaranîn û paşê ji bo ku fikrên jîrî û hezkirina ji zarokên xwe tîna serên wan û herweha jî ji bo ku zexelî, dijberî û berdûşiyê li ber çavên wan reş bikin; çîrokên ku peyamên exlaqî didin, ji wan re tîna vegotin.”²⁸ Rast e ku ji berê de di nav civatên Kurdan de jî dema ku yekî tiştê nelirê bigota an jî bikira jê re dihat gotin ku “law ma kesî tu şîret li te nekiriye? Qey te şîretê kera vexwariye?” Piştî van rexneyên bi vî rengî ji aliyê navsereyekî ve, ku di wê civatê de hazir bûya helbet, çîrokek bi mijarê ve tîkîldar dihat gotin da ku ew kes dersê jê hilaniya.

²⁵ H.Fikret Kanad, *Pedagoji Tarihi*, Milli Eğitim Basımevi, İstanbul, 1963, r. V

²⁶ Selahattin Ertürk, *Eğitimde Program Geliştirme*, Yelkentepe Yay (Çapa 5.), Ankara, 1984, r. 12; ji bo agahiya berfireh bnr. li Hasan Güneş, *Eğitim Bilimleri Terimleri Sözlüğü*, Ütopya Yayınevi, Ankara, 2015, r. 137.

²⁷ K.Yıldırım, R.Pertev, M.Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha*, h.b., r. 51.

²⁸ Bascom, W.R. “Folklorün Dört İşlevi”, h.b., r. 80.

Celîlê Celîl, di pêşgotina berhevokeke xwe ya çîrokan de, çîrokan wekî “Dersên Kurdîtîyê” dibîne û odeyên malmezinan an axeyan, konê zozanan û ocaxên mirovên nandar dişibîne “Dibistanên Kurdîtîyê.” Celîl weha berdewam dike: “Kurd gotinên xwe kirine çîrok, mesele, metelok, gotinên pêşîyan û bi dewranan çerx kirine. Zarokên Kurdan dersên xwe ji kal û pîrên xwe, li ber destên rûspîyan, wan zanayên nexwendewar qencî û xerabîya dinyayê nas kirine. Bersivên gelek pirsan, di van gotinan da dîtine, Kurdîtîya xwe kemilandine û parastine.²⁹ Esmâ Şimşek jî dibêje ku çîrokên hatine berhevkerin ne tenê ji bo kêfxweşkirinê; lêbelê di heman demê de ew ji bo perwerdekirina guhdaran jî tîn vegotin.³⁰

Bi saya serê van dersan ku nîşên borî tim wan weke spartekeke civakî a girîng hildane ser milên xwe da ku ferdên nîşên piştî wan jî wan dersan fêr bibin û ew jî fêrî yê din bikin. R. Pertev di vê mijarê de dibêje ku bi vî awayî “ferdeke bi tendurust, hevseng, bi aheng, bi xwebawer û civakhez (sosyal) mezin dibe.³¹

1.1.2. Fonksiyona Perwerdehî ya Çîrokan Ji Bo Zarokan

Di her serdemê de şaristanî an jî dewletên pêşketî ew in yê ku sîstemên xwe yê perwerdeyê bi hîmên herî qewîn ên serdemê xwe zexim kirine. Selçuk Kantarcioğlu dibêje, “dema ku lêkolîn li ser dîroka perwerdeyê bê kirin, dê bê dîtin ku hemû pedagogan xwestine ku divê cihana zarokan bi çîrokan bê dewlemendkirin. Hemû agahiyên nû yê di derbarê Psîkolojiya Nû, perwerdeya nû û pêşketina zarokan girîngî dane çîrokê.³² Weke ku Kantarcioğlu, ji pirtûka *Pedagojî Tarihi* ya Fikret Kanad derbarê vê mijarê de neqil dike, “di demên kevînar de li Misir, Çîn, Hîndîstan û Îranê; herweha Babîlî, Asûrî, Fenîkeyî, Îbranî û Yûnaniyan di perwerdeya zarok û mezinan de nirxeke mezin dane çîrokan. Ji bo pesndana qral û

²⁹ Celîlê Celîl, *Çima Deve Xeydî?*, Wardoz, Amed, 2018, r. 7-8.

³⁰ Esmâ Şimşek, *Yukarıçukurova Masallarında Motif Ve Tip Araştırması*, 2001, <https://turuz.com/book/title/yuxari-chuxurova-masallarinda-motiv-ve-tip-arashdirmalari>, (30/12/2017)

³¹ Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, Doz, Stenbol, 2008, r. 110.

³² Selçuk Kantarcioğlu, *Eğitimde Masalın Yeri*, MEB, 1991, r. 41.

firewnan, li dibistanan ji bo fêkirina exlaq, dîn, lehengên gel û dîrokê bi pûtepêdanê hatine bikaranîn.³³

Bi qasî ku di perwerdeyê de amaje bi girîngiya çîrokê tê kirin, berovajî wê yê ku li hemberî bikaranîna wan in jî hebûn. Li Fransayê N. Baileau û J.J. Rousseau angaşt dikirin ku çîrok zîrarê didin zêhna zarokan û wan ji cihana rasteqîn dûr dixin. Loma jî divê bîn qedexekirin; ew mexlûqên tirsehêz dikare rê li ber neyîniyan veke û jiyana wan serûbin bike. Lêbelê çîrok; di fikra Sokrat, Eflatûn û Arîsto de û di dema Romaya Kevin, Perwerdeya Îslamê ya ku Hz. Muhammed da destpêkirin de meqbûl bûn û nehatine qedexekirin. Yê wek Erasme, Rabelais, Montaigne, Comenius û gelek pedagog û ramanwerên din jî heman sekn nîşan dane.³⁴

Helbet hebûna fikrên dijberî çîrokan, nikare parastina rastî, divêti û fonksiyonên çîrokan ji holê rake. Lewra, weke ku Pertev jî amaje pê kiriye, “ger em çîrokan ji zarokan re nebêjin ew dê bixweber çîrokan çêbikin. Nemaze navbera salên 4 û 8an, di lîteraturê de wekî “temenên çîrokî” tên binavkirin. Di navbera van salan de jiyana zarokan bêtir bi hêza fantastîkî ve di nav hevdû de ye.”³⁵ Bêguman dema ku zarok di merheleya afirandinên xeyalî de ji aliyê mezinên wan ve werin handan, dê li hemberî arîşe û rewşên cuda bi awayekî bixwebawer tev bigere û bi ser keve.

Di mijara bikaranîna çîrokan a di perwerdeya hemû tebeqeyên civakê de xebata Yavuz berhemek sereke û aktuel e. Di vê berhema ku ji 90 çîrokên berhevkirî pêkhatiye de derbarê rola çîrokan di perwerdeyê de, nivîskar 517 peyam derxistine. Ev peyam di bin pênc sernavan de dane: Peyamên Etîk, Psîkolojîk, Civakî, Aborî, û Yê Din. Yavuz van peyaman weke fonksiyonên çîrokan ên perwerdeyê bi nav dîke û dibêje ku “çîrok fonksiyonên xwe yê perwerdeyê, bi rêya wan peyamên ku dixwazin bidin guhdar û xwîneran, bi cih tînin.”³⁶ Nivîskar, bergeha bîr û boçûna xwe ya ku “çîrok civakê perwerde dîke” bi vî awayî berfireh dîke: “Mirovan rastiya

³³ H.b., r. 22-23.

³⁴ Selçuk Kantarcioglu, h.b., r. 24-5; Ramazan Pertev, h.b., r. 111-112.

³⁵ Pertev, h.b., 112-113.

³⁶ Muhsine H.Yavuz, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri*, Cumhuriyet Kitapları, İstanbul, 2009, r. 49.

jiyana xwe, pêşniyarên çareseriyên xwe û hêviyên xwe hemû danîne ser milên bûyer û lehengên çîrokê û bi sedan salan bi vî rengî nifşên pêşerojê hem hişyar û perwerde kirine; hem jî li hemberî zehmetiyan ew bi de yax kirine. Lewra, di navbera rastiyan jiyane û hemû teşqeleyên ku tên serên lehengên çîrokan de dikare hevsengî bê avakirin. Herweha ji wan çîrokan jî rastiya jiyana wê civaka ku aîdî wê ne, dikare bê eşkerekirin. Ji ber ku yek ji wan hîmên bingehîn ên ku wê civakê perwerde dikin, çîrok in.”³⁷ Helbet ev peyam û hişyarî jî pêdiviyên jiyana mirovan ji gelek aliyan ve dabîn dikin û dibin rênşander. Îlhan Kızılkaya vê yekê weha diçespîne: “Hişyariyên ku di çîrokan de xweşik hatine bicihkirin, di bîra mirovan de dûr û dirêj dimînin. Mirov di mêjî de hema wisa pê li bişkoka vemirandinê nake.”³⁸

Ch.Charrier û R.Ozouf di berhema *Yaşanmış Pedagoji* de beşa “Hînkirina Ziman û Derbirîna Gotinî” di binê sê merheleyan de nirxandine. Ew merhele bi dorê weha ne: “Pêdiviya Hînkirina Ziman”, “Hînkirinên Ziman Dikarin Çi Bin?” û “Hînkirina Derbirîna Gotinî.” Ji van hersê merheleyan “Pêdiviya Hînkirina Ziman” weha hatiye formulekirin: “Ji bo ku zarok bikaribin fikrên xwe bi awayekî rast û eşkere der bibirin.”³⁹ “Hînkirina Derbirîna Gotinî” jî weha hatiye pênasekirin: “Mamoste, çîrokekê vedibêje; paşê wê çîrokê bi çend xwendevanan dide dubarekirin. Bêguman ev ne dubarekirina tîp bi tîp e; zarok, bi şewaza xwe vedibêjin. Zarokên ku ji bo vê hînkirinê hatine hilbijartin di pêşdibistan, dibistana seretayî û dibistana navîn de ne.” Li gorî metoda “Hînkirina Derbirîna Gotinî ” divê naveroka çîrokan xwedî taybetmendiyên weha be:

a) Çîrok divê balkêş bin: Yanî çîrok divê zarokan têxin atmosfera meraqê, wan bikenînin û hinekî jî wan bi heyecan bikin.

b) Çîrok divê pircure bin: Çîrokên pîrebok û hûtan, fabl û kurteçîrokên exlaqî ji bo zarokên biçûk guncaw in.

³⁷ H.b., r. 19.

³⁸ Îlhan Kızılkaya, *Fêrbûn*, Rûpel, Stenbol, 2014, r. 26.

³⁹ Ch. Charrier-R.Ozouf, *Yaşanmış Pedagoji*, Milli Eğitim Basımevi, Ankara, 1972, r. 217.

c) **Çîrok bi giştî divê kurt û hêsan bin û bi asta her polê ve baş biguncivin:** Ku çîrok zêde dirêj bin dê xwendevan tevahiya çîrokê fam nekin, dê wê ji hev dernexin û ji bîr bikin. Asoxî ast û şumûla zehmetiya vegotina çîrokê divê bi temenê xwendevanan ve biguncive.”⁴⁰

Li gorî Ch.Charrier û R.Ozouf metoda Hînkirina Derbirîna Gotinî di nav zincîreya hînkirinên gotinî de xwedî girîngiyeke taybet e. “Ew cazîb e; lewra tu xwendevan tune ku ji guhdarîkirina çîrokê û ji vegotina çîrokan a ji bo hevalên xwe aciziyar bike. Ew biber e; lewra xwendevanan hişyar dihêle, reqabetê di nav wan de çêdike û zorê dide wan ku bersiva xwe bi hevokeke ji rêzê nedin, lêbelê wan mecbûr dike ku mijarekê bi hemû hêlên wê yên girîng ve binirxînin.”⁴¹

Li ser xwendina çîrokê hin tespîtên din jî hene. Ali Turan Görgü dibêje ku “xwendina çîrokê, aktîvîteyeke alîkar a geşedana ziman e. Axaftina derbarê çîrokê, bersivandina pirsên derbarê çîrokê, dramatîzekirina çîrokê rola geşedankirinê li ser behreya guhdarîkirin û vegotina zarokan dilîze.”⁴² R.Pertev jî li ser rola çîrokê ya di fêrkirina ziman de van agahiyan dide: “Di serî de çîrok û hemû vegotinên gelêrî di fêrbûna zimên de roleke girîng digirin... Bi alîkariya vî zimanî zarok dikare fikrên xwe pêşve bibe, bi awayê têgihîştin û hêza xwe ve cihanekê diyar bike û tiştên nû fêr bibe. Ji bo vê yekê mirov di zimanê xwe de dikare fikir, raman û hestên xwe bi awayekî baştir bîne zimên.”⁴³

Di vê xebatê de em ê li gorî metoda Ch.Charrier û R.Ozouf “Hînkirina Derbirîna Gotinî” tevbigerin. Lewra deh ji çîrokên ku me berhevkin e ji bo perwerdehiya zarokan e û dikevin çarçoveya metoda navborî. Navên wan çîrokan ev in: “Gur û Rêvî”, “Gur, Mîh, Rêvî û Cewrik”, “Elik û Fatik”, “Keçik û Çêleka Zer”,

⁴⁰ H.b., r. 220-222

⁴¹ H.b., r. 225.

⁴² Ali Turan Gorgu, “Masalların Çocuğun Bilişsel ve Duyuşsal Gelişimine Katkısı”, *II. Ulusal Çocuk ve Gençlik Edebiyatı Sempozyumu*, Ankara Üniversitesi, 04-06/10/2006, r. 537.

⁴³ Ramazan Pertev, h.b., r. 107.

“Şivana Qazan”, “Pisîk û Çêlikên Mişkan”, “Şêwra Mişkan”, “Kêç û Mêrû”, “Pîrê û Dîk” û “Hecî Gur.”

1.2. ARMANC Û GIRÎNGIYA LÊKOLÎNÊ

Tê zanîn ku piştî belavebûna bikaranîna alavên teknolojiyê, hukm û bandora hêmanên folklorê ya li ser civakê pir kêr bû. Vegotin, xwendin û guhdarîkirina çîrokan yek ji wan hêmanên girîng e ku niha mîna nirxekî ji tedawulê hatibe rakirin. Mîrov her kêlî û hema li her derê tûşî cazîbeya alavên teknolojiyê dibin ku tim reklamên wan tên kirin. Loma jî vegotina çîrokan, xwendin û guhdarî kirina wan, ku ji bo pêkanîna wan pêdivî qet bi teknolojiyê tune ye, weku bûbe tiştêkî ji rêzê an jî cihê şermkirin û biçûkdîtîne. Bêguman ji bo nişên ku çavên xwe li cihaneke teknolojik a ku bi her cure reng, deng û tevgeran ve hatibe dagirkirin, vekiribe ev nabe encameke surprîz; berovajî wê ev dibe encameke bivênevê. M.Ruhi Şirin li ser vê mijarê ji J.N.Kapferer neqil dike ku êdî reklam, xwedî wê fonksiyonê ne weku tele-pîrikek ji zarokan re çîrokan dibêje.⁴⁴ Li gorî xebatên ku hatine kirin⁴⁵ cihêrengiyê ve xebatê heye. Di xebatên heyî de ji bo lêkolînkirina fonksiyona çîrokan a perwerdehiyê çîrok nehatine berhevkerin; tê dîtin ku ew çîrok ji pirtûkên berhevokan hatine girtin.

Lêkolîna fonksiyona çîrokan a perwerdehiyê li gorî metoda Ch. Charrier-R.Ozouf “Hînkirina Derbirîna Gotinî” hatiye kirin. Armanca vê metodê, “Hînkirina Derbirîna Gotinî” ya zarokên ku di asta dibistanên pêş, sereta û navîn de dixwînin e. Çarçoveya perwerdeya duyemîn jî ji aliyê Muhsine H.Yavuz bi navê “çîrok civakê

⁴⁴ M.Ruhi Şirin, *Masal Atlası*, Kok Yayıncılık, Ankara, 2007, r. 4.

⁴⁵ Bnr. Ibrahim Tarduş, *Bikaranîna Çîrokên Kurdî Di Perwerdeya Zarokan De* (Teza Lîsansa Bilind ya ne çapkirî) Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2015 û Mesut Fidan, *Ji Hêla Perwerdeya Zarokan ve Vekolîna Çîrokan*, (Projeya Lîsansa Bilind ya bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yê Li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013. Ji bo agahiyên berfirehtir binêre li Yakup Aykaç, “Bîbliyografyaya Tezên Beşên Kurdolojiyê Yê Li Tirkiyeyê (2011-2016)”, *The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)*, 2017, <http://jms.artuklu.edu.tr/issue/27754/294524>, (05/03/2018), 119-135.

perwerde dike” hatiye diyarkirin. Ev lêkolîn hewl dide ku girîngiya çîrokê ya di perwerdeya zarok û civakê de bêtir were famkirin.

1.3. ÇARÇOVEYA LÊKOLÎNÊ Û SÎNORÊN XEBATÊ

Bi tevahî 42 çîrok ji bo vê xebatê hatin berhevkirin. Ji vana li ser 25 çîrokan, di çarçoveya Teoriya Folklorê Fonksiyonalîst de, nirxandin hate kirin. Lewra ev 25 çîrok li gorî taybetmendiyên çarçoveya me ya teorîk in. 17 çîrok jî ji ber van sedeman li derveyê sînorê vê xebatê hatin hiştin: Dirêjbûna hinekan û pê ve girêdayî zehmetiya deşîfrekirinê, mustehceniya beloq û kêmbûna dema zagonê. Ligel ku gelek fonksiyonên çîrokan hebin jî me mijar bi Fonksiyona Çîrokan A Perwerdehiyê ve sînor kir.

Ji nav çîrokên ku bûne mijara vê xebatê deh ji bo perwerdehiya zarokan guncaw hatin dîtin. Lewra ev deh çîrok li gorî pîvanên metoda “Hînkirina Derbirîna Gotinê” bûn. Bêguman nirxandina çîrokan a di çarçoveya fonksiyona perwerdehiyê qadeke berfireh e; loma jî me lêkolîn û xebata xwe bi perçeyeke vê qadê ango bi metoda “Hînkirina Derbirîna Gotinê” sînor kir. Bi vê munasebetê jî ji nav 25 çîrokên vê xebatê 10 çîrok ji bo perwerdehiya zarokan hatin hilbijartin. Peyamên van deh çîrokan jî ji aliyên psîkolojîk, civakî, aborî û etîkê ve bi awayekî giştî hatin analîzkirin; lewra pênasekirin û binbeşên zanistên psîkolojî, civakî, aborî û etîkê ne mijarên vê xebatê ne.⁴⁶

1.4. RÊBAZA LÊKOLÎNÊ Û TEKNÎKÊ HATINE BIKARANÎN

Ji bo her lêkolînê hilbijartina rêbaza guncawtirîn xaleke pir girîng e. Heke na, ew xebat dê berhemeke tekuz neafirîne. Xebata berhevkirina keresteyên folklorê jî ji vê pîvanê ne bêrî ye. Lêbelê nayê wê hesabê ku hemû kereste bi heman rêbazan tên

⁴⁶ Ji bo agahiyên berfirehtir bnr. Muhsine H.Yavuz, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri*, Cumhuriyet Kitapları, İstanbul, 2009, r. 49-61.

berhevkirin. Ji bo sûdwegirtineke baş divê mirov berê xwe bide xebatên pêşîn ên bi vî rengî. Derbarê berhevkirina folklorê kurdî de rêbaza Mela Mehmûdê Bazîdî mînakê herî rast e. Berhevkariya Mela Mehmûdê Bazîdî di xebatên derbarê folklorê Kurdî de mînakê yekem e ku xwe spartiyê rêbazeke lêkolîn û teknîkê. A. Jaba dibêje ku “M. M. Bazîdî bi perspektîv û metoda xebata xwe”⁴⁷ ev berhevok amade kirine. *Adat û Rusûmatnameyê Tewayîfê Ekradiyê* “yekem lêkolîna civaknasî, etnolojî û etnografî ya li ser Kurdan e ku bi Kurdî hatiye nivîsandin.”⁴⁸

Rêbazên berhevkirina çîrokên vê xebatê li gorî pîvanên zanistî hatin hilbijartin. Ji bo hilbijartineke baş a rêbazê ev tespît gelekî rênîşanderî kir: “Lêkolînan û kesên ku bi wan re hevpeyvînê pêk tîne, rû bi rû hev dibînin, şaşiyên ku derdikevin holê zûtir tînin sererastkirin, tiştên ku baş nayên famkirin derfeta dubarekirina wan heye û ewlehiya wan bi hev bêtir çêdibe.”⁴⁹

Lêkolîna me di çarçoveya Teoriya Folklorê Fonksiyonalîst de mijarên “Fonksiyona Perwerdehiya Çirokan Bi Giştî” û “Fonksiyona Perwerdehiya Çirokan Ji Bo Zarokan” dihevine. Ji bo di xebatê de bîst bikaranîn ji 5 çîrokbêjên Herêma Mêrdînê 25 çîrok hatin berhevkirin. Xebata berhevkirinê bi du metodên zanistî hat kirin: hevpeyvîn û çavdêrî. Çîrok li gorî cure, kunyename, tekst û peyamên xwe hatin senifandin. Wek pîvan, ji bilî serrastkirinên çend bêjeyan pê ve, me dest neda devokên çîrokbêjan. Herweha me varyantên hin çîrokan jî, bi qasî ku me derfet dît, peyde kirin û çavkaniyên wan dan. Xaleke girîng a vê xebata berhevkirinê jî, senifandina sê çîrokên di bin sernavê “Çîrokên Derewan” de ye.

Me di beşa dawî de ji rastiya ku “her çîrok xwedî peyam e” hereket kir û me nirxandina analîza peyaman di bin sernavên civakî, psîkolojîk, ekonomî û etîkê de kir. Di encama analîzkirinê de hat dîtin ku çîrok ji aliyê peyamên ku dide; dikarin

⁴⁷ Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, Zîya Avcî (amd.), Lîs, Stenbol, 2010, r. 12.

⁴⁸ Mela Mehmûdê Bazîdî, *Adat û Rusûmatnameyê Ekradiyê*, Jan Dost (tpg.-lêk.), Nûbihar, Stenbol, 2010, r. 17.

⁴⁹ K.Yıldırım, R.Pertev, M.Aslan, h.b., r. 146.

hem di perwerdehiya giştî de hem jî di perwerdehiya zarokên ku diçin dibistanê de werin bikaranîn. Ji bilî wê, me cih da hin xalên pêşniyarkirî yên ku rê li ber geşedankirineke muhtemel a ji bo bikaranîna çîrokan vekin. Prosesa rêbaz û teknîkên ku di vê xebatê de hatin bikaranîn weha pêk hat:

a. Amadekarî û Plankirina Berhevkirinê

Amadekarî û plankirina berhevkirinê yek ji wan stûnên qewîn e ku bingeha xebata berhevkirinê ava dikin. Bêyî çêkirina wan, derketina qadê beradayî û karekî çawalêhato ye. Loma jî ev merhele teqez divê ku bi pûtepêdaneke mezin bê kudandin.

Julius û Kaarle Krohn dibêjin “yekem tiştê ku li qada lêkolînê ji folklornas tê payîn, hîlbijartina mijarê û qada faaliyetê ye.”⁵⁰ Me jî di vê xebatê de hewl da ku li hin qadên navçe û gundên Mêrdînê, çîrokên⁵¹ ku di şevên zarokatiyên berê de ji salmezinan dihatin guhdarîkirin, berhev bikin û fonksiyona wan a perwerdehî li gorî rêbazên zanistî yên folklorê binirxînin.

Divê berê pêşîn bersivên wan pirsên ku îskeleta xebata berhevkirin û nirxandina keresteyên folklorê pêk tînin, bèn dayin: “Ew ê çi, çîma, kengî, li ku û çawa were berhevkirin?”⁵² Bêyî bersivandina van pirsên girîng û bêyî şopandina rêbazên guncaw dê xebata berhevkirinê bi ser nekeve. Jixwe folklor, “berî hertiştî usûla çavneriyê bi kar tanî.”⁵³ Folklornas Goldstein ji bo berhevkarên bi kitekit li ser

⁵⁰ Julius Krohn-Kaarle Krohn, *Halk Bilimi Yöntemi*, (wer. Günsel İçöz), (tpg. Fikret Türmen), Türk Dil Kurumu Yay, Ankara, 2004, r. 10.

⁵¹ Di vê xebatê de ji bo ku rê li ber tevliheviyê venebe ji nav têgehên wek çîrçîrok, çîrvanok, xeberoşk, qelîbotk, mesele û hwd. ku wateyên wan nêzî hev in tenê dê têgeha “çîrok”ê dê were bikaranîn. Ji bo nîqaşên berfireh ên di vê babetê de bnr. Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, Doz, Stenbol, 2008, r. 87-89.

⁵² K.Yıldırım, R.Pertev, M.Aslan, h.b., r. 145.

⁵³ Arnold Van Gennep, *Folklor*, (wer. Pertev N.Boratav), Ulus Basımevi, Ankara, 1939, r. 19.

“têkilîdanîna bi kesên çavkanî re û berdewamkirina têkiliyê”⁵⁴ sekiniye. Piştî amadekariya tespît û plankirina berhevkirinê, pêwîstî bi amadekariyeke din î girîng a berî derketina qadê heye.

Xelekeke din a ku zincîra xebatê tamam dike, çêkirina planeke tekûz e. N.Tan derbarê amadekariyên lêkolîna qadê van zanyariyan dide: “Pêşîn plana lêkolînê tê amadekirin. Di vê planê de divê ev xal werin ronîkirin: Armanc, dem, herêma lêkolînê, yên ku dê lêkolînê bikin, teknîkên ku dê bên bikaranîn, amûretên pêwîst û herweha jî ev hemû dê çawa bên peydekirin?”⁵⁵ Dabînkirina van amadekariyên ku nebin nabe, helbet bi xwendina pirtûkên li ser mijarê, pirsgirêkên muhtemel sivik dike. Derbarê vê merheleyê de lîsteya Goldstein, rênîşander e. Pêşniyarên wî weha ne: “Xwendina pirtûkên li ser mijarê, çêkirina çavkaniyên xebatê, temasa bi berhevkarên, temasa bi rîspiyên herêmê re, tomarên ku berê li herêmê hatine kirin, teçhîzat û malzemeyên pêwîst û asta folklornasiya berhevkar.”⁵⁶ Piştî dabînkirina pêwîstiyên vê lîsteya sûdmend divê ku yek berê xwe bide merheleya di dorê de. Ji bo ku hesasiyetên xebatê neyê jibîrkin guhdariya şîreta Gennep jî girîng e: “Bêguman berhevkirina keresteyên folklorê ji çêkirina koleksiyona riwek, kevir û madenan zortir e; lêbelê şewazeke destpêkirina wê heye ku heke hezkirina ji vê zanistê û ji jiyîna li gundan hebe û ku mirovperwerî jî tevî xebata zanistî, civakî û fikrî bibe wê serkeftin pêk were.”⁵⁷

Xalek ji xalên din ên girîng jî amadekirina pirsan e. Ango “pêwîstî bi hin pirsên derbarê kunyenameya çîrok û çîrokbêjan de”⁵⁸ hebû. Li vir ji ber ku mijara xebata qadê, tenê bi çîrokan ve hatibû sînorkirin; hîlbijartina pirsan jî bêguman divê

⁵⁴ Kenneth S. Goldstein, *Sahada Folklor Derleme Metotları*, (wer. Ahmet E. Uysal), Başbakanlık Basımevi, Ankara, 1983, r. 32-53.

⁵⁵ Nail Tan, *Folklor (Halkbilimi) Genel Bilgiler*, Halk Kültürü Yay, 1985, İstanbul, r.72.

⁵⁶ Kenneth S. Goldstein, *Sahada Folklor Derleme Metotları*, Ahmet E. Uysal (wer.), Başbakanlık Basımevi, Ankara, 1983, r. 24-31.

⁵⁷ Arnold Van Gennep, h.b., r. 24.

⁵⁸ K.Yıldırım, R.Pertev, M.Aslan, h.b., r. 178.

bi mijarê re têkîldarbûna. Ji bo arastekirina van pirsan jî pêdivî bi hilbijartina rêbazên guncaw hebû. Rêbaza Hevpeyvînê ya herî guncaw bû.

b. Rêbaza Lêkolînê: Hevpeyvîn û Çavnêrî

Ji bo berhevkirina çîrokên vê xebatê tenê du cure rêbazên lêkolînê hatin hilbijartin. Ji ber ku hewcedariya bikaranîna rêbazên din hasil nebû, lêkolîn bi rêbazên hevpeyvîn û çavnêriyê hat sînorkirin. “Hevpeyvîn, ew rêbaza qadê ye ku ji aliyê berhevkarên folklorê ve ya ku herî zêde tê bikaranîn. Berhevkar bi hevpeyvînê bi ser van agahiyan vedibe: Zanyariyên kesên çavkanî yên berê, yên niha û sedemên wan; ji xeynî van çand, folklor û dinyaya wan a hundirîn.”⁵⁹ Di hevpeyvînan de pirsên bi mijarê ve têkîldar, ên ku ji berê de divê hatibin amadekirin, tên pirsîn. Bersivên van pirsan *kunyenamêyên* çîrok û çîrokbêjan didin çêkirin. Pirsên kunyenameyan bi rêzê ev bûn: Navê te çi ye? Emrê te çi qas e? Tu ji kîderê yî? Tu çi karî dikî? Te mekteb xwendiyê an na? Navê çîroka te çi ye?⁶⁰ Te ev çîrok ji kî bihîstibû?⁶¹ Helbet ji xeynî vê rêbazê, pêwîstî bi rêbazêke din a ku erka temamkeriyê ya xebata berhevkirinê bi cih tîne heye. Ew jî rêbaza çavnêriyê ye.

Weke ku di gelek zanistan de rêbaza çavnêriyê tê bikaranîn û sûd jê tê girtin; di xebata berhevkirina keresteyên folklorê de jî heman rêbaz “ango rêbaza çavnêriya bi beşdariyê”⁶² tê bikaranîn. Goldstein ji bo rêbazên çavnêriyê vê pênaseyê dike: “Ev rêbaz ew e ku lêkolînerê qadê bi awayê ku ji derve de ber bi aliyê hundir ve binêre û rewşê jî li gorî dîtina xwe tarîf bike. Rasterast bi riya çavnêriyê malzeme tên berhevkirin. Bêjeya çavnêriyê ne tenê bi nêrîna çavan ve sînorkirî ye; ew carinan sehekên weke bihîstin, bêhnkirin û tahmkirinê jî dihewîne nav xwe.”⁶³

⁵⁹ Kenneth S. Goldstein, h.b., r. 72.

⁶⁰ Ji ber pêwîstiyê ji aliyê min ve hat pirsîn. Kunyename dê di beşa tekstên çîrokan de bên nivîsandin.

⁶¹ Nail Tan, h.b., r. 74.

⁶² K.Yıldırım, R.Pertev, M.Aslan, h.b., r. 146.

⁶³ Kenneth S. Goldstein, h.b., r. 54.

Herweha biyanî jî bi vê rêbazê gencîneya folklorê Kurdan dane nîşandan. Eskerê Boyîk, ji berhema Ordîxan û Celîlê Celîl vê agahiyê neqil dike: “Di warê berevkirin, lêkolînkirin û weşandina têkstên zargotina kurdî da karne pir mezin zanyarên gewre yê sed sala 19an P. Lêrx, A.Jaba, A.Sosîn, E.Pirûm, S.Êxiyazarov, N.Marr, Î.Orbêlî, Oskar Mann, A.fon Lecoque û gelekên din kirine.”⁶⁴

Heke em werin roja îro, ji bilî aliyê teknîkî û amûran ve, dîsa em liqayî taybetmendiyên neguherbar a bikêhatina vê rêbazê tên. Yek ji wan berhevkarên behremend Çiya Mazî jî bi heman rêbazê tibabeke berhemên folklorê Kurdan afirandine. Ew di pêşeka pirtûkeke xwe de weha dide zanîn: “Ez dikarim bibêjim ev berhevdeyên zargotinî ku min di navbera salên 1996-2004an de berhev kirine tenê yê derdora Qoser û Berriya Mêrdîn, Dêrikê û Çiyayê Mazî, Şemrex û Metina, Stewrê û Surgucuyan e.”⁶⁵

Wekî ku tê xuyakirin, ev rêbaz di xebatên berhevkirina keresteyên folklorê de, têra xwe derfetan dide lêkolînerên li qadan. Ji bo ku havileke baş jê were girtin biryara bikaranîna wê divê bê dayîn da ku dor were ser pêkanîna merheleya din.

c. Bi Çîrokbêjan re Têkilîdanîn û Cihên Berhevkirinê

Bi kêmanî 10-15 rojan berî hevdeyîna bi riyên wek rû bi rû, telefon û referansan me têkilî ligel çîrokbêjan datanî û me biryara civatgerandinê digirt. Bêguman ji bo peydekirina çîrokbêjan hin pîvan hebûn ku divê min guh bidêra wan. N.Tan girîngî daye van taybetmendiyan: “Emrên wan di ser şêstî re, xwedî hafîze, nexwende û niştecihên cih û warên xwe.”⁶⁶ Ligel ku taybetmendiyan hin çîrokbêjên vê xebatê bi van pîvanan re weke hev bin jî yê ku li derveyî van pîvanan dimînin jî hene. Di nav wan de yê ku emrên wan di bin şêstî re û xwende jî cih digirin.

⁶⁴ H.Cindî-E.Evdal, *Folklorê Kurmanca*, Avesta, Stenbol, 2008, r. 28.

⁶⁵ Çiya Mazî, *Baxek Ji Folklorê Kurdî-Ji Herêma Mêrdîn-*, Berbang, Stenbol, 2014, r. 9.

⁶⁶ Nail Tan, *Folklor (Halkbilimi) Genel Bilgiler*, Halk Kültürü Yay, 1985, İstanbul, r. 74.

Çîrokên vê xebatê li cihên *koma duyem* û *koma sêyem*⁶⁷ bi awayekî devkî hatine vegotin. Hem ji ber ku min mebesta xwe ji berê de ji çîrokbêjan re anîbû ziman û hem jî bikaranîna kamerayê rê li ber berhevkirina “civata xwezayî”⁶⁸ girt. Ya rast ev terciha min bû. Lewra, di *civatên xwezayî* de ji ber hin sedemên curbicur weke berê zêde çîrok nayên vegotin. Herweha divê ku berhevkar demeke dûrûdirêj li wî gundî an jî li wê herêmê bijî. Ji ber van sedemên neyînî, min biryara xwe ya hîlbijartina *civata çêkirî*⁶⁹ radigihand çîrokbêjan. Çîrokbêj, çîrokên xwe li navend, navçe û gundên Mêrdînê di atmosfereke germ a şevbuhêrkên civatên kurdî de vegotin.

d. Hevpeyvîn û Çavnêriyên Min Ên Giştî

Çavnêriyên min di çarçoveya xalên ku Goldstein diyar kirine de, bi awayê metna çîrokeke nûjen, hatine nivîsandin. Çavnêriyên min li ser van xalan çêbûn: Rewşa fîzîkî, rewşa civakî, têkiliyên di navbera guhdaran de, awayê vegotinê, dema vegotinê, hest û helwestên derbirî, çavnêriyên curbicur û rewşa çavnê.⁷⁰ Guhdarên van civatan bi piranî ji mêrên navsere pêk dihatin; lê carinan jin, ciwan û zarok jî beşdar dibûn. Bêguman di şevbuhêrkên vegotina çîrok, henek û serpêhatiyan de helwest, tevger û danûstendinên cihêreng rû didin. Ji ber ku şopandin, tomarkirin û nivîsandina bi kûrahî ya hemû rûdanên li van civatan ne pêkan be jî, ez ê hewl bidim ku di metnên çîrokan de cih bidim wan. Lêbelê niha bi kurtî be jî dixwazim hin ji wan tevgerên çîrokbêjan ên ku di dema tomarkirinê de xuya dibûn, parve bikim: Mînak, ji ber heyecana çîrokbêjan carinan hin bêje çewt dihatin bikaranîn. Di demên weha de çîrokbêj çavên xwe kêliyêkê diqirpandin û madên xwe tîrş dikirin.

⁶⁷ *Koma duyem*: Ew cih in ku rê û elektrîk hene û wasitayên teknolojiyê tîrş bikaranîn. Lêbelê zede belav nebûne. Ev der jî ji aliyê lêkolîn û berhevkirinê ve bi kêr tîrş. *Koma sêyem*: Ji gund, qeza û bajarên pêşketî pêk tîrş. Wasitayên teknolojiyê bi awayekî berfireh tîrş bikaranîn. Lê belê ev der jî li gorî mijarên xebatê dikare bibe qada lêkolîn û berhevkirina berhemên folklorî. Bnr. Li K.Yıldırım û yd. h.b. r. 145.

⁶⁸ Kenneth S. Goldstein, h.b., r. 56.

⁶⁹ H.b., r. 57.

⁷⁰ H.b. ., r. 64-65.

Dema ku çîrokbêj hin beşên çîrokê ji bîr dikirin jî tevger û helwestên wan bi pîranî weha bûn: Li dora xwe temaşe dikirin, bi destên xwe riha xwe mist didan, serên xwe dixurandin, qirikên xwe digidgidandin, destên xwe radikirin wek ku tişteki nîşanî civatê bidin, hilmek ji cixareyê dikişandin, qurteke av an jî çayê vedixwarin. Ev rewşa wan herî zêde 6-7 saniyeyan dom dikir. Di van kêliyan de jî hin ji van bêjeyan digotin ên ku di nav xwe de hestên wek gilî û gazin, hêrsbûn û sediqandinê dihewandin: *Nelet li çavên şeytên bê! Yabo, de em ixtiyar bûne ha! Erê. Te go erê? Belê! Ew çi bû lo? Hih, hat bîra min!* Ji ber van sedeman neçar dimam ku alîkariya bibîrxistinê bikim. Carinan jî min rica dikir ku bêjeyên ji ber bikaranîna çewt nedihatî fêmkirin, dubare bikin.

Xaleke din a ku carinan dibû sedema mudaxaleyên min ên bipirsan ev bû: Di nav çîrokê de bikaranîna nav û têgehên ku bi min nenas bûn. Ew nav û têgehên hanê bêtir derbarê xwezayê, hin amûr, pergal û karên li gundan bûn. N.Tan vê pîvana zarûrî weha dispêre berhevkar: Dema ku keresteyên folklorê werin berhevkirin divê derbarê bêje û biwêjên ku wateyên wan nayên zanîn bi pirsan werin zelalkirin.⁷¹ Çîrokbêj; wate û tarîfên wan navan bi sebir, kêfxweşî û hostetiyeke bêpayan ji min re zelal dikirin.

e. Çîrokbêjên Ku Hevdîtin Bi Wan Re Hatiye Kirin

Berhevkar, ji bo ku plana xwe bi awayekî sûdmend pêk bîne divê kesên ku çavkanî ne ango vebêjer in baş hilbijêre. Lewra gelek kes hene ku xwe wek çavkanî/vebêjer didin nasîn; lêbelê havila ku ji wan tê payîn mixabin nikarin bidin. Loma jî, ji bo ku dem û plan têk neçin hilbijartina kesên çavkanî pir girîng e û lêgerîneke bikitekit dixwaze. Piştî lêgerîneke bi vî rengî pirsên wek “kengî” û “bi kîjan çîrokbêjan” re dê hevdîtin bîn kirin, zelal bûn û qeneeteke xurt a li ser pênc çîrokbêjan peyda bû. Çîrokên ku mijara vê xebatê ne ji van kesan hatine guhdarkirin û tomarkirin:

⁷¹ Nail Tan, h.b., r. 74.

1. Li Navenda Mêrdînê Bi Hecî Şukrî yê Barmanî Re

Hecî Şukri yê bi temenê xwe 80 salî ji gundê Barman e,⁷² lê ji sala 1961an ve li Mêrdînê dijî. Di Adara 2014an de min nêzî hemû çîrokên ku wî dizanîbûn, tomar kirin. Di ber çîrokan re carinan serpêhatiyên xwe yê biqerf jî digotin. Ligel ku mijara me ne serpêhatî jî bûn, ji bo ku monotoniya vegotinê hinekî kêm bibe min ev rêbaz jî hildibijart. Ya rast ev weke zarûretekê ye. Çîrokbêj hemû çîrokên ku dizanin li dû hevdu û bê navber nikarin bibêjin. Lewra, çîrok her car nayên bîra wan.

Herweha divê ku berhevkar carinan ji bo pêdiviyên birêkûpêk ên çîrokbêjan, navberan bide. Min ji bo pêdiviyên H.Şukriyê Barmanî navberên bi vî rengî didan: Xwarin û vexwarin, nimêj, temaşekirina telewîzyonê, xwendina pelê teqwîmê û axaftinên keftûlefa rojane.

2. Li Qoserê Bi Hisênê Bilalî Re

Hisênê Bilalî 77 salî, bi eslê xwe ji gundê Bilalya⁷³ û nexwende ye. Ew ji sala 1970yê ve li Qoserê dijî. Awayê vegotina wî herikbar bû, li gel kalbûna xwe jî wî gotin şaş nedikirin. Ji tevgerên wî xuya dikir ku ew ji vegotina çîrokan kêfxweş dibe. Ji ber ku ew dengbêj bû, carinan di ber gotina xwe re stran jî digotin.

3. Ji Barman Fethila û Apê Hemîd

Fethila 56 salî û Apê Hemîd jî 65 salî ye. Ew pez xwedî dikin û cotkariyê dikin. Herweha herdû jî bi henekçîtiya xwe tên nasîn. Apê Hemîd nexwende û Fethila jî tenê dibistana sereta xwendibû. Fethila di Lîseyê gund de jî xedeme bû.

Ew xwedî taybetmendiyên weke zarxweş, rûken, dilsoz û herweha nas û merivên hev bûn. Piştî ku me bixêrhatina hev kir û li halê hev pirsî; îcar min bi zimanekî xwerû armanc û girîngiya vê xebatê anî ziman. Lewra Goldstein, axaftina berhevkar a destpêkê weha têbinî dike: “Xwe danasîna berhevkar a wek

⁷² Barman (Yeşilalan) ji sala 1999an heta 2011an wek beldeyê bi ser navçeya Stewrê (Savur) ya girêdayî Mêrdînê bû. Ji 2011an û vir ve jî bûye taxeke Stewrê.

⁷³ Bilalya (Bi Tirkî, Alımlı), gundekî girêdayî Mêrdînê ye. 5 km dûrî Mêrdînê ye.

folklornasekî, ji bo piraniya guhdaran tiştêkî bê wate ye... Ya rast ji dêvla bikaranîna vê bêjeyê, divê berhevkar xebata xwe bi awayê ku guhdar bikaribin bi hêsanî jê fam bikin, eşkere bike.”⁷⁴ Piştî axaftina min di şevbihêrkê de Apê Hemîd çîrokek û hin serpêhatiyên xwe yên biqerf vegotin. Piştî wî Fethila dest bi vegotina çîrokan kir.

4. Ji Navenda Mêrdînê Habîb Sîncar

Habîb SÎNCAR, di sala 1975an de li gundê Cilînê, ku bi ser Bismilê ve ye, hatiye dinê. Bi riya medyaya sosyal têkilî bi wî re hat danîn. Di 19ê tebaxa 2014an de li navenda Mêrdînê min mazûvaniya wî kir.

Ew bixwe nabîna ye û li ser folklorê Kurdî hin xebatên wî jî hene. Niha li Sewregê mamosteyê zarokên nabîna ye û herweha li Zanîngeha Mardîn Artukluyê di Beşa Ziman û Çanda Kurdî de mastira bêtez qedandiye. Di dema xwendina mastirê de wî tîpên alfabeya Kurdî adapteyî alfabeya Braîlê kir. Bavê du zarokan e. Mamoste Habîb du çîrok vegotin.

1.5. PIRSGIRÊK Î ASTENGIYÊN LÊKOLÎNÊ

Mirov dikare pirsgirêk î astengiyên lêkolînê dabeşî du qisman bike: Yên di teoriyê de î yên di pratîkê de. Di qisma teoriyê de pirsgirêka vê xebatê ew e ku heta niha bi Kurmancî di çarçoveya Teoriya Folklorê Fonksiyonalîst de li ser çîrokan xebatên akademîk nehatine kirin. Ev rewş, derfeta sûdwergirtinê ya ji xebatên bi vî rengî ji holê radike.

Xaleke din a pirsgirêka teoriyê jî, hebûna rexneyên di derbarê teoriya ku me ji bo vê xebatê hilibijartiyê.⁷⁵ Ev rexne, carinan di dema lêkolînê de bûn wek astengeke psîkolojîk a li pêşiya rêveçûna xebatê.

⁷⁴ Kenneth S. Goldstein, h.b., r. 35.

⁷⁵ Ji bo agahiyên berfireh ên derbarê rexneyan bnr. li S.Özbudun, B.Şafak, N.S.Altuntek, *Antropoloji, Kuramlar/Kuramcılar*, dipnot, Ankara, 2006, r. 126; Özkul Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve*

Di qisma pirsgirêk û astengiyên pratîkê de mirov dikare peydekirina çîrokbêjan û hevdiîna bi wan re di rêza yekem de bi cih bike. Ji ber ku hin çîrokbêj li deverên dûr niştecih bûn, derfet nehatin diîtin ji bo çûnê. Carinan jî dema ku bi riya salixdanê em diçûn cem hin salmezinan, wan nikarîbûn çîrok vegotina. Bêtir an behsa serpehatiyên xwe yê biqerf dikirin an jî stran digotin. Helbet, serpehatî û stran jî keresteyên hêja ne; lê ji bo vê xebatê tu sûdmendiya wan tunebû. Ev jî dibû sedema derbasbûna demê û xerckirina enerjiya li ser xebata bi çîrokan sînorkirî.

Ji bo ku em xwe bigihînin çîrokbêjan me medyaya sosyal jî bi kar anî. Bi vê riyê me bi çîrokbêj Habîb Sîncar re têkilî danî û me du çîrokên wî tomar kirin. Hin bikarhênerên Facebookê, bi mebesteke pak, çîrokên ku wan bixwe honane an jî serpehatiyên biqerf ji me re şandin. Lêbelê ji ber ku xebata me li ser çîrokên gelêrî bû, nivîsandinên wan ji aliyê me ve nehatin hilbijartin. Ev prosesa hanê jî, ligel hin encamên erênî, bi piranî di eleyhê demê de bi dawî bû.

Tomarkirina çîrokan a bi kamerayê jî çîrokbêj dixistin nav heyecan û tirsê. Loma jî em mecbûr diman ku em xwe bi wan baş bidin naskirin û mebesta xwe jî baş bidin famkirin. Di dema vegotina çîrokê de jî em liqayî astengiyan hatin. Mînak; hin bêje û têgehên ku me wateyên wan nizanîbûn, hebûn. Di demên weha de heta ku derfet hebû me ew ji wan dipirsîn. Lêbelê, dema me ew pirs dikirin, însîcama çîrokbêj xera dibû û gotinên xwe ji bîr dikirin.

Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş, Akçağ, Ankara, 2012, r.258-9; Sosyologlar, "Kültürel Yaklaşımlar: Temel Antropoloji Kuramları", <http://sosyolojisi.com/kulture-yaklasimlar-temel-antropoloji-kuramlari/3057.html>, (29/01/2016)

BEŞA 2: CURE, TEKST Û PEYAMÊN ÇÎROKAN

Di vê beşê de dê ewil li ser pênase û cureyên çîrokan, paşê jî dê li ser tekst, peyam û analîzên çîrokan bê sekinandin. Mebest ji çîrokê, çîrokên gelêrî ne. Hin folklornas, folklorî Kurdî dabeşî çar beşan kirine. Çîrokên gelêrî jî di binbeşa Edebiyata Gelêrî de di rêza çaran de bi cih kirine.⁷⁶

Wekî ku tê zanîn ji ber ku çîrok binbeşeke girîng a zanista folklorê ye, hin pênase û şîroveyên wê jî bi awayekî xwezayî bi folklorê ve têkildar in. Ma ne balkêş e dema ku têgehên weke folklor an jî bi Kurdiya wê zargotinên tîn bilêvkirin yek ji wan berhemên folklorê ku yekser tîn bîra mirov, çîrok in? Li gorî Gennep çîrok, “ew tişt e ku ji şexisên wê yê awarte wek mînak; pîrebok, dêw û cinan wêdetir “xeyrî şexisbûn” a wan e ango ew şexsiyetên berbiçav temsîl nakin û cihê bûyerê jî ne diyar e. Hemû başî dibin para xweşikî, qencî û hêzê; lê hemû qusûr û xerabî dibin para genîtî, xerabî û lawaziyê.”⁷⁷

Boratav çîrokê weha pênase dike: “Vegotineke kurt a ku bi pexşanî hatiye gotin, ji bawerî û gerdîşên olî dûr, bi temamî xeyalî û li kesekî ferz nake ku jê bê bawerkirin.”⁷⁸

R.Pertev jî dibêje ku “çîrok ji vegotinên gelêrî nin ku tê de cih didin serborî û lehengên derasayî û mijara wan xeyalî û bi devkî belavbûyî ne.”⁷⁹ Ev nirxandin,

⁷⁶ K.Yıldırım, R.Pertev, M.Aslan, h.b., r. 143.

⁷⁷ Arnold Van Gennep, h.b., r. 31.

⁷⁸ Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Gerçek Yay., İstanbul, 1969, r. 80

⁷⁹ Ramazan Pertev, h.b., r. 87.

yekser çîroka Elik û Fatik tîne bîra min. Lewra, jinbav û pîrebok hemû genîtî û xerabiyên dikin; herweha başî, xweşikî û asoxî jî hêz di nav taybetmendiyên Elik û Fatik de ne. Helbet çîrok ji aliyên mijar, leheng, peyam û şewazê ve ji hev vediqetin. Niha bi kurtî em cureyên çîrokan bidin naskirin:

2.1. CÛREYÊN ÇÎROKAN

Çîrok jî wek hin berhemên folklorê di nava xwe de tîne senifandin. Ev senifandin yekem car di Kataloga Çîrokê ya Navnetewî de ji aliyê Antti Aarne û Stith Thompson ve hatiye kirin. Di berhema Boratav de çîrok, di bin çar sernavan de hatine senifandin:

“1- Çîrokên Ajalan

2- Çîrokên Bingehîn: Çîrokên Neasayî, Çîrokên Rasteqîn

3- Çîrokên Pêkenî, Pêkenokên Binukte, Çîrokên Derewan

4- Çîrokên Zîncîreyî”⁸⁰

Di nav çîrokên Kurdî de jî ev cure hemû hene. Di nav çîrokên ku ji bo vê xebatê hatin berhevkirin de mînakên van cureyan dê bînin dayîn. Cureyên çîrokan bi awayekî giştî bi vî rengî hatine pênasekirin:

2.1.1. Çîrokên Ajalan

Bi piranî kurteçîrok in ku wekî fabl tîne binavkirin. Hem di şiklê pexşan de û hem jî di şiklê helbestkî de bi awayeke hêsan û xwerû hatine nivîsandin. Di dawiya wan de timî pend û şîretên sincî hene.⁸¹ Herweha Boratav jî dibêje ku di van çîrokan

⁸⁰ Pertev Naili Boratav, h.b., r. 84.

⁸¹ Ramazan Pertev, h.b., 2008, r. 94.

de ajal bi piranî ji wesfên xwe derdikevin û yên mirovan digrin. Ev taybetmendiya van çîrokan di mînakên herî kevn (Pançatantra û Aisopos) ên dîroka çanda cihanê de kifş in.⁸² Ji bilî van li cihanê fablên La Fontaine, Ezop, Perrault û Brayên Grimm jî navdar in.

Di Kurdî de jî ev cure çîrok zêde ne. Ên ku herî zêde hatine berhevkirin û di civatan de jî tên gotin ev in. “Pîrê û Rovî”, “Şengê û Pengê”, “Dîkil Axa”, “Pîrê û Dîk” hin ji wan in ku herî zêde tên nasîn.

2.1.2. Çîrokên Bingehîn

Dema ku Çîrokên Bingehîn tê gotin, Çîrokên Neasayî û yên Rasteqîn tên bîra mirov. Ev cure ji yên din dirêjtir, hejmara lehengan zêdetir û bûyerên wan tevlîhev in. Ev cure dibin du qisim.

Qisma Yekem: Çîrokên Neasayî

Hem mexlûqên derasayî yên wekî dêw, hût, pîrebok, ejderha hwd. in; hem jî padîşah, wezîr, gundî, axa, gavan û hwd. kesayetî hene. Gelek caran di berawîrdiya bûyer an lehengan de neliheviyek heye. Bo nimûne; pîrebok dikare her sêhrê bike, bifire, xwe wenda bike, dilqê xwe biguherîne, lê nikare xwe ji şûjina pêvekirî xelas bike.⁸³ Çîroka “Elik û Fatik” mînakeke guncaw e ji bo vê cureyê.

Qisma Duyem: Çîrokên Rasteqîn

Hem ji aliyê mijar û lehengan ve û hem ji aliyê serpêhatî û şikil ve di çarçoveya aqil û îmkanê de ne. Di nav sînoren qîmetên sincî û normên civakê de pend û şîretan dikin. Lehengê dewlemend piştî gelek qencî, xebat û serêşîyan dikare bi lehenga feqîr re bizewice. Herweha berovajî wê jî diqewimin di van çîrokan de.⁸⁴ Çîroka “Walî û Cotkarî” û “Kî Bipeyive Wê Kerê Girê Bide” mînak in ji vê cureyê re.

⁸² Pertev Naili Boratav, h.b., r. 84.

⁸³ Ramazan Pertev, h.b., r. 94-95.

⁸⁴ Pertev Naili Boratav, h.b., r. 88; Ramazan Pertev, h.b., r. 95.

2.1.3. Çîrokên Pêkenî, Pêkenokên Binukte, Çîrokên Derewan

Çîrokên Pêkenî û Pêkenokên Binukte bêtir bi armanca kenandina guhdaran in. Leheng dikevin rewşên ecêb û mustehceniyê. Loma jî li civatên bê jin û zarok ango di civata mêran de tînin gotin. Civat jî dikene û dilxweş dibe. Tiştên ne mumkin be ku bi rêya tabîû bête gotin bi saya rêbaza pêkenokî tînin zimên.⁸⁵

Boratav ji bo Çîrokên Derewan radigihîne ku mînakên tîpan ên vê cureyê di Kataloga Navnetewî de di navbera 1875 û 1999an de hatine tomarkirin. Bi piranî şemaya “Pêşbirka Derewan” nîşan didin. Kî derewa herî mezin bike, ew diyariyê gezenç dike û asoxî bi ser dikeve.⁸⁶ Çîrokên “Kose, Berkose û Safkose”, “Sê Bira û Topê Cawê Wan” û “Dikançî û Derewa Li Ser Fîlê” mînakên herî guncaw in ji bo vê cureyê.

2.1.4. Çîrokên Zîncîreyî

Di Kataloga Navnetewî de di navbera 2000 û 2399an de ne. Leheng bi piranî ajal in; lê ji ber ku ew şîretan nakin, naşibin çîrokên ajalan. Armanca ji wan ew e ku zarok bi wan kêfxweş û şaşwaz bibin. Ji rêzeçîrokan pêk tînin ku di navbera wan de rist û pevgerêdanek mantiqî heye. Bûyer û rûdanên çîrokê li dû hevdu tînin gotin. Her yek ji wan, hem dewama ya din û hem jî bi serê xwe çîrokek e.⁸⁷ Çîrokên “Dîkil Axa”, “Hecî Gur” û “Pîrê û Rovî” mînakên vê cureyê ne.

⁸⁵ H. b., r. 92.

⁸⁶ H.b., r. 101.

⁸⁷ H. b., r. 95.

2.2. TEKST, PEYAM Û ANALÎZA ÇÎROKAN

Çîrokên di vê beşê de ji bo vê xebatê ji çîrokbêjan hatin berhevkerin. Tekst, li xwarê li gor cureyên wan û ligel navên çîrokbêjan hatin nivîsandin.

Çîrok, di demên cuda de, ji pênc çîrokbêjan hatin berhevkerin. Di nav cureya Çîrokên Ajalan de heşt, di Çîrokên Neasayî de sisê, di Çîrokên Rasteqîn de sisê, di Çîrokên Pêkenî, Binukte û Derewan de heşt û di Çîrokên Zîncîreyî de jî sê çîrok; bi giştî bîst û pênc çîrok hene. Di hin berhevokên çîrokan de varyantên heşt çîrokên vê xebatê hatin tespîtkirin. Çavkaniyên varyantan di jêrenotan de hatin nîşandan.

Di tekstan de mudaxeleiyê zimanê çîrokê nehatiye kirin. Wateyên hin bêjeyên bi Tirkî di kevanê de hatine wergerandin. Dîsa ji bo ku bîst famkerin hin qertaf û daçekên kêr û hin bêjeyên aîdî devoka çîrokbêj di kevanê de hatine sererastkirin. Carinan jî hin tevger û bertekên balkêş ên çîrokbêj û guhdaran di kevanê de hatin nivîsîn. Herweha wateyên biwêjan, navên têkberan û têgehên bi vî rengî nehatine şîrovekirin. Lewra ev xebat dikeve nav mijareke dîtir.

Wekî li jorê jî me aniye ziman, çîrokên ku ji bo vê xebatê hatin berhevkerin wekî gelek çîrokan angaşt dikin ku ew fonksiyonên girîng di xwe de dihevin. Di berhema Muhsine H. Yavuz a bi navê *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri* de nirxandineke berfireh li ser fonksiyona perwerdehî ya çîrokan hatiye kirin. Em ê li di beşa nirxandina analîzên peyaman de bêtir cih bidin referansên vê berhemê.

Tespîta A.I.Hallowel, a ku Bascom wê neqlî me dike, wê mebesta me bêtir qewîn bike: Mijareke din a girîng ew e; têkiliya nîrxên ku di vegotinan de tîn vegotin a bi tetbîq û mûeyîdeyên di jiyana rasteqîn de ye. Ev qad bi lezûbez ji holê radibe, bawer dikim keresteyên gelekî binîrx ên ku fêhma me ya çandî berfireh dikin û vegotinên devkî, yê ji her alî bi civakê ve têkîldar, li benda kifşkirina wan lêkolîneran in yê ku bi awayê rêkûpêk dixebitin.⁸⁸

⁸⁸ Bascom, h.b., r. 74

Yavuz bixwe jî armanca nivîsandina berhema xwe ya navborî bi du bêjeyên Hallowel formule dike: Difikirim ku bi nîşpet dê deriyê çavkaniyên dewlemend ên çîrokên ku “li benda kifşkirinê”⁸⁹ ne veke. Me jî di vê xebatê de hewl da ku bi derxistina peyamên çîrokan em ji wî deriyî têkevin hundir û çend gavan ber bi dewlemendiya çavkaniyan bavêjin. Di nav çîrokên vê xebatê de peyamên civakî, psîkolojîk, aborî û etîk hatin tespîtkirin. Ev peyamên hanê alîkariyeke xurt ji bo pêkhatina prosesa perwerdekirinê dikin. Lêbelê di nav wan de zêdebûna peyamên civakî bêguman ne tesaduf e. Ji ber ku perwerdeyeke baş encax di nav civakeke têgihîştî û serwext dikare pêkan be. Loma jî di vê xebatê de peyamên civakî cihekî taybet digirin.

2.2.1. Tekstên Çîrokên Ajalan

Çîrokên di vê cureyê de bi dorê weha hatin rêzêkirin. “Gur û Rêvî”, “Kaxeta Rêvî û Çûna Sûkê”, “Zirra Kerê”, “Rêvî û Quling”, “Siwar, Dîk û Rêvî” û “Gur, Mîh, Rêvî û Cewrik”, “Pisîk û Çêlikên Mişkan” û “Şêwra Mişkan.”

Gur û Rêvî⁹⁰

(H.Şukriyê Barmanî)

Gur û rêvî birakê hev bûn. Birakê hev bûn, rokê gur niza ji ku tê, lê nêrî ku kewik li erdê ye. Kewa li erdê xist devê xwe. Rêvî pêrî vebû, go “birakê gur te ev kew ji ku aniye?” Kew jî heram bûye li çolê ye, heram bûye di devê wî de ye. Gur go “weh ez karim rojê niza çiçes kew bînim.” Rêvî go “yaw ka tu wî kewî bid min tu karî ji xwer bigirî.” Gur go “erê welle.” Rêvî go “çawa?” Gur go “hema aneha ez ê herim bînim.” Rêvî go “ez ê dakevim bin tehtê ti jî hilkiş nav çavê tehtê.” Û go “ez ê dakevim bin tehtê, wê kew ji tirs min bifirin” û go “xwe çenke ser wan. En eşaxî (bi Tirkî tê wateya bi kêmanî) deh heb di bin gêwdê te dimênin.”

⁸⁹ Muhsine H.Yavuz, h.b., r. 23

⁹⁰ Du varyantên din yên vê çîrokê hene: Navê varyanta yekem, “Gur û Rovî” ye. Bnr. li Mahmut Barik, *Ax Piştî Min*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2003, r. 65; Navê ya duyem, “Gur û Roviya Fenok” e. Bnr. li Hilmi Akyol, *Mamê Rovî*, Do, Stenbol, 2008, r. 56.

Û yabo ji jêr de daket bin tehtê ku kew firandin û gur ji jor de xwe avêtê. En eşaxî pêncî metre bilindbûn e. Hîn li hewa bû, devê gur ji hev çû. Devê gur ket erdê, gur mir. Îjar diranê wî fiq man. Rêvî daket balê go “birako xuya ye te gelik girtine ha waye ti dikenî.” Halbikî miriye, cehemiye, çûye gur. Rabû rêvî hat ser gur go “Birako!” Go “çi?” Go “welle ez ê te bixwim.” “Çawa tê min bixwî?” Go “welle ez ê te bixwim.”

Dibê ket ser û wî xwar. Wî xwar û dibê rêvî têr bûye û hilkişiya çû îjar ji xwer bigere. Çû bigere, îjar lê nêrî gurkî din pêrî vebû. Go “birakê rêvî, bi Qur’an ez ê îro eyar li te bivim nêvî.” Go “te birakê mi kuştiye, te fen lê kiriye ez ê jî fena(n) li te bikim.” Rêvî jî wexta ku xwe ji kaş(e)kî avêtiye jêr û çima libad(ey)ê yekî heşû ye û dikeve ser libade û libade li xwe dihebilêne û direve. Gur dibê “Kuro te ev kurka ji ku aniye?” Rêvî dibê “weh, ma ev kurk û ne tu kurkê din. Ez kurkçî, bavê mi kurkçî, kalkê mi kurkçî. Em giş kurkçî ne.” Ê gur go “law ka wînê xwe bid min?” Rêvî go “Na heyra, evane li te nabe.” Go “Belkî ez biçûk im.” Go “Ez ê yekî li gora te çêkim.”

Û rêvî çû ket qulê yanî ku wê kurk çêke. Gur xwe da bende derneket. Derneket, gur go “bi Xwedê evîne fen li mi kir.” Rêvî jî wexta ku ketiye qulê, hejik ji xistiye dawiya xwe û devê qulê girtiye. Gur newêre ne xwe têx devê qulê û ne here wî bêne. Yana wê here wî di hundirê qulê de bikuje. Dibê rabû xwe da bende. Xwe da bende, lê nêrî derneket. Derneket, dibê rabû kodikik vala bi ser serê qulê de eliqand û ba lê dixê. Her car dibê “teq û teq û teq û teq û teq û teq.” Dibê rêvî go “bi Xwedê û Pêxember evene serma girtiye” go, “diranê gur li hev dikevin” û go “dî devê qulê de ye, çawa e(z) derkevim, e(z) d(i) devê wî de me.” Rok, dido, sisê, çar; lê nêrî nema çogê wî dişixulin di hundirê qulê de ji birçîna. Welle neqlikê xwe ji devê qulê xîj kir. Xwe çeng kir, li nîvê berroj xist. Li nîvê berroj xist, li xwe fitilî ku ne gur ne filan û ne bêvan.

PEYAM Û ANALÎZ

1- Divê mirov bi tiştê ku bi dest ketibe qaîl be û mirov guh nede sorkirina mirovên din. Heke na, mirov dikare tiştê di dest xwe de jî wenda dike. Di çîrokê de gur ji aliyê rovî ve tê sorkirin û asoxî gur dikeve dehfika roviyê fennek û dimire.

2- Ku mebesta yekî/ê xerabî û fenkirin be, her çiqas di destpêkê de tiştinan bi dest bixe jî dê dawiya dawî şerpeze, tirsonek û destvala bimîne. Rovî ji wî tirê ku fen li gurê duyemîn, ê ku dixwaze heyfa hevalê xwe hilîne, kiriye; lêbelê derewa rovî bû sedema ku ji tirsê gur bi rojan tî û birçî di qula xwe de bimîne û şerpeze bibe.

3- Timayî ne baş e; qaîlbûna bi nesîbê xwe mirov ji belayên muhtemel xelas dike: Di çîroka Gur û Rêvî de, rêvî fennê li gurê yekem, ê ku li erdê kewa mirî dîtibû, dike. Tavi lê gur hem ji kewê dibe hem ji canê xwe. Bi gotineke din rêvî gur tima dike. Dawiya timayiyê jî xisar e. Carinan mirov jî tima dibin û heta demekê ji halê xwe razî ne; lê dawiya dawî xisar tê serê mirov. Timaya çarixan kir, gore qetand; gotinek xweş a pêşiyar e ku li ser vê rewşê ye.

4- Xerabî, bextewariya bêdawî nayne; rojekê teqez dê ew xerabî bê serê xwediyê xwe jî: Dîsa di çîroka Gur û Rêvî de em dibînin ku rêvî dixwaze fennê li gurê duyem, ê ku hatiye heyfa hevalê xwe, bike. Rêvî ewil ji bo ku canê xwe xelas bike, wî dixapîne û ji tirsê dikeve qula xwe a ku çend rojan tê de tî û birçî dimîne. Erê canê xwe xelas dike, lêbelê çend rojên gelek dijwar di qulê de derbas dike. Pêşiyar gotine ku çê kiro bi xwe kiro; xera kiro bi xwe kiro.

Kaxeta Rêvî û Çûna Sûkê⁹¹

(H.Şukriyê Barmanî)

Temamê heywana, heywanê yabancî; mesele gur, hirç, rêvî, şêr, e(z) j(i) te r(e) bêjim, weş... Evane sûk ji wan re yasaq e, newêrin. Rabû îjar civana xwe kirin yek, tamamê heywana civana xwe kirin yek. Yekî go “law welle sermiyan di me d(e) tune, em ê ji xwe r(e) sermiyan(e)kî rakin û bera(bila) rok(rojek) çarşiyê bidin me jî. Em ê herin cem walî, bera walî iznê bi d(e) me.” Yekî din go “welleh tu baş dibêjî; ê ka kî amirê kî ye, sermiyanê me kî ye?” Rêvî destê xwe li sînga xwe xist, go “ez.”

Û dan pey rêvî hatin; hatin daîra walî li derî xistin go “teq, teq.” Walî go “gel.”(bi Tirkî, di wateya were de ye) Rêvî derbasî hindir bû, li pişt xwe nêrî ku ti însanê Xwedê tune ne. Walî go “xêr e?” Rêvî go “wellaî ez hatime iznê bixwazim ku heywanê xerîb, yabancî û çarşî ji me r(e) yasaq e. Û lazim e em ji xwe r(e) werin çarşiyê, dilê me û dunyayê jî heye. Em ji xwe r(e) qelebalixiyê bibênin, em ê bên nav wan.” Walî go “kîjan rojê ez bidim we?” Go “duşemê?” Go “na.” Go “sêşemê?” Go “na.” Go “çarşemê?” Go “na.” Go “pêşemê?” Go “na.” Go “înê?” Go “na.” Go “septê? (şemî)” Go “septê ji nîvro pêve.” Go “lehdê?”(yekşem) Go “temam.” Go “septê ji nîvro pêve û lehdê jî ji sibê heye êvarî izna we û çarşiyê heye.”

Ê ew ro jî tamamê dikana girtî ne û heçî zigurdekî bajarî, zarokên wan heye di sûka û di zikaka de ne. Û carkê yekî bajarî lê nêrî ku rêvî li pêşiya wan û kaxeta ku walî jê re nivîsiye, mohr kiriye di desta de û ketin hindirê mehella. Û wî go “hîh” û wî go “hîh” û wî go “hîh.” Ê ku kevir danîn wan, ê ku çifte teqandin, ê ku demançe berra wan dan... Û yekî yek nedî. Go yekî go “lo birakê rêvî, birakê rêvî, birakê rêvî kaxetê...” Rêvî go “kuro kaxet, kî dinîhê qûna kaxetê law? Ne va mi kaxet derxistiye, ê ku wê bixwêne kî ye?”

⁹¹ Varyantek din ya bin navê “Rûvî û Gur” ya vê çîroke. Bnr. li H.Cindî-E.Evdal, *Folklor Kurmanca*, Avesta, Stenbol, 2008, r. 709.

PEYAM Û ANALÎZ

1- Pevrejiyîna temamê heywanên dirinde ya bi awayê musamahayê ango bêyî ku zîrarê bidin hevdû. Mînak, şêr û weş(beraz).

2- Ji bo bicihanîna daxwaziya hevpar lidarxistina civînê û wergirtina biryara hevpar. Çûna cem daîreya walî.

3- Ji bo çareserkirina pirsgirêkekê hewcedîtina sermiyanekî/ê (nûner) û awayê hilbijartina demokratîk a sermiyan. Ji bo çûna sûkê ji nav temamê heywanan rovî wek sermiyan tê hilbijartin.

4- Musamaha: Di çîroka “Kaxeta Rêvî û Çûna Sûkê” de em liqayî wan ajalên ku di xwezayê de ne mimkun e ji bo xêrê bîn ba hev, tîn. Çîrok jî, wek gelek cureyên din, cih dide têgeh û metaforên ku bêtir mirovperwerî û aşitîxwaziye di xwe de dihewînin. Musamaha jî yek ji wan e ku mirovahî herdem ji nebûn an jî kêmbûna wê azarkêş e. Di çîrokê de parvekirina jîngehê ya şêr û weş(beraz) mînakek baş a musamahayê ye.

5- Çêkirina civînê, hilbijartina sermiyan(nûner) û biryara hevpar: Di çîroka “Kaxeta Rêvî û Çûna Sûkê” de em liqayî vê peyamê dibin. Ajalên çîroka navborî ji bo ku ji mafekî medenî sîd wergirin, dicivin û rêvî dikin nûnerên xwe da ku li cem walî berdevkiya wan bike. Belê ev tevger û metodên bi vî rengî, di nav civakên demokratîk de peyde dibin û daxwaziyên endam û komên wê civakê bi vî awayî çareser dibin. Bêguman ev modelek gelekî serkeftî ye ji bo çareseriyên arîşeyan.

Zirra Kerê

(H.Şukriyê Barmanî)

Evene (ev ên hanê) her sê; ker, hesp û qantir di mêrga(n) û çîmena(n) de ne. Mêrg şîn e, gîha ye, once ye, nefel e û ketine nav wê çayirê kêf kêfa wan e û hingî ku xwarin xwarine xurt bûne. Go kerê go “bi Xwedê û Pêxember zirra min tê.”

Go yekî ji nav wan go “law ev der çiya ye, xeramsemt e, ji gura(n), ji hirça(n),ji heywanê(n) nebaş, ji wehşa(n) wê bèn li me xin, me bikujin. Kuro law ma çî li te qewimiye? Va em ji xwe r(e) li nav vê nefela ha ne, nav vî gîhayê han de ne. Ma çima tê bizirrî law?”

Ker go “bi Xwedê zirra mi(n) tê.” Go carkê, duduwa, sisiya go yekî ji wan go “law zirra te tê, bi cehnim kiriye, bizirre.” Wexta ker zirra “hîr û hîr û hîr û hîr” û hah gura(n) guhê(n) xwe a weha nîç kirin û xwe berra wan da(n). Wexta xwe berra wan dan, ê hesp û qantir... Ma ji ku digihên wan? Şîpar re(ji paş ve) gur bi gunê(n) kerê girtin. Bi gunê kerê girtin, ker di cî(h) de bû teht. Ketin ser kerê, gunê wî xwarin go “ev jî heqê te ye ku te go zirra mi tê, zirrbûna te jî ev e.”

PEYAM Û ANALÎZ

1- Halê rehet carinan hin mirovan bitir dike û karên nelirê bi wan dide kirin. Bêguman ev karên nelirê jî dibe belaya serê wan ango herî zêde zîrar digihê kesê ku bitir bûye.

2- Divê mirov carinan guh bide şîretên wan mirovên ku qenciya me dixwazin. Heke na, serhişkî encamên xirab derdixe pêşa mirov.

3- Dema ku mirov di firehiyê de be, mirov divê ji ser xwe ve neçe: Di çîroka Zirra Kerê de, ker û hevalên xwe di nava xweşîyeke bêpayan de ne; lêbelê ker ji ber bitirbûnê rehet nasekine û dizire. Ew zirrîn jî bêguman jê re naserife û ker dibe para guran. Reftarên bi vî rengî di nava mirovan de bê hed û hesab in. Bi rastî jî pirbûna

van mînanan dibe sedema vê pirsê: “Gelo her mirov di firehiyê de bitir dibe?” Bêşik e ku pêşiyên me jî pir liqayî van mînanan bûne; lewra ew gotine ku bitirî ji gayê cot re namîne.

4- Girîngiya guhdarîkirina şîretan: Di çîroka “Zirra Kerê” de em liqayî vê peyamê dibin. Wekî ku tê zanîn di çîrokê de ker û hevalên wî di nav mêrgan de kêfek xweş dikin, lêbelê ker debar nake û ligel hemû hişyarî û şîretên hevalên xwe dizire. Asoxî jî ker dibe para guran. Di nav mirovan de jî carinan hin kes hene ku qet li şîretan guhdarî nakin û tenê bi ya xwe dikin; di encamê de jî mixabin têk diçin. Ji bo yên ku guh nadin şîretan pêşyan gotine ku “Şîret li gur dikirin, gur got: Zû bibêjin ez nema digihîjim dawiya kerî.” An jî biwêja ku dibêje “têr xwariye, gewî bûye” jî bi vê peyamê ve baş li hev dike.

Rêvî û Quling⁹²

(H.Şukriyê Barmanî)

Quling û rêvî birakê hev bûn. Birakê hev bûn, ji hev hez dikirin. Rêvî ba quling kir, go “birako!” Go “çi ye?” Go “ti mêvanê min î şevik din.” Go “baş e, serçava.” Rabû rêvî şorbe çêkir, şorbe û berra ser tehtê da û teht jî kevîrê qesp û wilo şahîk û wek hestem. Ê şorbe berra ser da û ji quling re go “bûyrin, kerem bike.” Go quling nukilê xwe li tehtê dixê, qûna wî rimikê bilind dibe. Ê nukilê wî têşe. Werhasil çend nukil lê xistin, lê nêrî ne tişt dikeve devê wî û ne tehm dide devê wî. Dibê “Xwedê Teala zêde bike, sifre daîm be.”

Dibê “şevik din ti mêvanê min î.” Radibe îja quling ba rêvî dike. Quling radibe noka dikelêne û dixê hindirê kundir. Hindirê kundir û devê kundir jî ha

⁹² Sê varyantên vê çîrokê hene. Ya yekem bi navê, “Rovî û Quling”e. Bnr. li Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, Rûpel Basım Yayım, Stenbol, 2014, r. 95; ya duyem bi navê, “Rovî û Quling”e. Bnr. li Mahmut Barık, *Ax Piştta Min*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2003, r. 14; ya sêyem bi navê, “Rovî û Quling Ma Piya Qol”e. Bnr. li Hilmi Akyol, *Mamê Rovî*, Do, Stenbol, 2008, r. 92.

weha ye.(bi tiliyên xwe qulikeke biçûk çê dike) Û dibê “bûyirin, kerem bike.” Rêvî zimanê xwe bi dora kodikê dixê, ne nok ne ti tiştik. Ne digihê devê wî û ne jî ba wî. Ew jî dibê “ti sax bî, ez teşekur dikim. Mazûbaniya te ket serê min” û ew jî bi vî hawî.

PEYAM Û ANALÎZ

1- Ji hev hezkirin, biraktî û hevdû ezimandin.

2- Ku mirov liqayî mazûvaniyek ne xweş bibe jî, divê mirov sînoren nezaketê derbas neke, spasiya mazûvanê/a xwe bike û ji wî/wê re jî mazûvaniyê bike.

3- Ji hev hezkirin, biraktî û ezimandin: Du ajalên ku di xwezayê de yek ji wan tim ê din dixwe, xwedî van taybetmendiyên in. Di çîroka Quling û Rêvî de her çiqas bi mebestek pak mazûvaniya hev nekiribin jî, ew terka nezaketê jî nakin. Bêjeyên wek “ji hev hezkirin û biraktî” tê de derbas dibin. Mînak, ew hevdû diezimînin û keremî ser xwarinê dikin. Herweha malavayiya hevdû dikin û daîmiya sifra hevdû hevî dikin. Ev jî di roja îro de wek hin tevger û axaftinên nezaketê tî qebûl kirin.

Siwar, Dîk û Rêvî

(H.Şukriyê Barmanî)

Siwarik hebû, siwarî keçik revand. Keçik revand, rabû keçikê lê nêrî ku wê siwar wê bi zorê birevîne. Û ew jî bi tenê ye. Siwarî jî bi sîleh bû, bi tiving bû, bi demançe bû, bi xencer bû. Keçik jê tirsîya, jê tirsîya rabû go “vaye ez revandime, revandime.”

Îjar mêrik bû, de’w lê kir, go “ ez ê bêm ba te.” Ê go “ tê bê ba min, adetik mala bavê mi heye.” Go “ çi adet e? ” Go “Adeta mala bavê min gerek zave xwe tîx binê avê û di binê avê de heye çelî bijimêre. Ji yekê heye çelî bijimêre. Heye

çelî ku bijmêre mehra me li hev tê birrîn, Xwedê Teala helal dike û tu wer, tê bêyî ji xwer nivîna xwe.”

Dibê, îjar rabû siwar xwe tazî kir û hespa xwe da destê keçikê û xwe berra nava avê da. Ew ê heye çelî bijmêre. Jinik rahişt cilên wî û xist nav buxçikê û xwe çeng kir ser piştta hespê û ya Allah û ya Xwedê. Heye siwar çavên xwe vekir, ji nav avê derket heylooo! Ne keçik û ne hesp û ne filan û ne bêvan. Cil jî çûne. Siwar go “ yaw ne’let li dê û bavê wî însanî bê ku xusul li ser tunebe û xwe xusul bike. Ma xusul li ser min tunebû, çima ez ê xwe xusul bikim? ”

Li wê derê rêvî go “na welle”, go “ê te hêç e”, go “ne’let li wî însanî bê ku birçî be û bê elhemdile û şikir.” Dîk li wê derê go “law welle însan ku ne bênamûs be, çawa çavê xwe bigire û azanê bixwêne li ser nigikî? ” Îjar mêrik rabû go “ law hela ê mi hal e, ma ka ê we çi hewal e? ” Rêvî go “ yabo ê mi jî mi dîk girtibû ku ez ê wî bixwim”, go dîk ji mir go: “Law welle bavê te zilamkî misilman bû”, go “tim berî ku xwarin dixwar, digo elhemdila û şikir.” Rêvî wexta ku dibê “elhemdile û şikir” devê wî metrokê ji hev çû. Devê wî metrokê ji hev çû, go dîk ji nav lepê wî firiya pirrr çû ser darê. Go çû ser darê, go rêvî lê nêrî, lê nêrî, lê nêrî û go “ Ê law e çi ji ter bêjim?”

Mêrik zîvirî ser dîk go, “ ma tu jî kor bû, te nehiştta rêvî te bigire.” Dîk go “ kuro ê mi jî Xwedê li mi xistibû” go, “wexta ku mi azan da rêvî ba mi kir”, go “welle azana te pir xweş e” go, “feqet ne wek a rehmetiyê bavê te ye.” Dîk go, “çawa?” Rêvî go, “rehmetiyê bavê te wexta ku azan dida” go “nigikî xwe hildigavt û çavê xwe digirt û azan dida.” Dîk go, “wexta mi nigê xwe hilgavt û çavê xwe girt” go “hema dîna mi dît ez di devê rêvî de me.”

PEYAM Û ANALÎZ

1- Bi darê zorê û bi fenan mirov dikare ji bo kurtedemekê bi ser keve, lê asoxî mirov têk diçe.

2- Divê mirov ji her gotinên xweş û pesindana ji bo şexsê mirov bawer neke. Lewra ew dikarin berê mirov bidin nebaşîyan.

3- Rêzgirtina li hemberî adetan: Di çîroka Siwar, Dîk û Rêvî de dema ku mêrikê siwarî keçikê direvîne, keçik dixwaze jê re behsa adeteke mala bavê xwe bike û paşê bibin jin û mêr. Keçik vê yekê ji bo xelasiya xwe plan dike û asoxî jî bi saya planê xelas dibe. Xala balkêş ew e ku mêrik rêzê li hemberî adeta mala bavê keçikê digire û bi ya wê dike. Ev jî dide xuyakirin ku rêzgirtina li hemberî adetan di vê çîrokê de peyam û pîvaneke etîkê ye.

Ligel ku diyardeya keçrevandinê ne li rê ye û siwarî bêrêti kiriye jî, ew bi helwesta xwe ya rêzgirtinê, pîvaneke etîkê ya civata Kurdan dupat dike.

Gur, Mîh, Rêvî û Cewrik

(Apê Hemîd)

Dibê koçera barkirin ji dewsa xwe. Dibê mîhik belengaz ma li wê derê û cewrikik ma li wê derê. Li dewsa kona man, dibê li şûna kona av e û gîha mîha şîn bûye. Dibê mîh li dorê çû û hat çêriya, xweş çêriya û tam xurt bû. Dibê ji cewrikê re go “law cewrik ez jî mam bi tenê, tu jî li vir bi tenê yî. Şîrê min heye bixwe û em ê ji xwer va li vir bin, hêçolmese (ji “hiç olmazsa”ya Tirkî ketiye Kurdî, di wateya “qet nebe” de ye) rokê hinik hatin me tu bi kêrî min bêy. Dibê “baş e”.

Dibê rokê rêvî hat, go “mîh!”; go “hê!”, go “tu li nav mêrga xalê min gur diçêrî”. Go “welle va ez ê herim jêr bêjim.” Mîhê go, “law eman zeman, mêrga xalê te li ku ye law? Dewsa konê xelkê ye, va em ji xwer li vir diçêrin; çi heqê te li me ye?” Rêvî dibê “welle va ez ê herim şikayet bikim.” Dibê rêvî çû ba gur, dibê “welle wa mîh li mêrga te diçêrî.” Gur hat, ê cewrikê jî wextê ku rêvî go “ez ê herim şikayet bikim”; cewrikê jî go “ka koxikikê ji mir çêk û strî bavê ser serê min, dev ji min berd.”

Dibê gur hat go “mîh tu çima li vir diçêrî?” Cewrikê ji mîhê re go “bera sond bixwin; bê wer bi vê ziyaretê sond bixwe ku ev mêrg mêrga te ye, tamam.” Ê cewrikê xwe veşartîye di nav striya de. Dibê hat rêvî jêr go “tu li nav mêrga xalê min

diçêrî, welle va gur hat.” Ê dibê “welle ne a xalê te gur e, wer sond bixwe ha bi vê ziyaretê; bê welle a xalê min gur e.” Hîn gur nehatiye, ê rêvî nêrî ku waye cewrik e û çavê wî şîn dike di nav wan striya de. Vekişiya go “bavo ê mi elaqê mi ji vê mêrgê tune.” Dibê gur hat, go “tu çima li nav mêrga mi diçêrî?” Go “welleh ne mêrga te ye; wer sond bux ku mêrga te ye, tamam.” Gur hat ber cewrikê, cewrikê bi ha ev der (destê xwe davêje qirika xwe) qirika wî zevt kir û bera neda. Çiqe gur xwe bir û anî; vir de bir anî, vir de bir anî bera neda, hete ew fetisand. Ew cewrik dibê gur fetisand.

PEYAM Û ANALÎZ

1- Dema mirov dikeve tengasiyê, mirov dibe hewcedarê wan kesên li ba xwe. Loma jî mirov alîkarî û fedakariyê ji wan kesan teksîr nake. Ev cure têkilîdanîn ji ber sedemên refleksa xweparastinê ye. Mîh ji cewrikê re dibêje “şîrê min heye bixwe û em ê ji xwer va li vir bin, hêçolmese rokê hinik hatin me tu bi kêrî min bêy.” Cewrik jî qenciya ku mîhê pê kiriye, bi alîkariyê lê vedigerîne û asoxî jî mîhê ji destê gur rizgar dike.

2- Divê mirov li hemberî xetereyan bi tevdîr be. Tevdîr, bêguman xetereyê kêr dike û dibe ku bi tamamî wê têk bibe. Dema ku rovî çavên cewrikê dibîne, ditirse û direve.

3- Bi zilmê û bi kotekiyê mirov tim bi ser nakeve. Her zalim musteheqê xwe dibîne. Ji gur tirê ku wê bi kotekî zora mîhê bibe; lê tevdîra mîh û cewrikê zora wî dibe.

4- Alîkarî, piştgirî, hevkarî, lihevkerin: Di çîroka Gur, Mîh, Rêvî û Cewrikê de em van meziyetên medenî dibînin. Mîh û Gur piştî ku li warê koçeran bi tenê dimînin, mîh şîrê xwe dide cewrikê û ji cewrikê jî soza alîkarî û piştgiriya li hember xetereyan digire. Asoxî jî bi hevkarîyeke tekuz xetereyê ji holê radikin.

5- Mirovên bitevdîr nayên xapandin û têkbirin: Di çîroka Gur, Mîh, Rêvî û Cewrikê de em li vê peyamê rast tên. Rêviyê fennek weke hercar bi dora mîh û

cewrikê dikeve û wan bi gur ditirsîne. Lê bi saya tevdîra ku mîh û cewrik digirin, lîstika rêvî têk dibin. Mirovên ku di jiyane de li hemberî xetereyan xwedî tevdîr bin, zû bi zû têk naçin. Ma ne di jiyana rojane de jî dema ku mirov dikeve tengasiyê, bêguman mirov pêşîn li hevalên ku mirov dikare ji wan alîkariyê bixwaze digere. Paşê jî di çarçoveya planekê de mirov li hev dike û hevkarîyekê dike da ku mirov bi ser keve. “Destê tenê deng jê nayê” û “dest, dest dişû; vedigere rû dişû” hin ji gotinên pêşyan in ên ku vê peyamê perçîn dikin.

Pisîk û Çêlikên Mişkan

(H.Şukriyê Barmanî)

Mişk tim di qulê de ne. Ji qulê dernakevin, îja çêlikên wan derketine devê qulê. Lê nêrî pisîk li devê qulê ye. Pisîkê ji çêlikê mişk re go “ku hûn xwe ji vira çeng kin ha vira ez ê zêrkî bidim we.” Go “welleh baş e.” Go “de bise, em ê herin ji dê û bavê xwe re bêjin.” Derbas bûn hundurê qulê. Go “yadê, yabo!” Go “hi!” Go “yek li devê derî ye, go dibê ku hûn xwe ji vira çeng kin vira, ez ê zêrkî bidim we.” Go “ma we karibû xwe çengkira?” Go “erê.” Go “ew heywan çi heywan bû, şiklê wê çi bû?” Go “welle teriya wê dirêj bû, çavê wê şîn bû, rengê wê sor bû?” Go “hooohohoho! Go, ewane dijminê dê û bavê we ye law! Go hûn çawa xwe çengkin, go hûn di devê wê de ne. Ew pisîk e. Go, wexta ku law ev rêk ku ne rêk bi tirtir bûna, ma çima wilo heqê wê pir e? Go, helbet ev rê, rêk bi tirtir e; loma ku hewqes heqê wê pir e! Go, çawa hûn xwe çengkin hûn di devê de pisîkê de ne.”

PEYAM Ê ANALÎZ

1- Waatkirina her xelatê ne ji bo xêra mirov e. Wekî ku di çîrokê de tê gotin ku “ev rê, rêk bi tirtir e; loma ku heqê wê pir e.”

2- Têkiliya mişk û pisîkê bi vî rengî mirov dikare rave bike. Dijminê bavan nabin dostê lawan.

3- Dijminê bavan nabin dostê lawan: Di çîroka Pisîk û Çêlikên Mişkan de hindik dimîne ku çêlikên mişkan bi fena pisîkê bixapin; lêbelê bi şîreta dê û bavên xwe dijminê xwe yê ji bav û kalan baş nas dikin.

Şêwra Mişkan û Pisîk⁹³

(H.Şukriyê Barmanî)

Mişk, şêwra xwe kirin yek. Go “van pisîka em qelîhandin, em lazim e hawakî ji wan re çê kin.” Go “em ê çi hawî ji wan re çê kin? Bi xwedê qet em bi wan nikarin.” Go “çawa yaw?” Ê go “em nikarin bi wan!” Ê go “em çi bikin?” Go “em ê yek xwe bikin zengil û em ê xwe têxên stuwê pisîkê. Ku çawa bê, wê bik zingzing; em ê birevin.” Ê go yekî açixgoz (bi tirkî “açıkgöz”; di wateya zîrek de ye) go “hema ê min ez zengil! Ez heyranê wî me ê ku min têx qirka pisîkê. Ê min ez zengil, kî kare îja têx qirka pisîkê?” Çawa, heçî ku here wê wî bixwe.

PEYAM Û ANALÎZ

1- Di rewşên xetereyan de peydekirina çareseriyên ne gelekî zehmet e. Herkes dikare çend fikran pêşniyar bike; lêbelê di merheleya pêkanînê de pirsgerêk derdikevin. Lewra, pêkanîn carinan bedelê giran dixwaze. Di çîrokê de jî tu mişk nikare bibêje ku “ez ê zengil têxim stuwê pisîkê.”

2- Divê mirov di rewşên gelekî xetere de hay ji xwe hebe da ku mirov nekeve dehfika hin kesan û xwe li ber barana kesî şil neke. Di çîrokê de her mişk dizane ku kî bide vê riya bêvegerê, dê ew bibe xwarina pisîkê.

3- Xwe li ber barana kesî şil neke: Divê mirov di rewşên gelekî xetere de hay ji xwe hebe da ku mirov nekeve dehfika hin kesan û xwe li ber barana kesî şil

⁹³ Navê varyantê, “Kî Yê Zengil Têxe Stuwê Pisîkê”ye. Bnr. Zinarê Xamo, *Hebû Tûnebû*, rûpel, Stenbol, 2014, r. 230.

neke. Di çîroka Şêwra Mişkan û Pisîkê de her mişk dizane ku kî bide vê riya bêvegerê, dê ew bibe xwarina pisîkê.

2.2.2. Tekstên Çîrokên Neasayî

Di cureya Çîrokên Neasayî de sê çîrok hene. “Elik û Fatik”, “Keçik û Çêleka Zer” û “Şivana Qazan” in. Elik û Fatik têra xwe heye û dirêj e. Ev çîrok li gelek herêman bi wersiyonên cihê tê gotin. Lêbelê navê çîrokê her ev e. Bi naverok, peyama û lehengên xwe dişibe çîroka navdar Hansel û Gretelê ya Birayên Grîmm.

Elik û Fatik⁹⁴

(H.Şukriyê Barmanî)

Dibê çî hebû, çî tine bû. Dibê hebû Elik û Fatik. Dibê Elik û Fatik xweh û birê hev bûn. Dibê ca wan miribû, bavê wan jin anîbû û li ber destê jinbavê bûn. Û tehdeyî li wan dikirin, tehdeyî li wan dikin(mebesta dubarekirinê ji bo kirpandina bêjeya “tehdeyî” ye) Mêrik jî newêribû paşê xwe bidana jina xwe, tehteyî li zarokên wî dikirin. Dibê zarokên xwe bi xwer dibirin, bi xwer tanîn; bi xwer dibirin, bi xwer tanîn. Dibê wilo, wilo, wilo; dibê jî jî dixebite ku mêrê xwe qane bike ku wan bikuje.

Dibê rojkê haziriya xwe kirin, mêrik xapand û wî anî ser riya xwe ku wê wan bikuje. Mêrik jî dere cot, jî jî nanê bavê wan hazir dike; nanê bavê xwe wê bivin balê. Dibê êvarî jî mêrik ji jî jî re dibêje : “Keçê, îşev serê wan bişû. Serê sibê xwarinik xweş ji wan re çêbike û bid wan, dên ber wan. Û nanê mi bid wan û bera bênin. Ez ê yekê li serê xetê şerjêkim, yekê li binê xetê. Ez ê wan bikujiim.”

⁹⁴ Du varyantên wê hene. Navê herduyan jî “Elik, Fatik û Mangeya Belek”e. Ji bo herduyan Bnr. Zinarê Xamo, h.b., r. 274 û h.b., r. 371.

Dibê radibin nan dêtênin. Dibê lê nêrîn ku pisîk derbas bûye hindir, dibê “neew, neew.” Dibê “çi ye, çi dixwazî pisîk?” Dibê “welle ez ê tişkî ji wer bêjim. Hûn parîk nan bidin mi, ez ê ji wer bêjim.” Dibê, Elik dibê “ de va ye em têr naxwin, em ji naza mirin, îja em ê çi bidin te?” Dibê Fatik dibê “ kuro de bise hela em ê parîkî bidinê, belkî ka bê çi ji mer bêje.” Dibê Fatik parîkî didiyê. Dibê “welle mi ji bo Elik ne dîgo, lê feqet ez ê ji bo Fatik bêjim. De binêrin! Ew ê serê we bişû, wê xwarinik xweş dên ber we, hûn ê xwarina xwe bixwin û hûn ê nanê bavê xwe bivin, wê we yekî li serê xetê şerjêke, yekî li binê xetê. Hûn çûn ba bavê xwe, nanê wî dênin serê xetê û Fatik bera kumê Elik birevêne û berra ser piştta hev din û bi hev re dûr kevin û herin û herin û herin.” Welhasil dibê wilo dîkin.

Dibê nanê bavê xwe dibin serê xetê û nanê xwe dêtênin û dibên “wa ye nanê te” û Fatik radihêle kumê birê xwe û direvêne. Direvêne û berra ser piştta hevdû didin û jê wenda dibin û derin. Derin, derin, derin, derin xeramsemtikî ne ins û ne cins û ne şînayî û ne filan û ne bêvan. Derin ku şikeftik wa ye li wê ye. Di devê şikeftê de bûn mêvan, wê şevê li wê derê dimênin. Lê dinêrin ku dengik ji hindirê şikeftê tê. Lê dinêrin ku pelpela xwarinê ye, mesele niqrî dikele. Dibê Elik û Fatik derin ser wê niqriyê; lê dinêrin ku wa ye goşt e, dikele. Goşt dikele, ku goşt keliya tahm dîkin. Dibê ew niqriya jî encax efrît, encax însanê dêw karibe wê niqriyê dêne. Dibê Elik û Fatik wê niqriyê dêtênin. Dibê evane dibê “ kuro va ev ins in li devê derê ne, ev cins in?” Dêrdikevin lê dinêrin ku Elik û Fatik in. “ Xêr e?” Dibê “welle hal û mesele weha ye.” Ê dibê “law ji îro û pê ve tu birê me yî mezin û ev jî xwa me ye. Bera ji me re taştêya me, şîva me çêbike û em jî em ê herin seyde, em seydvani ne û em ê seyde bikin û em ê bênin û em ê tevde bixwin, em ê tevde rûnin, bixwin.” “Baş e.”

Rok, dudo, sisê û çar û pênc û şeş û heft û heşt... Ev efrît ji wê der derin, evane dimênin li wê derê. Dimênin li wê derê, qey gund jî nêzîkî wan e. Dibê li wê derê keçik dibêje “ Elik!” Dibê “ çi ye?” Dibê “tê herî ji mir dolabkê bêni û tê meqlebê bêni.” Yanî a ku wê ta lê birêse. Welhasil “ û tê ji xwe re jî cotik ga bistênî û halet û filan û bêvan tê bistênî. Tê vê derê cot bikî û em ê ji xwe re zad

biçinin û em ê li vê derkê gêçima(debara) xwe bikin. Elik jî wilo dike, dere ji xwe re distêne, qey perê wan hene. Ê li wê der dimênin.

Dibê çawa dibe? Dibê şerbik avê dixinê û devê şerbik yanî digirin lê devê şerbik vekirî têhlin(dihêlin). Ê keçik ji paleyiyê tê hema radihêle şerbik û qurp, qurp, qurp bi ser xwe dadike û çêlika mar dikeve hindirê zikê wê. Çêlika mar dikeve hindirê wê û hin bi hin, hin bi hin, hin bi hin di nava keçikê de mezin dibe. Di nava keçikê de mezin dibe; welhasil derin...

Dibê “xwa te avis(ducan) e.” Ew jî dibê “yaw xwa mi avis e çawa? Xwa mi ne avis e?” Welhasil dibê “xwa min e, ez wê nakujim.” Wê dibe li cîkî berra dide û tê. Dibê tê. Dibê keçik jî dere xwe li cê avê digire, dere ser birkê. Dibê dere ser birkê û xwe xwarî avê dike ku wê yanî avê vexwe û devê wê vedibe û mar ji zikê wê dikişê. Mar ji zikê wê dikişê, zikê wê vala dibe.

Dibê siwarik tê, ew jî kerwan e tê. Ê siwar hespê xwe rast têne ser avê, dibê keçik hilkişiyaye ser dara tûyê û rohnayiya wê daye ser avê. Dibê hilkişiyaye ser dara tûyê Fatik û dibê wexta ku Siwar çav lê dikeve dibê “ti ins î, ti cins î?” Dibê “welle ez ins im û hal û mesela mi ev e û weha hatiye serê min.” Dibê “de ti li vir be; aneha ez ê herim heft defa, heft zirna ez ê lêxim û ez ê bêm te ji xwer bênim.” Siwar çawa dere, kerwanê qereçiya tê. Kerwanê qereçiya tê, pîrik ji wan vediqete tê û dadikeve ser bîrê. Lê dinêre ku keçik li ser dara tûyê ye. A qereçî dere balê. A qereçî dere balê, dibê “ti ins î, ti cins î?” Dibê “welle ez ins im.” “Ê xêr e?” Dibê “welle hal û mesela mi weha ye û layê paşê ez xwestime û aneha wê bên bi heft defa, bi heft zirna wê mi bivin.”

Pîrê radibe dehfkê dide keçikê, keçikê dike xwarê, keçik dimire; dibe gul û di qiraxa birkê de şîn dibe. Gulik wilo Mihemmedî, gulik xweşik. Evane tên, wexta pîrê dadixin lê dinêrin; pîrê lêvê(n) wê qelişandî ne, nigê wê qelişandî ye, hih (li vir herdû destên xwe bi qasî bihustekê ji hev vedike) latanê nigê wê weha ne. Dibê “filankes çima nigê te weha ne?” Dibê “hingî min nigê xwe li erdê xistine; dim, dim, dim, dim(destekî xwe datîne ser çonga xwe ya tewandî û li erdê dixê.) kengî wê layê paşê bê? Nigê mi wilo bûye!” Ê go “lêvên te?” Go “lêvê mi jî

hingî mi gotiye tiv tiv tiv(tiliyên destê xwe yê rastê dibe ser lêva xwe ya jêr û bi dorê wan ji jor ber bi jêr ve bi rîtmekê ditewîne.) kengî wê layê paşê bê? Lêvê mi wilo qelişîne!” Welhasil dibê “porê te?” Dibê “ji qehra ye; e(z) lêviya (ez li hêviya) wî mame, mame porê mi spî bûye!” Û tê. Tê, wê siwar dikin û tîn. Ê pîrê ye; dibê yekî wek mi, yekî wek te dibê “kuro bi Qur’an, ev gul ji bûka me bi hezar qatî xweşiktir e!” Dibê radihêlin wê gulê û tînin. Dibê (pîrê gotiye) “gerek ew gul neyê, gerek ew gula hûn nênin!” Zane ku gul keçik e. Dibê wexta ku gulê dipêritênin, tavêjin; dibê gul dibe çiwîk. Gul dibe çiwîk û bi ser serê wan re... Bi ser serê dawetê re, bi ser serê dawetê re dere. Dibê derin, welhasil wê divin mal.

Dibê wê divin mal û pîrê hey paşe wê mahr kiriye; dibê evane jî ku çiwîkê serê wê jê dikin; dibê îja dibe neynikik a teşiya. Teşî, te dî wexta ku badidin; wilo hesinkî wek gopal tê de ye, ta pê ve dieliqênin û ba didin. Bûye neynik û ketiye hindirê pîrê. Dibê wexta pîrê derdikeve tê ku hindirê pîrê maliştî ye û ava wê danînî ye û şîva wê hazir e. Pîrê rok, dudu, sisê qûna wê nema erd digire ji tirsar. Dibê “wellaî evane hawak tê de heye!” Welhasilî pê diheser. Diwayiyê dibê “ez im, ez filankes immm!” Filankes im, dibê îja (pîrê) radibe dibê “ka tê çibikî?” (Fatik) Dibê “welle haaal û mesele wehanê ye!”

Mêrik tê (ji Fatikê bêhay e û wê wek cêriya pîrê dizane) dibê “keçê, va ye ez ê herim bajêr; bê çi lazimiya te heye ez ê ji te re bênim.” Dibê ew keçik(Fatik) jî eşkere bûye(herdû milên xwe wek ber bi çep û rastê vedike), bûye keçik. Dibê “law, ê te tiştik ji ter ne lazim e; ê te jî?” Dibê “welle ê mi tiştik ji mir ne lazim e; kêçexsîk ji mir lazim e, kêçexsî.” Dibê “çi ye, çilo ye, li ku difiroşin?” Dibê “li cem etara difiroşin, ti ji etara bêje...”

Dibê dere şehir, tiştê ku pîrê gotiye hezar tişt gotiye. Dibê îjar diwayiyê derdikeve ku here, dibê “law welle wê keçê jî kêçexsî li min wesand û waye min neaniye.” Vedigere dibê “ka kêçexsiyê”, dibê xwediyê ku difiroşe “dibê kuro ev bê çi ye, ev derdê wê heye; lê miqatebe bê wê ev çi bibêje?” Radibe îja tîne wê kêçexsiyê dixê nav leganik avê û ji serî hete binî mesela xwe dibêje. Dibê “hal û mesele wehanê bû û jina paşê ez bûm û hatiye ez dehdame û ez kuştim; ez bûme gul û ez bûme neynik û nizanim bûme çi û ha îro jî ez bûme

cêriya paşê û ew jî waye bûye jina paşê.” Û wexta ku wê tam pêd biteqe û mêrikê paşe hema radihê çepî jînikê(pîrê) dêtêne ber û keçikê derdixê derve. Radibê pîrê jî li wê derê Xwedê Teala wê dîkujê û Xwedê Teala miradê wî û keçikê bi hev dîke. Mesela Elik û Fatik ev bû.

PEYAM Û ANALÎZ

1- Hevkarîkirina li dijî mebestên kirêt, encamên erênî derdixê. Hefkariya Elik û Fatik, rê li ber xelasiya ji kirêtiyên jinbava wan vedike. Destê tenê deng jê nayê.

2- Bihevrejîyîn, lihevkerin û karbeşiya bi kesên ji xwe cuda, encamên sûdmend derdixê. Elik û Fatik li şikeftê bi efrîtan re li hev dîkin û karbeşiya jiyana rojane dîkin.

3- Bê xebata aborî tu mirov nikare debara xwe bike. Elik û Fatik ji bo debara xwe bikin dest davêjin xebatên tarêsin û cotkariyê.

4- Divê mirov guh nede buxtan û bêbextiyan. Elik jî guh nade buxtana ku li ser Fatik tê gotin û wê nakuje.

5- Divê mirov her tiştê xwe ji her kesî re nebêje. Fatik, bi dilekî pak sira xwe ji pîra qereçî re dibêje û pîrê ji hesûdiyê wê dîkujê.

6- Bi veşartina rastiye mirov heta hetayê bextewar namîne. Bêbextiya pîra qereçî taliya talî eşkere dibe û pîrê digihê musteheqiya xwe. Gîha di binê kevîran de namîne.

7- Mirov bi sebrê dibe melîkê Misrê. Fatik piştî ku ewqas zehmetî kişand, lê bi sebirîkirinê gîha miradê xwe.

8- Fatik, li ser bextê xwe dimîne û li benda kurê paşê dimîne. Kurê paşê jî li ser bextê xwe dimîne û tê ku Fatikê ji xwe re bixwaze.

9- Bihevreyîyîn, lihevkerin û karbeşiya bi kesên ji xwe cuda, encamên sûdmend derdixe: Dema ku Elik û Fatik ji ber plana kuştinê xwe direvin, tên şikefteke ku efrît tê de dijîn. Ew bi efrîtan re li hev dikin, karbeşiyê dikin û demekê bi hev re dijîn. Asoxî jî li wir bi cih û war dibin. Ev taybetmendiyên hanê di roja me ya îro de ji bo sîstemên rêvebiriyê yên plural xalên sereke ne. Bêyî van tu civak û rêvebirî nikare bi awayekî aşitiyane bi hev re bijî

10- Divê mirov guh nede buxtan û bêbextiyan: Dîsa di çîroka Elik û Fatik de em liqayî vê peyamê tîn. Dema ku Fatik ji cêr avê vedixwe marek dikeve zikê wê û him bi him di zikê wê de mezin dibe. Yê ku vê rewşa Fatik dibînin bêbextiyê lê dikin û ji Elik re dibêjin ku ew ducan e û divê tu wê bikujî. Elik ji vê buxtanê bawer nake û destê wî li xweha wî nagere. Di nav civakên paşdemayî mixabin sûcdarkirin û kuştinên bi vî rengî gelek çê bûne/çê dibin.

11- Divê mirov sirra xwe nede herkesî: Di çîroka Elik û Fatikê de Fatik dema ku sirra xwe ji pîra qereçî re dibêje, pîrê ji wê didexise û wê ji darê dehf dide. Ev bûyer dibe sedema ku Fatik veguhere gulekê. Mirovên ku zûzûka baweriya xwe bi mirovên din tînin sîrrên xwe ango agahiyên taybet eşkere dikin. Hay ji mirovên baş ku herkes weke wan baş e; lêbelê rastî tiştêkî din e.

12- Bi sebir, deyax û aqil mirov dikare ji zehmetiyan xelas bibe: Elik û Fatik gelek zehmetî bihurandin lê bi ew bi aqilên xwe û herweha bi sebir û deyaxê ji zehmetiyan xelas dibin. Îro ro jî mirov mecbûr e ku xwe li hemberî zehmetiyan rabigire û bi metodên aqilane tevbigere. Heke na mirov nikare bi ser keve. Beredayî nehatiye gotin ku mirov bi sebrê dibe melîkê Misrê.

Yavuz, bûyera “di dema vexwarina avê de daqurtandina çelîka mar” wek hevbeşiyêke çîrokên ku ji Herêma Anadoluya Başûrê Rojhilat hatine berhevkerin, dibîne û lê zêde dike ku di encama werimandina zikên keçikan bûyerên kuştinê jî rû

didin. Keçikên ku ji ber vê yekê mexdûr bûne bi riya çîrokê mekanîzmaya “xweparastinê” ava kirine.⁹⁵

13- Bextê Fatik û Kurê Paşê : Bext, di biwêj û gotinên pêşiyên de gelekî hatiye bikaranîn. Çend wateyên wê hene: Wek, bicihanîna sozê, baweriya bi yekî/ê, dilsozî, mêranî û hwd. Di çîroka Elik û Fatik de kurê paşê dema ku çav li Fatikê dikeve, jê re dibêje “li vir be, ez ê bêm te ji xwe re bixwazim.” Kurê paşê bextê xwe tîne cih û tê ku wê bibe. Fatik jî li ser bextê xwe dimîne û li benda wî disekine. Ango bêbextiyê li hev nakin û bi vê helwestê peyameke etîk didin. Gotinên pêşiyên zêde ne li ser bextê. Wek; “bext nadim bi text” û “bext kela mêra ye” hin ji wan in.

Keçik û Çêleka Zer

(Habîb SÎNCAR)

Yek hebû, yek tune bû, ji Xwedê meztir kes tunebû. Mêr û jinek hebûn û qîzek wan hebû. Ev mêrik carekê zewicîbû. Kulfeta wî miribû, ji kulfeta wî yî mirî qîzikek wê hebû. Lê dêmariya keçikê, tehde lê dikir. Tehde lê dikir; çêlekek wan î zer hebû. Çêlekek wan î zer hebû; go îja ev qîzik ji vê çêleka zer pir hez dikir. Îjar hingî xizmetek wer ji çêleka zer dikir, roja ku wext hat derbas bû, gotin “ em ê çêleka zer şerjêkin.” Îjar çêleka zer ji qîzikê re go; go “binêre vey(vaye) ez pîr bûme, wê min şerjêkin. Lê feqet xizmetek te ji mir kiriye, ez ê wexta min şerjêkin kî goştê min bixwe (d)ê bê “tehl e”, nikare bixwe. Wê goştê min bi te tenê şêrîn bî.” Îja go “tê goştê min jî, tê goştê min bixwî û tê estiyê min jî têxî kîsekî, têxî binê erdê; ro bê ê ev estiyên min giş ji te re bi zêr bin, bi cil û libas bin, bi tiştê wa bin. Tê pê herî kêf û seyrana.”

Go dem hat, çêlek şerjêkirin; kê goştê çêlekê xwar go “eyyy, ev goşt nayê xwarin, go tehl e.” Go ev qîzikê xwar, go “welle goştê wê pir xweş e.” Goştê wê

⁹⁵ Ji bo agahiyên berfirehtir binêre Muhsine H.Yavuz, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri*, Cumhuriyet Kitapları, İstanbul, 2009, r. 35-7

çêlekê go wê qîzîkê tenê xwar. Û wek çêlekê jêr go, ew estî xistin binê torbakî û xistin binê erdê. Dem hat li wê herêma wan dawetek çêbû, ya kurê paşê çêbû. Û vana dê û bavê wê û birayên wê wan giş çûn dawetê û ew li ber malê hiştin. Îja go qîzîkê go “dawetek girîng çêbûye; hela ez ê herim sozê çêleka zer daye min ecep aniye cî? Ez wan estûyên min xistibûn bin erdê, ez herim li wan binêrim. Qîzîkê çû ew estûyên bin erdê giş jê derxistin, giş jêr bûne cil, libas, zêr û zîv. Li xwe kir û berê xwe da dawetê, kesekî ew nas nekirin. Dê û bavê wê lê pirsîn, go “tu ku yî, tu çi yî, tu ji ku hatiyî?” Go “çîroka min ez keça filankes im û çîroka min ji vir heta vir e.” Rehme li gora dê û bavê guhdara, ji xeynê cendirme û tehsîldara.

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Kî qencyê bike, ew jî bêguman dê qencyê bibîne. Keçik li beramberî xizmeta ku bi Çêleka Zer re kir, jê jî qencî dît.
- 2- Kî qencyê bike, ew jî bêguman dê qencyê bibîne: Di çîroka Keçik û Çêleka Zer de tê dîtin ku Keçik ji Çêleka Zer pir hez dike û baş lê dinêre. Loma jî Çêleka Zer qenciya ku Keçik lê kiriye bi qencyeke din lê vegerandiye. Piştî ku tê şerjêkirin goştê wê bi herkesî tehl lê bi Keçîkê tenê xweş tê. Ji bilî wê jî eyarê wê jî bi kêrî Keçîkê tê, ew jî dibe zîv û zêr. Gotina Pêşîyan a ku dibêje “qencî qencyê nas dike” tam bi peyama vê çîrokê re diguncive.

Şivana Qazan⁹⁶

(Habîb SÎNCAR)

Yek hebû, yek tune bû; ji Xwedê meztir kes tune bû. Qîzikek hebû, navê qîzikê Gulbarîn bû. Qîzik, qîzikeke werê xuşik(xweşik) bû, wexta dikeniya gul dibariyan û wexta digiriya jî baranek wa hûûûrik hûrik dibariya. Ji ber wî hawî navê wê danîbûn Gulbarîn. Diya qîzikê rehmet kiribû; qîzik û pîra xwe di qonaxa paşakî de şivanê qaza bû, qaz diçêrandin. Bela ku bibûn şivanê qaza, qaza bi çavêkî li Gulbarîn dinêrtin hingî Gulbarîn xuşik bû û bi çavekî jî bela dixwarin, qazê wan zîf bibûn. Ew ji ber qaza qewirandin, gotin “hûn li qazên me baş nanêrin.” Û Gulbarîn û pîra wê ji xwe re derin, dimeşin li cîkî dinê li îşkê digerin.

Derin cîkî dinê, em ê bên herêmek dinê, ba paşayekî dinê. Ê dest bi îşkê bikin, di rê de îja şivanekî dibînin. Di rê de şivanekî dibînin, dibêjin şivan qîzikê dibîne. Dibîne ku qîzikik pir xuşik e, dibê “xêr e hûn ê bi ku de herin?” Dibê “welle em feqîr bûn, em li ber qaza bûn û ji ber qazê wan me baş li wan nenêrtî, em qewirandin e. Ew jî ji bela wexta qîzik dikenî gul dibarin û wexta dikenî jî baran tê. Em jî îja bira qaz qîzikê nebînin, ka tiştîrekê şerjêke bide me û em ê ciyê nû em herinê em ê bikişînin serê qîzikê, bira kes xuşîkbûna wê jî nebînin û ciyê em herinê jî cî bidine me.”

Welhasil şivan wek tiştê ew dixwazin, tiştîrekê ji wan re şerjê dike dide wan û derin cîkî dinê. Li ba qesrik dinê dişixulin. Rokê ev lawê paşe dibê “hela ez herim ev şivanê me yî qaza çawa ne, dibê hela baş li qazê me dinêrin nanêrin?” Di wê anê de jî Gulbarîn eyar ji serê xwe derxistiye û kurê paşa xuşîkbûna wê dibênî û wê dibe sarayê û mehra xwe lê dibirî. Rehme li gora dê û bavê guhdara, ji xeynî cendirme û tehsîldara.

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Ji bo debara aborî carinan mirov mecbûrî fedakariyan dibe. Keçik ji bo ku ji karê xwe neyê qewirandin eyarê tiştîrê xistiye serê xwe.

⁹⁶ Navê varyantê, “Gulbarîn”e. Bnr. O.Celîl-C.Celîl, *Zargotina Kurda II*, aram, Amed, 2013, r. 299.

2- Ji bo debara aborî carinan mirov mecbûrî fedakariyan dibe: Di çîroka Şivana Qazan de Gulbarîn ji bo ku bikaribe li pîrika xwe binêre û debara xwe bike ew mecbûr dimîne ku xweşikbûna xwe veşêre. Loma jî eyarê tiştîrê dikişîne serê xwe. Wekî ku tê zanîn debarkirin îro ro jî zehmet e û gelek mirov hene ku ji mecbûrî fedakariyan dikin û li hember zehmetiyan xwe radigirin. Peyam bi me dide zanîn ku ji bo debarê mirov divê bikaribe fedakariyan bike. Bi taybetî ji bo hinek mirovên ku bi tu karan qaîl nabin û xwe li zexeliyê datînin, ezmûneke baş e ev çîrok û peyama wê.

2.2.3. Tekstên Çîrokên Rasteqîn

Di nav vê cureyê de sê çîrok hene. Bi dorê weha ne: “Kî Bipeyive Wê Kerê Girê Bide?”, “Walî û Cotkarî”, û “Ê Qebalî û Ê Rajnî.”

Kî Bipeyive Wê Kerê Girê Bide

(H.Şukriyê Barmanî)

Jin û mêr kerê wan hebû. Kerê wan hebû, ker li hewşê ye. Ker li hewşê ye, jinê go “her kerê girê de.” Wî go “her kerê girê de”, wê go “tu kerê girê de”, wî go “tu kerê girê de.” Ne ew rabû ne ew rabû. Yekî parsek jî tê devê derî; dibê “yadê, ji bo Xwedê û ji bo Pêxember hûn ê bi xêra xwe tiştî bidin me.” Ne ew dipeyive û ne ew dipeyive. Mêrik jî, ê parsek, çavê xwe li dora malê digêrîne; dinêre hema wa lihêfa wan qey di kuleka livîna de ye. Dibê hema radihê lihêfê û li ser piştta xwe dike û di derî re derdikeve.

Di derî re derdikeve, ne mêr deng dike ne jin deng dike. Herdû jî mane rûniştî, kî bipreyive wê here kerê girê bide. Ji mêrik û ji jinik, dilê jinikê agir pê dikeve. Jinik hema ji nişkê ve radibe, dibê “hîh” tepkê li serê mêrik dixê û dibê “xwelî li serê te be.” Mêrik dibê “hah bi Qur’an ti peyivî, tê kerê girê bidî.” Û jinik bi pey mêrik dikeve. Bi pey mêrik dikeve; li nivê rê digihê, dibê “wer yabo,

mêrê min bi qurbana te be. Wer ez jina te, tu mêrê min. Ma ne xebînetâ min ku ez jê re me?” Hevdû divin, derin.

Derin, mêrik jî ji dile xweyî saf e. Jinikê jê re gotiye “ez jina te me.” Dibê “ha jinê!”, dibê “çi?” Dibê “ji xêra Xwedê re mala ku em îşev biçûnayê helawî çêkiribûna, helawî. Çiqe dilê mi dere helawiyê.” Bi îrada Xwedê derin wê malê, lê dinêrin şîva wan helawî ye. Ê jinik mel’ûn e, jinik xwe xistiye kirasê malê. Bi pîrekê re radibe û rûdinê û filan, bêvan. Wexta şîvê ku wê dênin dibê “welle sebra mêrê min li helawiyê nayê.” Dibê “sebra wî li çi tê? Em ê jêr çekin.” Dibê “welle nan û pîvazê dixwe.” Ew pîvaza tûj, sîrke û tehle tehl û perçak nan didinê û hêstirê wî û girêza wî û lîçika wî tevlihev dibe. Niza bi çi hawî dixwe. Jinik (a mêvan) jî wexta ku şîvê dixwin û şîva xwe hiltênin, firaqê xwe hiltênin ew wê helawiyê dike girêk û dixê tûr û bi ser ciyê mêrê ku xweciyê(xwedî) malê ye dieliqêne. Bi ser cê xwediyê malê dieliqêne.

Jinikê jî jêr gotiye “navê te çi ye?” Gotiye “navê mi Milkurrî ye.” Ê ku yanî jinik revandiye. Milkurrî, Milkurrî neyse bi şev radikevin. Ê birçî ye; xewa kuştiya tê, a birçiya nayê. Mêrik radibe diziya tûrik. Radibe diziya tûrik, mêrik (xwediyê malê) pê dihese. Pê dihese, dibê “piş piş.” Xwe berra nav ciya dide dîsê. Cardin radibe, cardin pê şiyar dibin. Cara sisiya girêkikê jê derdixê û mêrik (Milkurrî) çawa maçkê dêtênê, li nêviyê newqa mêrik dixê. Jinik dibê “law ti çi dikî kuro Milkurrî?” “Keçê!” dibê, “mi di çî te nîhandê, ma riya derî kanî?” Milkurrî jî hema hingê diqehere; ew ê girêkê çawa tavê li devê mêrikê xweciyê malê dixê. Ku dikeve devê mêrik; ê helaw, şêrîn e helawî. (Mêrikê mazûvan) dibê “keçê bi Qur’an guwê vî kûçikbavî ji şîva meyî şevî din şêrîntir e law!”

Û welle mêrik (Milkurrî) hema lihêfê û jinikê têhle û dere. Direve û dere. Serê sibê jinik radibe tê. Lihêfê li ser piyê xwe dike û tê dinêre ku hîn mêrik (mêrê wê yê ku terikandibû) rûniştiye. Dibê “lo xwelî li serê te be, ti hîn rûniştiyî?” (çîrokbêj teplêdana li serê yekî nişan dide). (Mêrik) “Heh!” Dibê “tê kerê girê dî.” Heye derdikevin, ker gura kuştiyeee. Ma zaten li hewşê maye û ker derketiye, gura wî kuştiye.

PEYAM Û ANALÎZ

1- Dema ku mirov zexel be, tiştê ku di dest de ye jî ji dest diçe.

2- Divê ji bo xebatkirinê mirov xwe nede benda hinekan.

3- Dema ku mirov zexel be, tiştê ku di dest de ye jî ji dest diçe: Di çîroka Kî Bipeyive Wê Kerê Girê Bide de jin û mêr ji zexelî naxwazin tu karî bikin û yek xwe dide benda ê/a din. Loma jî bi hev re dikevin pêşbaziya bêdengiyê. Xwedêgiravî kî bipeyive dê kerê li hewşê girê bide. Lê dema zilamê parsek tê lihêfê dibe; jina malê debar nake, terka zilamê xwe dike û bi pey zilamê parsek dikeve. Jina malê piştî demekê ku li mêrê xwe vedigere, dinêre ku guran kerê li hewşê xwarine û zilamê wê hîn jî di pêşbaziya bidengiyê de ye. Di jiyana rojane de jî em gelek caran liqayî mirovên zexel û kone dibin. Ew li bendê ne ku hinekî din bi kar û xebatan ve rabin û ew jî vezelin. Lêbelê tê zanîn ku mirovên weha nabin xwediyê tu tiştî, lewra ew qîma xwe bi tiştên ku ji ber mirovên din mane, tînin. Helbet hercar bi siûd nînin, carinan tu tişt bi dest wan nakeve û dikevin rewşeke gelekî muhtaç. Pêşiyar ji yê weha re gotine ku çavên li deriyar xwelî li seriyar.

Walî û Cotkarî

(H.Şukriyê Barmanî)

Cotkarîk hebû, her sibe diçû cot; her sibe diçû cot, feqet jina wî hingî ku jê hez dikir nema zanibû ku wê bi çi hawî here cot. Serê sibê radibû, dismala xwe ji berîka xwe derdixist û li pey gayê xwe direqisî hete diçû cê cot. (Ji guhdaran Mihemed dibêje “oxyaaan xweziya mi bi dilê wî law”)

Walî jî mala wî li kaş e û her sibe walî lê dinêre her sibe di ce’de re dimeşe. Walî lê dinêre, dibê “law welle ev cotkarîk e, ev eşq û kêf û muhbet di dilê wî de ye; ev çawa dike, ev çi xêr e?” Ma ecêmayî walî. Rokê nebû nebû, walî go “yaw bişênin pey wî cotkarî, bera bê îşê mi pê heye.” Rabû yek hat go “yabo welle walî te dixwaze. Go “yabo walî ji ku min nas dike? Ez çi me, ez feqîrik im, belangaz

im.” Go “yaw welle tu feqîr, nefeqîr bi Xwedê te dixwaze. Rabû gayê xwe û cotê xwe û kerê xwe hişt û lêxist çû ba walî. Go “xêr e walî paşe te şandiye pey min?” Go “welle e(z) li vê kêf û eşqa te dinêrim, ev çi xêr e law? Ez walî me, ev eşqa te ned dilê mi de ye. Go “bi Xwedê jina mi di emrê mi de ye û bi dilê min e û ej ter bêjim; êmê heywanê mi dike, şorba mi serê sibê çê dike, tuxmê mi dadigire dêtêne ser piştta kerê min, mi dixê devê rê û darê mi dixê destê mi û dibê her cotê xwe û hingî kêfa min ji Xwedê, ji jina mir tê ej xwer direqisim, kêfa mi tê e(z) direqisim.”

Go “law bi dîn û bi îman û bi namûs sê jinê min in, bi namûs û bi nîkeh sê jinê min in; ez ê her siyê xwe bidim te, yeterkî tu a xwe bidî mi. (“yeterkî” Tirkî ye, wate jê “tu tenê ya xwe bide min”e. Mihemed ji bo teklîfa walî dibêje “ma yaxme ye!) Go “paşe nabe wilo, filan bêvan.” Go “ne mij ter go law? Dixwazî bi xweşî, dixwazî bi reşî. Bi Xwedê ez ê ji te bistênim.” Ê go “ez ê herim ji jina xwer bêjim.” Çû ji jinêr go; jinê go “heyra wellahî bê dilê min e; lê wexta ku ez bibim jina walî ez ê qundera di nigê xwe xim, ez ê gora di nigê xwe xim, ez ê tembel bim, ez xwarinê çênakim, aşçiya mi wê hebe, cêriyê(n) wê hebin, tu zanî welle!”

Ê ma mecbûr, rabû jina xwe da pey xwe çû û walî jî her sê jinê xwe dan pey xwe. Qunderê(n) wan jî her yekê hah bihustkê (destê xwe bihostekê ji erdê radike) ji erdê bilind û teq û teq û teq û teq. Çem di orta mala wan û walî de ye, weha hatin ber çem. Hatin ber çem, wê çap kin? (çawa bikin?) Nikarin li avê xin, giş qunderê wan, gorê wan ha hete vir(destê xwe datîne ser kaboka xwe) û qundera deve dêrisî (“deve derisi” bi Tirkî ye, tê wateya “çermê hêştirê” ye.) herkê (her yekê) bihustkê kabikê(n) wan ji erdê bilind.

Rabû a mezin li piştta xwe kir, bir nêviyê çem û qûna wê gîhand avê. Go “tu uzrê xwe dibêjî bêje, tu nabêjî bi namûs ez ê te bi rot berdim. Go “welle ez diziyê dikim, ej mala xwe diziyê dikim.” Wê derbas kir, hat a navîn; a navîn bir nêviyê çem qûna wê gîhand avê, go “ez ê te bi rot berdim, bê(bêje) uzrê te çiye?” Go “welle ejî qûnek im.” Ew jî derbas kir.

Vegeriya a biçûk, bir nêviyê çem, qûna wê gîhand avê go “uzrê xwe bêje?” Go “welle ejî ehmeq im, deng li ser im, go li vî guhî dikeve, di guhê di re derbas dibe.” Go “heydê heydê ed oxira te kim, ê tu tu here.” Ew bi rot berra da, ew çû. Her duyê din derbas kirin, çû. Çû, walî rok, dudo, sisê, deh, du meh, sê meh, çar meh deng jê nayê. Walî go “welle mi nîha diya wî, mi kula mala xwe xist mala wî.”

Rokê rabû; oda wî yek bû, derîk weha di qarşî wî re û derîk din jî weha di qarşî wî re vekir. Ode kir du derî. Derîk li wî alî, derîk li vî alî. Genimê wî bi cîkî bû, kir deh ciya; cehê wî bi cîkî bû, kir deh ciya; nokê wî wilo, nîskê wî wilo. Temamê eşyayê xwe her yek kir bi deh ciya. Rabû evane serê sibê jinê(n) wî nikarin ne nigê xwe bavêjin, ne herin ne bèn. Go “yaw evîne em heyirandin, deriyê me yek bû û zivistan e û sar e û derîk li qarişî wî jî vekir. Keçê go ma ev ceh, genim, nok û nîsk her yekê kiriye bi deh ciya. Go ka ku îşev hat, bû çar pênc meh tê re derbas bûne, ku hat em ê sualê jê bikin, ev çiye, çi mesele ye?”

Rabû êvarî mêrik hat, go “heyra te cê me teng kir, deriyê me yek bû, te dudo tê re vekirine û firaqê me yek bû; te her yek kiriye deh perça.” Ê go “keçê ev deriyê ku mi tê re vekiriye; ev hurme bi xwe ne ewle ye. Go hêç olme ku ez di vî derî re têkevim hundur, go wê dostikê wê di deriyê dir derkeve, ez wî nabênim; gunehê wî bera nekeve stuyê min.” Ê go “te ev cî, nok, nîsk, genim, ceh te yekê kiriye deh ciya.” Ê go “wexta ew ji cîkî bive genim, ez ê tê derxim; ceh wilo, genim wilo, nîsk wilo. Go îjarê bûye ew komik, ew komik, ew komik; go rojê her yekê çengikî, çengikî, çengikî wê ji xwe re diziya xwe tetmîn bike, wê tiştê xwe pê gîder (debar) bike. Ji bo ku ew jî ez tê dernexim. Genim biriye, ceh biriye, nok biriye, nîsk biriye, dizî jî kiriye ez pê nahesim.”

Car din serê sibê lêxist çû cotê xwe, walî lê dinêre go “welle mi di dê û xwehê te niyo, go welle ez zanim çi agir ketiye mala te.” Biro ku evane dere cot, pîrek herdû li hev vedihewin. Dibê “welle keçê, bi Quran ev zilamê me zilamkî kawik e; zilamkî pir baş e. Ka îşev ku hat em ê li ber Xwedê û li ber destê wî tobe bikin. Nema ne ez qûna xwe didim û ne tu diziyê bike.” Go “welle baş e.” Rabû hema ji nîvro de êmê heywanê wî hazir kirine, misînê wî hazir kirine, sicada wî

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Tifaq û hezkirina jin û mêr bextewariyê tîne.
- 2- Bextewarî ne bi mewkî û maqamê ye.
- 3- Ji bo guherandina tevger û reftarên nebaş ên mirovan, divê mirov bi tolerans be. Lewra encamên erênî bi hukmên pêşîn nayên bidestxistin.
- 4- Mirovên xwedî tevger û reftarên nebaş li hemberî toleransê, dikarin bên guherandin.
- 5- Mirovê bextewar di heman demê de ji debara mala xwe re jî jêhatî ye.
- 6- Dilsozî, tehemmul, sebir û hezkirin bextewariyê tînin: Di çîroka Walî û Cotkarî de sê jinên walî yên ku bi mêrên xwe re dilsoz nînin, hene. Lêbelê jina cotkarî, berovajî jinên walî, bi mêrê xwe re gelekî dilsoz e. Ev rewşa hanê bûye sedema ponijîna walî û bextewariya cotkarî. Walî ji bo ku ji vê rewşê xelas bibe, sê jinên xwe dişîne cem cotkarî û jina wî jî tîne cem xwe. Ji walî tirê ku cotkarî êdî dê ne bextewar be, lê cotkarî bi sebir û tehemmulê taybetmendiyên nebaş ên jinên walî ji holê radike. Asoxî walî ji berê bêtir bextewar dibe. Ji ber van helwest û tevgerên cotkarî jî walî wî layiqî walîtîyê dibîne. Peyama vê çîrokê ev du gotinên pêşiyên ên ku dibêjin “bi sebrê, mirov dibe melîkê Misrê” û “bi xweziyan mirov nagihîje baqê keziyan” tînin bîra mirov.
- 7- Bextewarî û aramiya nav mala mirov bi mewkî û maqamê nakeve dest: Di çîroka Walî û Cotkarî de walî bi sê jinên xwe re ne bextewar e û ji bextewariya cotkarî û jina wî didexise. Ji walî tirê ku bi şandina jinên xwe ji bo mala cotkarî, dê bextewariya cotkarî nemîne. Lêbelê cotkarî bi tehemmul û musamahayê dike ku jinên walî jê hez bikin. Asoxî jî walî li xwe mukur tê ku esil walîtî heqê cotkarî ye. Gelek mirov hene; hay ji wan ku yek bibe xwedî mewkî û maqam teqez ew di nava mala xwe de bextewar û aram e. Lebelê em bi xwe jî dibînin ku mirovên xizan jî dikarin bextewar bin.

8- Mirovê bextewar di heman demê de ji debara mala xwe re jî jêhatî ye: Di çîroka Walî û Cotkarî de qaraqterê cotkarî gelekî jêhatî ye. Ew hem cot dîke û hem ajalan xwedî dîke. Wekî ku tê zanîn ev herdû kar pir zehmet in. Yê ku ajalan xwedî dîke cotkarîtiyê nake û cotkarî jî ajalan xwedî nakin. Yên ku herdûyan bi hev re dikin hindik in. Jixwe cotkarî di çîrokê de zadê xwe li gorî berê zêde dîke û ji zadê ku çiniye li nav malê rêveçûn zehmet dibe. Bi kurtî, ji ber rêkûpêkiya kar û xebata xwe debareke baş dîke. Ev yek jî dibe sedema bextewariya wî. Pêşyan gotine ku cotkar li ber bi mal e, kebanî nû ber bi kar e.

9- Qedirzaniya li hemberî jinê: Di çîroka Walî û Cotkarî de ligel ku walî û cotkarî jinên hevdû diguherin jî, ew li hemberî jinên hevdû bêrêziyê nakin. Herçiqas Cotkarî li mikurhatinên jinên walî guhdarî kiriye jî dîsa, ji wan bê hêvî nabe. Berovajî wê, cotkarî qedrê jinên walî digire. Asoxî jinên walî ji qencyên wî razî dibin û dixwazin tobe bikin. Ev peyama ji bo serdema îro ku gelek jin ji ber sedemên ne diyar tên kuştin, pir watedar e.

Ê Qebalî û Ê Rajnî

(H.Şukriyê Barmanî)

Yekî Qebalî(Qubala, beldeyeke Mêrdînê ye) û yekî Rajnî(Rajnê, gundeke Mêrdînê ye) birakê hev î eskeriyê bûn. Birakê hev î eskeriyê bûn, îjar radibe her dû jî ji eskeriyê tên. Ê Qebalî ji Ê Rajnî re dibê “ti mêvanê min î”. Radibe Ê Qebalî wî têne, sênîk birinc û çend piçîk goşt dêtêne ser û nankî dêtêne ber û dibê “buyrin, kerem bike.” Wexta ku destê xwe tavêyê, wê yanî bixwe, bi qirpîka destê Ê Rajnî digire. Dibê “çima?” Dibê “bê(je) bismillahirrehmanirrehîm!” Ew jî dibê “bismillahirrehmanirrehîm” û tasîka xwe dixwe, sênîka xwe dixwe.

Dibê “birako! Ev hefta bê ti mêvanê min î.” Îja Ê Qebalî dere ba Ê Rajnî. Îja radibe du berxa şerjê dîke û du tennûr nan lê dixwe û e(z) ji ter bêjim, nizanîm meşîk dew çê dîke û tiştî ecayîb lo! Ê dêtêne ber. Dibê “weew ma ev giş

çiye?” Dibê “yaw tamam, te çi jê ye? Mi ji xwer çê kiriye.” Wexta îjar wê biqedime, bixwe dibê “rahêl kevçiyê xwe, bixwe.” Ku radihêyê, bi qirpika destê wî digire, dibê “bifikêne!” “Çawa bifikênim yaw?” Dibê “bifikêne!” Welle difikêne, radibe xwarina xwe... Ma ne bifikêne, hezar bifikêne xelas nabe. Dibê “kûçik, sênîk hewqesa (bi destên xwe gilovereke biçûk çê dike) te daniye ber mi, ti ji mir dibêjî “bê bismillahirrehmanirrehîm! Ez karim te û sênîyê tev de bixwim.” Dibê “welle birakiya me jî ji hev ket!”

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Divê mirov li ser sifreya xwarinê mêvanê xwe nexwe ber fediyê.
- 2- Divê mirov li hember mêvanê xwe pesnê hebûna xwe nede.
- 3- Divê mirov li ser sifreya xwarinê mêvanê xwe nexwe ber fediyê: Di çîroka Ê Qebalî û Ê Rajnî de du heval hevdu bi dorê diezimînin. Ê Qebalî, li gel ku tu mazûvaniyek baş nekiriye jî hevalê xwe li ser xwarinê dixwe ber fediyê û mecbûrî besmeleyê dike. Ê Rajnî jî dema ku wî bi awayekî ciwamêr diezimîne wî mecbûrî fikandinê dike, da ku heyfa xwe jê hilîne.
- 4- Bi rastî jî carinan di nav jiyana rasteqîn de jî em liqayî galegalên mirovan ên nêzîkî vê çîrokê dibin. Wek “filankeso/ê mazûvaniya min baş nekir, ma ew çi bû danîbû ber me, nedihat xwarin, ew hîn nizane xwarin çawa çê dibe.” Yan jî carinan mirov li ser nanê yekî/ê ye, mazûvan gotinên wek “te di heyata xwe de ev xwariye? Kes wek me nizane vê xwarinê çêke, têr bixwe” bi kar tîne û bêguman dilê mêvanê/a xwe ji xwe dihêle. Ev cure nêzîkatîyên li hemberî mêvanan bi pîvanên çanda rabûn û rûniştinê re naguncivin û ji bo mazûvan cihê şermê ne. Derbarê mazûvan û mêvanan de pêşiyên me gelek tişt gotine: “Mêvan ji mêvan aciz e; mazûvan ji herduwan”, “Mêvan, mêvanê Xwedê ye.”

2.2.4. Tekstên Çîrokên Pekênî, Binukte û Derewan

Di nav van cureyan de bi tevahî heşt çîrokên berhevkerî hene. Pêncên pêşîn aîdî çîrokên pêkenî û binukte ne. Bi dorê weha hatin rêzkirin: “Ga û Jîrik”, “Kîroşk û Halet”, “Silikê û Derwêşkê”, “Derwêşên Aşiq” û “Qasim û Parsek.” Sê çîrokên bi navê “Sê Bira û Topê Cawê Wan”, “Kose, Berkose û Safîkose” û “Dikançî û Derewa Li Ser Fîlê” jî aîdî cureya Çîrokên Derewan in.

Çawa ku Bascom di nav çar fonksiyonên folklorê de behsa fonksiyona kêfxweşkirinê kiribû; herweha li jorê, di binbeşa Cureyên Çîrokan de, Boratav û R.Pertev jî anîne ziman ku ev cure çîrok ji bo kenandin û kêfxweşkirina civatê ne. Ji ber vê jî di van çîrokan de carinan hin gotinên mustehcen jî dibe ku derbas bibin. Li vir mebesta tekane ji bilî kenandin û kêfxweşkirinê ne tiştekî din e. Ji ber vê rewşê peyamên van cureyên çîrokan nehatin nivîsandin.

Ga û Jîrik

(Fethila BAŞDAŞ)

Dibê ga çû filitî, ket hindir. Ket hindir, çû serê xwe xist den. Go “ka em çibkin?” Go “ba jîrik kin.” Ba jîrik kirin, go “em çapkin jê?” Go “ma qey wê ji wer dinyayî be? Serê wî jê kin!” Serê wî jê kirin, serî wî ket den! Go “wa îjar serî wî ket den, îjar em çawa bikin jê?” Ê go “ma wê ji wer dinyayî be? Bişkênin!” Go “te berê bigota, me yê den bişkanda û ga wê sax derketa.” Ga jî çû û den jî çû.

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Carinan şîretên mirovên ku xwe jîr dihesibînin, dibin sedema zîrarê.
- 2- Carinan şîretên mirovên ku xwe jîr dihesibînin, dibin sedema zîrarê: Di çîroka “Ga û Jîrik” de xwediyên gayê ku serê wî ketiye den bangî jîrik dikin ku xwedêgiravî dê gayê wan ji wê rewşê xelas bike. Lêbelê jîrik

tiştêkî ber bi hev nayne û bi ser de rewşê xerabtir dike. Pêşiyên gotine ku “teriya kerê têkeve heriyê, ji xwedî çêtir tune.”

Kîroşk û Halet

(Fethila BAŞDAŞ)

Evane kîroşkik girtibûn, tînin malê. Bera hewşê didin û derin li hindiro, dibên “ka em çapkin? Em çi bidin ber derî ji bo ku dernekeve derve û nereve?” Yek dibê “ma em ê çi bidin ber? Hêlet têxe devê derî û nikare derkeve!” Hêlet dixin devê derî û derin. Vedigerin, rûdinên; dinêrin ku kîroşk nexuyaye. “Law! ka ma ne me halet dabû ber? Ka di kur derketiye?” Digerin, digerin; dibê “welle heye tune ye di vê qula perikê re derketiye way!” Ew der negirtibû!

PEYAM Ê ANALÎZ

- 1- Tevdîrgirtinên hin mirovan bi kêra tu tiştî nakin û tehba wan tim beradayî diçe.
- 2- Tiştê ecêb ew e ku ev mirovên hanê li xwe hay nabin ku şaşîti ji wan de ye. Civak jî zêde li mirovên bi vî rengî nagire.

Silikê û Derwêşkê

(Fethila BAŞDAŞ)

Silikê û Derwêşkê li Şikeftê Berehê li ber pez bûn. Herkê sêsed pezê wan hebû. Îjarê ba hev dikirin. Silikê ji Derwêşkê re digo “law Derwêşkê mi zeka xwe da te, te qebûl kir?” Go “erê welle mi qebûl kir.” Wî jî digo “mi jî a xwe da te, te jî qebûl kir?” Go “e!” Go “hema herke a me li cê xwe!”

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Hin mirov bi konetî li hemberî pîvanên olî tevdigerin.
- 2- Hin mirov konetiyê li hemberî pîvanên olî jî dikin: Di çîroka “Silikê û Derwêşkê” de herdû karakter hin dewlemendên ku bi konetî xwe ji dana zekatê xelas dikin, dinimînin.

Derwêşên Aşiq

(H.Şukriyê Barmanî)

Çax ji çaxê Xwedê, vî çaxî ye.(buharê) Ne bacan hene, ne xiyar hene, ne hinar hene, ne e(z) ji ter bêjim hejîr hene, ne tirî heye... Û radibin li kerê xwe siwar dibin, her kê radihên erbanakê û dibê em derwêş in. Dibê em derwêş in, halbikî aşiq in! Û derin, derin Newala Xursê. Dibê “law hema çî bi dest me keve.

Gêzer bi dest me kevin, binerdik bi dest me kevin, şelim bi dest me kevin... Em ê hema ji xwe re têra hema şîva xwe qe em tînin.” Û derin. Derin; yek dibê “binê! Ez ê hilkişim ser xênî, ez ê li erbanê xim û ti jî dakev nav dika. Hema çîb dest te ket, biçin û têx ferda.” Ê ku li erbanê dixê, erê li erbanê dixê feqet tim xiyala wî li nav dikê ye. Ka hat, ka nehat, ka çî kir? Carkê dinêre ku mêrik di dîwêr re hildikişê, di bendê re û dikeve ser rê. Radibe di ber xwe dibê “niç niç niç niç niç” (bi her bilêvkirina “niç”ekê serê xwe çep û rast dihejîne.) Îja ev jî li erbanê dixê, dibê (destên xwe wekî ku li erbaneyê xe dixe) “şêxê mi te çîi niçeniç e, xopanê erdê hişk eee weke kuç e, (go) çawa radihêlmêê diqurmiçe.” Îja ê ku li erbanê dixê go “lo keroo ji kerano, avê bigree berd ber wano, wan rak ji rehhe û kokano, bişû bavê bîinê ferdano.”

Ê xursî go “kera di quzê ca we kirno! (Go) law, me dî heye îro di erbanê de kero ji kerano tine. Îjar te ev ji ku anî ji mer lo?” Go “lo yabo ti nizanî îşê me! (Go) hevalê mi daketiye nav dikê; me gotiye qey wê ji mer hinik binerdik, gêzer, tiştê ew ê rake em ê bînin em ê ji xwer ji zarokê xwer bivin. (Go) îjar çûye, dibê

“erd hişk e, e çawa radihêlim wan diqurmiçin, ranabin.” (Go) e jî dibê avê berra ber wan de, wê nerm bibin, wan rak ji reh û kokan.”

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Hin mirov bi derewan xwe digihînin heta derekê; lê asoxî derewên wan eşkere dibin û li wê derê nan ji wan re namîne.
- 2- Destê vala li ser zikê birçî ye; ango dema ku mirov bi keda xwe nane xwe dernexe, mirov nikare têr bibe.

Qasim û Parsek

(H.Şukriyê Barmanî)

Pîrê du lawê wê hebûn. Îja ê mezin bi jin bû, ê din jî bêkar bû. Îjar ê mezin hey dere karê xwe, şuxlê xwe. Ê din jî delaliyê ber dilê ca xwe ye û Xwedê Teala emir dike, dimire. Dimire, navê wî Qasim e. Îjar jina mêrik û ca mêrik her ro didin girî, her ro didin girî, her ro didin girî. “Yadê, yadê, filankesê! Law ji bo Xwedê, welle em nema karin. Heyata me tune, em derin ji xwer dişixulin tên dîsê em li bende giriyê we ne. Û hûn giriyê xwe terk nakin, heye kengî? Ma ev nema radibe? Çi giriyê we ye?”

Mêrik rokê dere bajêr, dere cot, dere cîkî û vedigere ku bê malê. Tê malê dinêre ku çî hoqeboq li hundirê mala wan eee. Ca wî û jina wî dibê “tiq tiq tiq tiq” dikenin. Dibê “weee ma ev îro çî bi ca min û jina min hat law?” Derî vedike, dibê “yadê, ma xêr e li we?” Dibê “hooo! Ma ti nizanî?” Dibê “na welle?” Dibê “ne îro yek ji ba Qasim hatibû?” Qasim jî miriye. Dibê “çawa ji ba Qasim hatibû kerê?” Dibê “belê wî, welle yek ji ba Qasim hatibû.” Dibê “ wî keçê ma Qasim miriye law, ihi!” Dibê “erê, ez zanim miriye. Me çawa sewal jê kir, ti ji ku tê yabo? Go welle e(z) ji tehtilê erdê(ji binê erdê) têm. Me go ez qurbana te bim

madem ti ji tehtê erdê têt, te Qasim nedî? Go belê yadê, welle e(z) ji ba Qasim têt.”

Go mêrik lê nêrî ku bûk û xesû kawik in, go “welle e(z) ji ba Qasim têt.” Ê go “ez bi qurbana te bim, qe lazimiya Qasim çi hebû yabo? Ne birçî bû, pere merekê wî hebû?” Go “welle perê wî tune bûn, lêbelê go sebra wî pir li fikî dihat.” Ê go “ez bi qurbana te bim, em ê jêr gwîz û mewîj û bastîq û benniya têtin heqîbkê. Heqîbkê tije bikin tê karibî?” Go “erê yadê ma çi dibe? Ma em hevalê hev in û em li ba hev in.”

Rabû jê re tije gwîz û mewîj û bastîq û bennî kirin û go “pere?” Go “welle perê wî jî tine bûn.” Ê go ji ter hema du sed wereqî, du sed milyonî jî jêr bive û heye carik din ti vegeerî em li vir in. Go “ker qîza kerê! Ka bi kud çû, li ku ye, çi kesik e?” Go “welle hema di vir daket, em nema zanin çû ku?” Mêrik li hespa xwe siwar bû, da ser pişta wî. Da ser pişta wî, ew jî daketiye em ê bêjin daketiye Bihêrkê(gundeke li jêra Mêrdînê) û wê here îja vegere here Xursê(gundeke Qiziltepe ye). Ket rexa alî Xursê, pişta Qiziltepe. Ê mêrik carkê lê nêrî yaboo! Yek di toz û dûmanêd maye, hesp çawa dimeşeee? Go “bi Xwedê, bi Pêxember! Heye tine, evene hatiye mi!” Rabû hema heqîb danî piş bendê û çakête xwe ji xwe kir û ettehyatû...(Li vir çîrokbêj bi awayê çarmêrkî, lê tiliya wî ya eşhedê li ser çogê, sûreta ettehyatûyê ji serî heta dawiyê xwend.) “Esselamû eleykum we rehmetsulla...”

Ê siwar li ber sekinî, go “birako!” Go “Çi ye?” Go “te nediye kes di vir re çû?” Go “belê welle yek mi dî çû.” Go “çawa bû?” Go “welle heqîbik li ser piyê wî bû û ha da vî kaşî.” Ê hema berê hespê da kêş. Go “tê çi bikî?” Go “ez ê bidim pey.” Go “Xwedê ji te razî! Go ê wî du nig in, çip çip çip(li vir tiliya eşhedê û ya navîn dike wekî du lingên ku ber bi kaş ve bi rê ve diçin.) bi nav çavê sikurê ket. Go heye her çar niga bavêje hesp, ew neha ka bê çû kê derê?”

Destê xwe jî ha weha kiriye (li vir tizbî di destê rastê de û destê xwe datîne ser çoga xwe. Milê xwe ber bi pêş ve tîne û anîşka xwe hinekî ditewîne) û werda dikişêne. Go “law ji bo Xwedê ez ê hespê xwe bavêm piyê te û ez ê herim, ez ê

bidim pey.” Go “yabo welle ez werdê xwe dikişênim û serê mi ne vala ye, ez nabim kefilê te ku ti hespa xwe bavê piyê mi.” Go “welle ez bi piyê tev girê dim law ji bo Xwedê!” Go “ê welle e(z) nabim kefil. Ti tavê piyê mi jî ti zanî, bavê piyê min.” Ew avêt piyê wî û ew bi kêş ket. Ê ku bi sikurê ket, heqîb avêt ser piştta hespê û ya Allah û ya Xwedê. Heye mêrik vegeriya ne hesp, ne lawik û ne filan û ne bêvan. Cicokî ji wê derê dîsê bi niga xur û xur û xur û xur... Ew û nivê şevê xwe gîhand malê. Go “te çawa kir?” Go “mi kîrê wî kir we! We gwîz û mewîj û bastîq û bennî xistibû heqîbê û nikaribû hilgirtana. Mi jî hesp jêr bir, mi go bera li hespê ke û bive.”

PEYAM Ê ANALÎZ

- 1- Hin mirovên kone, bi fen û fûtan, hin mirovên saf dixapînin.
- 2- Ji bo heyfihilanînê jî aqil pêwîst e; lewra carinan ê/a ku bi kerb diçe heyfê, bi ser mexdûriya xwe de bêtir mexdûr dibe.

Sê Bira û Topê Cawê Wan

(H.Şukriyê Barmanî)

Sê bira û topê cawê wan hebû. Topê cawê wan hebû, îjar dikirin nedikirin li hev nedikirin. Bavê wan mir yanî wê top li hev payê bikin. Îjar wî go “ji mi re”, wî go “ji mi re,” wî go “ji mi re.” Rabû Nesreddîn Xoce di ber wanr derket; go “xêr e law, çi xirqîra we ye?” Go “wellahî topik cawê bavê me heye û em dikin nakin em nikarin li hev payê bikin.” Go “law, aniha ez ê tiştê ji we re bêjim. Ez ê ji we re bibim hakim, go “kî virik mezin bike topê caw jê re ye.” Ê go “baş e.”

Rabû ba birê mezin kirin, go “ka bibêje, ka bê tê çi bibêjî?” Go “welle mi kundirik çand nav çavê Kela Mêrdînê, go şaxê wê xwe berra Bihêrkê dan. Go şaxê wî xwe berra Bihêrkê dan. Go, yeqîna te ji Xwedê bê, heger ku kundirê min bi ser Mêrdînê bigeriyana wê tamam xera bikirana.”

Go “ti xwe bid ser alîkî.” Xwe da ser alîkî, ba ê navîn kirin. Go “ka ti bibêje law.” Go “ez ê çi bibêjim?” Go “wellahî ê mi jî zemanîkî ku bavê me mir, mi rabû qazanik çêkir.” Beroş, beroş. Go “mi qazanik çêkir; çel heddadî bi hev re lê dixist, dengê yekî nedîçû yekî.” Go “weyla mala te xera bibe, tê çi têd bikelînî law?” Go “kundirê birê min.” Go “ti jî xwe bid ser alîkî.”

Ma ê biçûk. Go “ka ê te çi ye yabo?” Go “welle ê mi jî rehma Xwedê li miriyê hazira be; go bavê mi çû rehmetê û go barik garisê min î zer hebû.” Garisê zer jî eyn wek dendikê hejîra bûn; eyn wek dendikê hejîra ha, wilo hûr bû. Go “mi pênc olçek garis mi li pişta dîkê xwe kir û berî da Diyarbekir. Ê go “pênc olçek û li pişta dîkê?” Go “e çûm ber şetê Diyarbekir; go dîkê mi nikare li avê xe, li şet xe.

Go rabû mi barê wî danî û hahaka mi devê çewalê xwe vekir û go mi xist kufkanîka. Neqlê hebo hebo mi avêt wî alî û go derhal hema e çûm; li wê derê mi bi hev kir, mi xist çewalê xwe, mi devê çewalê xwe dirût û go mi dîkê xwe anî ku ez barê xwe bar kim. Go mi lê nêrî bi qase qurûşkî pişta dîkê mi kul bûye. Gidiyano! Eman zeman pişta dîkê mi kul bûye. Dermanê wî çiyê çî îlac e? Ez ê jê re bênim, çawa bikim çilo bikim?” Go yekî go “kuro bise, ez ê ji te re bêjim.” Go “çi ye?” Go “gwîza Hindê, dermanê pişta dîkê te gwîza Hindê ye.” Go “e sekinîm, sekinîm yaw ka ez ê gwîza Hindê li ber vî şetê Diyarbekrê ji ku bênim? Go hah, go hat bîra min. Go rehme li miriyê hazira, go pazde sal berî, go diya mi gwîzik Hindê anî, go li me her sê bira payê kiribû. Go bi îrada Xwedê mi çawa tiliya xwe xist devê xwe go mi ji ber diranê xwe hema bi qase hevîrtirşkê, go mi ji ber diranê xwe derxist û go mi li pişta dîkê xwe kir û go mi barê xwe bar kir û go e çûm.” Mêrik go “biçirê law biçirê; Xwedê mala te xera bike go caw cawê te meqes jî a cîrana, biçirêne. Go caw ma ji te re.”

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Carinan hin mirov bi derewan tiştêkî bi dest dixin.
- 2- Hin mirov nanê wan li ser çonga wan in; ango bi derew û xapandinê dixwazin ku bi serkevin.

Kose, Berkose û Safkose

(H.Şukriyê Barmanî)

Hebû Kose, Berkose û Safkose. Her sê jî birê hev bûn. Îjar diznî meşhur jî bûn. Di bajêr de xeynî wan dizî nedikirin. Her ro dizî dikirin; wê bihatana ba hakim, wê hakim bigotana “law bes vê diziyê bikin kuro. Ez vê neqlê we berra didim, neqlik din nema we berra didim. Ez ê we ceza bikim.” Kirin nekirin, terka diziya xwe nekirin. Rabû îja rokê dizî kirin, hakim gelekî ji wan qeherî. Rabû hakim bêyî wan tasik mehîr anî xist bin masê, ba wan kir; go “binere, ez ê siwalê ji we bikim. Hege hûn tê derxin ez ê we berdim, hûn tê dernexin welle ez ê we ceza bikim. Ê go “baş e.” Rabû her sê anîn û bêyî wan jî mehîr xistiye bin masê. Ba Kose kirin, go “Kose! Çi di bin masê de ye?” Go “hakim beg! Ti ilmê mi tune, e(z) ne xwenede me.” Go “bi mîrku hatiyê kutan.” (Hakim) Go “ti xwe bid ser alîkî.” Ew dan ser alîkî, ba Berkose kirin. Go “Berkose! Çi di bin masê de ye?” Go “hakim beg!” Go “ha.” Go “emrê mi tune û ez ne xwenede me û ma e çi zanim te xistiye bin masê?” Go “e zanim bi mîrku hatiyê kutan û bi heskê hatiyê tevdan.” Go “ti jî xwe bid ser alîkî law, ti jî.” Xwe da ser alîkî, ba Safkose kirin. Go “Safkose!” Go “çi ye?” Go “çi di bin masê de ye?” Go “hakim beg! E ne alim im, xeyb im û xweneda mi jî tune ye.” Go “tiştê ku e zanim; (go) bi mîrku hatiyê kutan, bi heskê hatiyê tevdan, (go) mehîr di bin masê de ye.” Go “Xwedê mala we xera bike; her law her, mi hûn berat kirin, her.”

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Mirov bi saya zîrekiyê dikare ji rewşên xetere rizgar bibe.
- 2- Mirov her car bi fen û fûtan nikare bi serkeve.

Dikançî û Derewa Li Ser Fîlê

(H.Şukriyê Barmanî)

Dibê yekî dikançî seqet bûye û li Babsorê rûdinişt. Li Babsorê rûdinişt, dibê lê nêrî millet dere tê, go “çi xêr e?” Dibê yekî go “welle dibê fil hatiye Deriyê Meşkîna, li sahê dilîze.” Û lê nêrî millet kişiya û kişiya û kişiya û kişiya. Dibê ê seqet di dikanê de ye. Dibê li dora xwe nêrî, li sûkê nêrî ku tu însanê Xwedê nemaye. Ê yekî ku li dawîya wî maye hat. Dikançî go “yabo, ma tê herî ku?” Go “welle ez ê herim sahê” Dikançî go “xêr e?” Go “welle dibê du fil hatine, li sahê dilîzin; ez ê herim wan bibênim.” Ê ku ewil gotiye wî gotiye yek, evîne gotiye dido. Dikançî go “bi Qur’an ku dido bin, dêmek rast e.” Û millet çû heye Deriyê Meşkîna û yek li bin guhê yekî diqelibe û rê û rêwanî tune ji millet, ji qebralixiyê, ji filan, ji bêvan. Dikançî dibê “Kuro çi mesele ye, ka fil, ka fil?” Go “yabo wellahî yekî hatiye gotiye fil hatiye û em jî hatine. Go dikançî go “ê kuro law, yekî din gotibû dido hatine.” Îjar li hev xerbilî û derew derket.

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Carinan derew dibe wek rastiye û mirov jî jê bawer dikan.
- 2- Carinan derew dibe wek rastiye û mirov jî jê bawer dikan: Di çîroka “Dikançî û Derewa Li Ser Fîlê” de yek derewekê dike ku xwedêgiravî filek hatiye sahê. Yekî din jî filek din lê zêde kiriye û hejmara filan kiriye dido. Dikançiyê saf jî bi vê “agahiya” dawî tam yeqîn dike û ew jî wekî girseyê dikeve pey filan. Bûyerên bi rengî di nav civakê de car bi car diqewimin.

2.2.5. Tekstên Çîrokên Zîncîreyî

Di vê cureyê de jî sê çîrok hene: “Kêç û Mêrû”, “Pîrê û Dîk” û “Hecî Gur.”

Kêç û Mêrû

(Fethila BAŞDAŞ)

Kêç û mêrû birakê hev bûn, bi hev re diman. Îjarê rojikê xaniyê wan qey dilop dike; kêç dibê “law ez ê xanî bigerênim.”, mêrû dibê “ez ê bigerênim”, kêç dibê “ez ê bigerênim.” Axir mêrû dibê “ez ê bigerênim.” Mêrû dere ku xanî bigerêne, telqîkê lê dixê, dikeve bin gendor. Kêç derdikeve, dinêre ku waye mêrû ketiye bin gendor, miriye.

Kêç, keziyê xwe kur dike; mişk tê hindiro dibê “xêr e kêça kezîkur?” Kêç dibê “kêç kezîkur, welle xeber hat dibê mêrûka me mir.” Mişk jî dûvê xwe qut dike. Mişk dûvê xwe qut dike, siwar di wê re derbas dibe. Siwar dibê “xêr e mişkê dûvqut?” Dibê “welle mişk dûvqut û kêç kezîkur û xeber hat dibê mêrûka me mir.”

Dibê siwar jî şaşîka xwe şaş dike, şaş dide serê xwe ka çilo dike; di bin dara gwîzê dere. Dara gwîzê dibê “xêr e siwarê şaşên?” Dibê “welle siwar şaşên û mişk dûvqut û kêç kezîkur û xeber hat dibê mêrûka me mir.” Gwîz jî pelê xwe diweşêne, gişî bera biniya xwe dide. Av tê di bin darê re; av tê dibê “xêr e gwîz pelweşên?”

Dibê “welle gwîz pelweşên û siwar şaşên û mişk dûvqut û kêç kezîkur û xeber hat dibê mêrûka me mir.” Av jî şêlû dibe; av jî şêlû dibe, dere ser garis. Dere ser garis, garis dibê “xêr e ava şêlû?” Av dibê “av şêlû û gwîz pelweşên û siwar şaşên û mişk dûvqut û kêç kezîkur û xeber hat mêrûka me mir.” Dibê garis jî dernexûm dibe, yanî korî lê dixê; korî lê dixê. Xwediyê gêris tê avdanê; tê avdanê dibê “xêr e garisê dernexûm?” Dibê “welle garis dernexûm û av şêlû û

gwîz pelweşên û siwar şaşên û mişk dûvqut û kêç kezîkur û xeber hat mêrûka me mir.”

Dibê mêrik jî bi bêrê ka hela xwe çawa dike, çîk dike; yanî wek hayê xwe li qazix xe. Qîza wî tê, dibê “xêr e bavê min î bêrliqûn?” Dibê “ bavê te yî bêrliqûn û garis dernexûm û av şêlû û gwîz pelweşên û siwar şaşên û mişk dûvqut û kêç kezîkur û xeber hat mêrûka me mir.” Qîza wî jî qey tasik mast jêr anîbû, hema tasa mastê xwe bi serê xwe dadike û berê xwe dide malê. Berê xwe dide malê; diya wê dibê “xêr e qîza serbimast?”

Dibê “welle qîz serbimast û bavê min î bêrliqûn û garis dernexûm û av şêlû û gwîz pelweşên û siwar şaşên û mişk dûvqut û kêç kezîkur û xeber hat mêrûka me mir.” Dibê wê jî nan lêdixist li ber sêlê, dibê hema ji ber sêlê rabû û li ser sêlê rûnişt, qûn şewitand. Qûn şewitand; cîrana wan hat, dibê “xêr e cîrana qûnşewitî?” Dibê “welle keça min î serbimast û mêrê min î bêrliqûn û garis dernexûm û av şêlû û gwîz pelweşên û siwar şaşên û mişk dûvqut û kêç kezîkur û xeber hat mêrûka me mir.” Ew jî nizam ka cêr mêrê xwe dişkêne, xwarina xwe dirijêne, yanî tişkî dike û li vir son. (çîrokbêj dibeşîşe)

PEYAM Û ANALÎZ

- 1- Xeberên bêyom, dibin sedemên bûyerên neyînî yên zîncîreyî.
- 2- Xeberên bêyom, dibin sedemên bûyerên neyînî yên zîncîreyî: Di çîroka “Kêç û Mêrû”yê de mirina mêrûyê bandoreke neyînî li hevala wê kêçê dike. Kêç jî dema ku vê xebera bêyom dide mişk, mişk jî bandora neyînî jê digire. Ev xeberdayîn weha bi dorê û bi bandorkirinên neyînî didome.

Pîrê û Dîk⁹⁷

(H.Şukriyê Barmanî)

Pîrê ixtiyar bû; kesî wê tune bû, di malika xwe de bi tenê bû. Lihêfa wê, doşeka wê tim danînê bû û ji xwe re nan û avê xwe dixwar û di hindirê xwe de bû. Dibê pîrê mala xwe paqij dikir, dibê dîk hat hindirê malê. Hat hindirê malê, dibê pîrê şûnikik lê xist. Şûnikik lê xist, dibê dîk tirik kir. Dibê dîk tirik kir, îjarê dibê: “Xuristan muristan, bênim eskerkî giran, ser pîra du diran.”

Dibê îja dîk çû şikayetê ba tûpişkê kir; tûpişk anî xist nav ciya. Dibê çû ba pisîkê, pisîk çû di tifikê de rî. Dibê çû ba mar, mar çû xwe li sitûnê hebiland. Dibê ji dîk re jî gotin “tu jî here jor, nav çavê xênî.” Dibê rokê pîrê hat çû hundirê xwe, wê sar bû go “ez ê agir bikim.” Çû ku agir bike; yanî xweliyê ji hundirê tifikê derxe, destê wê ket gûyê pisîkê. Destê pîrê ket gûyê pisîkê; pisîk li dora xwe nêrî, pîrê li dora xwe nêrî û çû destê xwe bi stûnê paqij kir. Bi stûnê paqij kir, mar pê veda. Mar pê veda, çû nav cê xwe. Çû nav cê xwe, tûpişkê pê veda û go “haho.” Derket ku wê here derve; dîk ji berê de elimandî ye, dîk li nav çavê xanî ye. Ê pîrê derket derve, gendor îjar bi ser re berradan. Pîrê kuştin.

PEYAM Ê ANALÎZ

- 1-** Divê mirov gavên xwe bi pîvan bavêje. Berî ku mirov kiryarekê bike; divê mirov encamên muhtemel hesab bike. Pîrê bêyî ku dê çi were serê wê, şûnik li dîk dixê; lêbelê dîk heyfek giran ji Pîrê hiltîne.
- 2-** Aqlê sivik barê giran e.

⁹⁷ Du varyantên wê hene. Ya yekem bi navê, “Dîkil Axa” ye. Bnr. Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, rûpel, Stenbol, 2014, r. 254; ya duyem bi navê, “Dîk û Pîrê” ye. Bnr. Hilmi Akyol, *Kew û Kew*, Do, Stenbol, 2010, r. 27

Hecî Gur⁹⁸

(Hisênê Bilalî)

Dibê carkê gurik hat û çû şikeftikê û bala xwe dayê. Go “çi şikeftik xweşik, çi şikeftik wilo delal. Go “ez ê vê şikeftê ji xwe re bikim mala Xwedê û ez ê him ziyaretî bikim û ez ê him derkevim meydanê, ez ê binerim bê mesele çi yi?” Dibê gur ji wir de dihat, rêvî pêrgî wî bû. Go “esselamûleykim birê gur!” Go “wey devê te bişkê, ma bivê birakê hecî gur!” Go “birakê hecî gur tu gellekî bi xêr hat. Tu kengî çû hecê? Welle min nebihîstibû, çavê min birjê, devê min bişkê. Min tişkî wilo nebihîstibû, va te ez pê hesandim malava!”

Go “erê welle e(z) çûm hecê malava! Te nebihîstiye qey?” Go “baş i.” Go “tu min bi xwer naki heval?” Go “belê tu jî bi hevalê mib.” Dibê hebbikî bi wê de çûn, bala xwe danê. Dibê keroşkik jî hat. “Waaa birakê gur!” Go “tu bi xêr hat, serçavar hat. Tu çawa yi, tu çilo yi?” Go “waaa! Hey devê te bişkê, wey çavê te birjê. Malavao hema bê hecî gur!” Ê go “birakê hecî gur!” Go “min nebihîstibû, li qisûra min nenerin. Welleh e(z) rica dikim.” Go “qey ne li vî welatî bûm bavo! Welle qey tu ji zû di çûyi hecê?”

Go “bawer biki, hema ev qederê mehik dudo...” Go “dêmekî tu naka çûyi hecê.” Dibê “hûn mi jî bi xwer nakin heval?” Dibê “belê wer, tu jî bi mer bib heval.” Dibê “baş i.” Dibê derketin, bûn sê heb. Bala xwe danê, dibê nerî ku kerik jî wayi ji wêd tê. “Selamûleykim birakê gur!” “Wey” go “devê te bişkê, mala te li mîratê geriyayo! Ma tu li vî welatî gişî negeriya? Bê birakê hecî gur law!” Go “birakê gur tu bi xêr hat, serçavar hat. Tu kengî çû hecê, min nebihîst? Qey ez jî ne li vî welatî bûm.”

Dibê man hebbikî, go “hûn mib xwer nakin heval?” Go “belê em ê te bikin heval.” Dibê hebbikî wê de çûn, dibê nerî dîkik. Dîkik ji wê de tê, çawa tu li

⁹⁸ Du varyantên wê hene. Ya yekem bi navê, “Hecî Gur”e. Bnr. Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, rûpel, Stenbol, 2014, r. 287; ya duyem bi navê, “Rovî, Gur, Hirç, Şêr, Kîvroşk”e. Bnr. li Mahmut Barîk, *Ax Piştî Min*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2003, r. 79

baskê wî dinerî sor hinnekirî û kumka wî wilo dirêj bûyi. Şefqa wî xwar bûyi. Bûyi wek a Hisênê Bilalî.(herkes dikene) E û bi serê te forsê wî û qilixê wî... Go “hooo birakê gur, go tub xêr hat, silamet hat. Go tê bi kud heri, bi kud bê?”

Go “weyla ku devê te bişkê, çîmên te bişkê înceleh! Maşewitî, ma qey te nebihîst?” Go “birakê hecî gur! Law min nebihîstibû, li qisûra min nener.” Go “de baş i.” Go “hûn min jî nakin bi heval?” Go “belê.” Go “de ka em ê li cîkî bi mêvan bin.” Berê xwe dan şikeftê û rûniştin. Ji xwer êvarê man, gur go “birao! Em birçî bûn, em ê îca çapkin?” Ê go “heyra ka em ê nava bêjin. Navê kê nexweş bi em ê wî bixwin.” Go “baş i.”

Go keroşkê go “ez keroşk im, berberojk im.” Ê go “welle berberojk ne tiştik i, hema tu ka wê bînin em bixwin.” Dibê birakê xwe yî keroşkê xwarin, ew xelas kirin. Bû a din î şevê, go “birako dîsê em ê navkî li hev bikin, go navê kî nexweş bi, go em ê wî bixwin.” Ê go “baş i.” Go gur go “ez gur im, diran bivir im.” Go kerê go “ez nizanim çi, pêlewan im.” O(Û) dîk go “ez dîk im, qîqîk im, ez li ser xaniyan azan didim.” Ê go “baş i.” Ma rêvî. Rêvî go “ez rêvî mi, çek sipî mi, li serê civatê rûniştî mi, Xwedê zane ez xwediyê cinneta baqî mi.” Way way way way way, feqîro ma li wê de. Go “em ê dîk bixwin.”

Dîk go “law ez ê azankê bixwînim, bera ev azan li mi neri law. Limêja sibê li mi neri.” Dibê hema derket ser guhê wê tehta bilind û dibê firik li serê tehta Mêrdînê li xwe xist, li Bihêrkê xwe danî. Dibê wî xwe ji destê wan xelas kir. Ma şeva sisiya. Ê go “bi Xwedê em ê kerê bixwin.” Go “ker diran bivir i em ê bixwin.”(li jorê ji bo gur “diran bivir” hatibû gotin!) Ker xwarin. Rêvî jî bi fen i. Behra xwe hiltîni o(û) dixi qul mula. Ê gur dixwi. Man herdû. Gur û rêvî man.

Rêvî go “birako!” Go “hê!” Go “law di bextê te di, di şerefa te di law. Go em çilo bikin law?” Ê go “ka em ê parêz bikin bi bextê temam law. Em ê her yek tiştê xwe bixwin.” Go “kirt kirt.” Go “te çi kir?” Go “welle mi çevkî(çavekî) xwe xwar.” Ê duduwa go “welle mi çevê xwe yî di jî xwar.” Gur jî çevê xwe dixwi, fen i. Ma, go “wekî di te çi kir?” Go “bawer biki mi nigkî xwe jî xwar.” Go “wekî

di?” Go “ez bûmi wek gundorikî.” Bala xwe dayê, go “birakê gur tu çawa bû?” Go “bawerki gundor ji mi çêtir i.”

Rêvî çû li dora wî zîvirî. Go “birako tu diki çibki?” Go “welle ez dikim goştê te bixwim.” Go “fena te ev bû? Biratiya min û te ev bû?” Go “ma tu nizani dinya bi fena hatiya avakirin?” Dinya bi fena hatiya avakirin! Esselamû eleykum, eviya xelas bû.

PEYAM Û ANALÎZ

1- Serkeftin ne bi qeweta zêde û xurtiyê ye; lê bi aqil tê bidestxistin. Ji gur tirê ku dê zora herkesî bibe; lê gur li hemberî konetiya rovî têk diçe.

2- Bi darê zorê mirov dikare ji bo demekê hukum bike; lê ew hukum heta dawiyê berdewam nake. Hukmê gur jî heta ku liqayî konetiya rovî hat, qediya.

BEŞA 3: NIRXANDINA ANALÎZKIRINA PEYAMAN

Di civakeke ku xwendin û nivîsandin lê kêr be rola “gotin”ê ya li ser wê civakê bi awayeke xwezayî bi nirxtir e. Di demên berê de di nav civaka Kurdan de hema hema di her odayên gundan de, di dîwanên beg û axeyan de û di şevbuhêrkên Kurdên ku li gelek bajaran belav bûne de nirxê “gotin”ê di çîrok, stran û cureyên din ên vegotinên devkî de xwe dida der.

Bêguman ev derbirîna nirxê “gotin”ê ne wekî berê xwedî rol be jî, mirov nikare rola wê yekcar tune bihesibîne. Lewra îro hem di mekanên modern, kargeh û wesayîtan de hem jî di civat, sohbet û şevbuhêrkan de car bi car çîrok tîne vegotin. Ev jî di nav keftûleft û xirecira jiyânê de dibe rîtuêlek folklorîk a ku moral û motîvasyonê pêk tîne. Li vir em ê hewl bidin ku peyamên çîrokên ji bo vê xebatê hatin berhevkerin, ka ji kîjan aliyan ve bandor li ser civakê hiştine, derxin xolê.

Di nav 25 heb çîrokên vê xebatê de, yê ku di bin sernavên Çîrokên Ajalan, Çîrokên Neasayî û Çîrokên Rasteqîn de hatin deşîfrekerin de, peyam hatin tomarkerin. Ji bo ku dubarekerin çênebe peyamên nêzî hev di bin sernavan de wek xalekê hatin nîşandan. Naverokên peyaman, li gorî peyama ku herî zêde tê dayîn, di bin 4 beşan de hatin dabeşkerin. Ew bi dorê weha ne: Peyamên Civakî, Peyamên Psîkolojîk, Peyamên Aborî û Peyamên Etîk. Di dabeşkirina peyaman a bi vê şêwazê, di asta sernavên beşan de, ji navlêkirina Muhsine H. Yavuz⁹⁹ sûd hat wergirtin.

⁹⁹ Ji agahiyên berfirehtir bnr. Muhsine H.Yavuz, *Masallar ve Eğitimsel İşlevleri*, Cumhuriyet Kitapları, İstanbul, 2009, r. 49-71.

Divê bê gotin ku di encama eşkerekirina peyamên çîrokên vê xebatê de hat dîtî ku di navbera hin peyamên çîrokên Yavuz û yê nê xebatê de hinekî şibandin heye. Peyama Yavuz a “Di Peyamên Hevpar Ên Ku Herî Zêde Hatine Dayîn” de ku dibêje “Qenc qenciye dibînin, xerab xerabiyê; kesê mafdar rojekê teqez dê mafê xwe bistîne.” û di çîroka vê xebatê ya bi navê Gur û Rêvî de peyama “Dawiya xerabiyê tune, herkes li gorî emelê xwe ye” mînakên vê şibandîne ne. Yavuz li ser hevpariya peyaman dibêje ku “bêguman ev yek ne tesaduf e û civakên ku van çîrokan diafirînin bendewariya xwe ya herî mezin, hêviyê û nêzîkatiya xwe ya li hemberî jiyane di wan de dibînin.”¹⁰⁰ Herweha, ji Bascom jî neqlî me dike ku “gerdûnîbûna di çîrokan de ji hevbeşiyên wek genetîka biyolojîk, pozîsyona xwezayî-çandî û aliyên civakî-çandî ya jiyana mirovan tê.”¹⁰¹

Di analîza peyaman de, carinan hin gotinên pêşyan ên bi mijarê ve têkildar ji hatin bikaranîn. Li vir mebest ne watedayîna gotinên pêşyan; lêbelê dupatkirin û zexmkirina peyamê bixwe ye.

3.1. PEYAMÊN CIVAKÎ

C.Celîl li ser rola zargotinê ya pir alî vê agahiyê parve dike: “Mezin e rola zargotinê, bona lênihêrandin û lêkolandina rabûn û rûniştina gelê Kurd, halê wî yê sosyal-aborîyê, pêwendîya sinifîyê, ji bona tarîxzanîyê û zimanzanîyê.”¹⁰²

Di nav tibabek şîrove û analîzên heyî yê derbarê peyamên civakî yê çîrokan de gotara Mustafa Şahin cihekî berfireh ji bo vê mijarê veqetandîye: “Peyamên çîrokan herî zêde li ser têkiliyên mirovan (hevaltî, dostanî, dilnizmî û alîkarî) ango derbarê geşedana psîko-sosyalê ne. Duyem li ser malbatê û sêyem li ser peyamên zîhnî û psîkolojiyên wek “jîrî, tolerans û baldarî”yê ne. Zarok bi saya wan

¹⁰⁰ Muhsine H.Yavuz, h.b., r. 65.

¹⁰¹ H.b., r. 43.

¹⁰² C.Celîl-O.Celîl, h.b., r. 9.

tîp û qaraqterên mirovan, hunerên ziman, bixwehesîn, ramana afirîneriyê nas dikin û problemên xwe çareser dikin.”¹⁰³

Girîngiya vê gotarê ew e ku di vê mijarê de encamên lêkolîna qadî daye. Di gotarê de tespîten 14 mamosteyên pêşdibistanê hene. Ev tespît, bandorên çîrokan ên li ser zarokên di temenê pêşdibistanê de dihewînin. Madem ku zarokên îro endam û kesayetiyên civakê ne û civak jî di pêşerojê de dê bi tevger û ramanên wan teşe bigire, divê em bandorên li ser zarokan dupat bikin.

Di gotarê de mamoste diyar kirine ku bandorên çîrokan ên li ser zarokan; geşedanên wek ziman, hestiyarî, psîko-sosyal û zîhnî ne. Ev geşedan bi rêzê weha ne: Geşedana hêza xeyalan (7)¹⁰⁴, ya ziman (7), ya afirîneriyê (5), ya derbirîne (4), ya taybetmendiyên lîderiyê (4), ya hestên berpirsiyariyê (4), ya kesayetiya yarmetîxwaziyê (4), ya bixwebaweriyê (4), ya têkiliyên hevaltiyê (3).¹⁰⁵ Di encama gotarê de tê eşkerekirin ku çîrok zarokan di pêvajoya civakîbûnê de di navbera “xwe” û “ê/a din” de alîkariyeke girîng dike da ku bandoreke baş li hevdû bikin.¹⁰⁶

3.2. PEYAMÊN PSÎKOLOJÎK

Mirovên civakên pêşketî, ji mirovên xwedî psîkolojiyên bijûndar pêk tên. Mirovan, ji bo pêkanîna psîkolojiyeke bijûndar gelek rêbazên livbaziyan ceribandine. Huner, spor, wêje, gerûgeşt, folklor û hwd. hin ji wan livbaziyan in. Lêbelê nayê wê wateyê ku her mirov bi van hemûyan teqez dê kêfxweş bibe. Jixwe kêfxweşî, têgeheke relatîv e û nayê nîqaşkirin. Madem ku çîrok jî wek hêmaneke girîng a folklorê ye û di prosesa kêfxweşkirinê de jî xwedî fonksiyoneke tayînkirî ye; naxwe

¹⁰³ Mustafa Şahin, “Masalların Çocuk Gelişimine Etkilerinin Öğretmen Görüşleri Açısından İncelenmesi”, *Milli Folklor*, hj. 89, r. 209.

¹⁰⁴ Di kevanan de hejmarên mamosteyên ku geşedan raçav kirine, hatine nîşandan.

¹⁰⁵ Mustafa Şahin h.b. r. 215

¹⁰⁶ Mustafa Şahin h.b. r. 219.

kêfxweşkirin, psîkolojiya mirovan baş dike. Asoxî, analîzkirina peyamên çîrokan ji bo vê xebatê dibe zarûretek.

Hülya Çevirme, di gotara xwe de ji Gustav Hans Graberê derûnnas neqil dike ku her çîrokek anekdoteke pêvajoya rehetkirinê ye ya ku her dem psîkolojiya kûrahiyê ji xwe re wek bingeş girtiye. Di encama gotarê de fikra Freud jî raberî me dike: Analîzên çîrokan ew e ku derbirîna wan kes û komên ku daxwazên wan hatine binpêkirin.¹⁰⁷ Bêguman derbirîna bi awayekî ji awayan a hest û ramanên mirovan, dibe sedema rehetiyê psîkolojîk. Dixuye ku hin mirov hewl dane, daku bi saya çîrokan xwe ji bandorên neyînî yê binpêkirinê daxwazên xwe hinekî rizgar bikin.

Li gorî mînakê xwecihên Ashantiyan a ku Bascom daye, dema ku li hemberî hêz û otorîteyê hin vegotinê gel tîn bikaranîn psîkolojiya mirov rehet dibe. Dîsa Bascom ji M.E.Opler neqil dike ku di nav Apaçiyên Jicarella de yekî ku tevgerên nelirê û sûcekî bike, jê re du gotinan dibêjin: Ma dêûbavên te tunebûn ku ji te re çîrokan vebêjin?¹⁰⁸ Ku mirov pênaseya Freud û vê mînakê berawird bike; gelo mirov dikare bibêje ku sûcdar û xwedî kiryarên nelirê yê di nava Apaçiyên de hest û ramanên xwe bi çîrokan dernebirîbin? Dibe ku heta astekê bersiva vê pirsê, erê be.

Yavuz jî angaş dike ku dema mirov bide pey şopa çîrokan, mirov di encamê de dê bibîne ku gelek bûyerên civakî, bi rûdanên jiyana rasteqîn û bi bendewariyên mirovan ve diguncivin. Ev yek jî mirovan digîhîne ber bi psîkolojiyek baş ve. Asoxî divê ev yek neyê jibîrkirin, diyardeya ku Psîkolog Martin Seligman wê bi têgeha “neçariya hînbûyî” ve (learned helplessness) û weke sedema bingeşîn a depresyon, têkçûn, bêçarefî û bêmeqsediyê bi nav kiriye; bi saya çîrokan vediguhere têgeha ku dîsa Seligman ew pênase kiriye ango “xweşbîniya hînbûyî (*learned optimism*)”¹⁰⁹

¹⁰⁷ Hülya Çevirme, “Masal ve Efsanelerde Halk Eğitimi”, *İnönü Üniversitesi Eğitim Fakültesi Dergisi*, 2004, <http://www.pegem.net/akademi/3-8211-Masal-ve-Efsanelerde-Halk-Egitimi.aspx>, (22/07/2017)

¹⁰⁸ Bascom, h.b., r. 81

¹⁰⁹ Yavuz, h.b., r. 17

Mijareke din a ku li ser naveroka çîrokan disekine jî, mijara di çîrokan de hebûna ragihandina nixamtî ye. Di vê biwarê de Yavuz ji Üstün Dökmen neqil dike ku ev nixamtîbûn herhal ji ber pêdiviyên mirovan in. Lewra li cihên ku mirov nikaribin ramanên xwe yê şexsî der bikin ango li cihên ku kamilbûn/kesayetîbûn tên qedexekirin, mirov jî berê xwe didin ragihandina nixamtî. Ên ku eşkere nikaribin aqilên xwe bixebitînin, aqilên xwe ji bo vê pirsê dixebitînin: “dê çi, bi çi awayî li guh mirov xin?”¹¹⁰ Bi rastî jî hîn gelek referansên li ser têkiliya çîrok û psîkolojiyê hebûn; lêbelê em ê li vir qîma xwe bi yê li jorê hatin dayîn, bînin.

3.3. PEYAMÊN ABORÎ

Aborî, di jiyana mirovan de ciheke wê ya girîng heye. Ji demên gelekî kevin de mirovan serê xwe pê êşandine û hîn jî diêşînin. Lewra ji bo berdeamiya jiyane mirov hewcedarê kar û xebatê ye. Di civatên Kurdan de jî mijara aboriyê gelek caran dibe sedema nîqaş û gotûbêjan. Bêguman çîrokên me jî nesîbên xwe ji vê yekê girtine û geh bi şîretan geh bi peyaman mirovan hişyar dîkin.

3.4. PEYAMÊN ETÎK

Etîk, di hin çavkaniyan de wek exlaq, zanîna exlaqê, exlaqiyat, felsefeya exlaqê û zanista gerdîşê tê pênasekirin.¹¹¹ Têgeha etîkê, wek etîmolojîk ji bêjeyên Yûnanî *ethikos* û *ethos* û *ethica* ya Latînî ve pêk hatiye. Mirov dikare wê weha pênase bike: “Etîk, yek ji wan teoriyên herî kevn e ku li ser bingeha felsefî “exlaq”ê vedikole. Li ser mijara nîrxên moralê yê ku “baş” û “xerab”ê ji hev derdixin,

¹¹⁰ H.b., r. 18

¹¹¹ Bnr. D.Mehmet Doğan, *Büyük Türkçe Sözlük*, Vadi Yay, Ankara, 2003, r. 403; Ali Püsküllüoğlu, *Arkadaş Türkçe Sözlük*, Arkadaş Yay, Ankara, 1994, r. 374.

disekine.”¹¹² Di nava hemû milletan de, li gorî nirxên wî yê maddî û manewî, pîvanên etîkê hene. Sîstemên perwerdeyê van pîvanan bi gelek rêbazên hînîkirinê, bi zarokan didin hînîkirin. Herweha bi riya saziyên sîvîl jî ji bo hemû çînan wê civakê bername tên amadekirin. Di belavkirin û nasandina pîvanan de bi giştî folklor û bi taybetî jî çîrok navgîneke hêja ye ya ku baş tê bikaranîn. Wekî ku di beşa 1ê de me ji pênuşa Bascom, fikra O.P.Raum anibû ziman, “zexelî dijberî û berdûşiyê li ber çavên zarokan reş bikin; çîrokên ku peyamên exlaqî(etîk) didin, ji wan re tên vegotin.”¹¹³

Bêguman bikaranîna pîvanên etîka wî milletî ya di nava çîrokê de mirovan aciz nake. Li ser vê mijarê Ch.Charrier û R.Ozouf dibêjin ku danjiberkirina metnên neqandî bêguman alîkariyeke baş a bi etîkê ye. Derseke ku ji vê metnê derkeve bi riya çîrokekê an jî pêkenokekê were dayîn, dê ewqasî bêtir were famkirin û bi xweşî were guhdarîkirin. Wekî ku nivîskarekî fablê gotiye:

Derseke etîkê ya bi gotinên rijî

Dê canê mirov aciz bike,

Lêbelê bedewbûna çîrokê

Rijîbûnê nahêle.¹¹⁴

Me peyamên çîrokên vê binbeşê di çarçoveya teoriya John Stuart Mill de analîz kirin. Feldman dibêje ku Mill, Teoriya Havilperestiyê (utilitarianism) di berhema xwe ya bi navê *Utilitarianism* de weha formule dike: “Kiryar, qasê ku bibin wesîleya bextewariyê rast in û qasê ku li dijî bextewariyê bin jî çewt in. Bi

¹¹² Nuri Bilgin, *Sosyal Psikoloji Sözlüğü*, Bağlam Yayıncılık, İstanbul, 2007, r. 113; Fred Feldman, *Etik Nedir?*, (wer. Ferit B. Aydar), Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, İstanbul, 2012, r. 11; İvan Frolov, *Felsefe Sözlüğü*, (wer. Aziz Çalışlar), cem yayınevi, İstanbul, 1997, r. 153.

¹¹³ Bascom, W.R. h.b., r.80.

¹¹⁴ Ch. Charrier-R.Ozouf, h.b., 210

bilêvkirina “bextewarî”yê mebesta me xweşî û tunebûna êşê ye; bi bilêvkirina “nebextewarî”yê jî mebesta me êş û mehrûmiya ji xweşiyê ye.”¹¹⁵

Doğan Özlem jî li ser vê teoriyê van agahiyên dide: “Ev teorî, jiyîna li gorî exlaqê dişibîne hunera bextewariya takekesî û civakî. Herweha destnîşan dike ku divê berjewendiya takekesî jî bi berjewendiya raya giştî û bi bextewariya giştî ya civakê ve biguncive.”¹¹⁶

Di analîza sê peyamên etîkê de jî bextewariya takekesî û civakê li ber çavan hatiye girtin. Di van peyaman de tu hêmanên li dijî guncawbûna bextewariya takekesî û civakê nehatine erêkirin.

Di nav civatên Kurdan de vegotina çîrokên bi vî rengî texmînen heta berî niha bi 20-25 salan di radeyeke bilind de bû. Lewra tê zanîn, dema ku civatek digeriya, teqez di wê civatê de çîrok jî dihatin vegotin. Di nav wan çîrokan de jî hin peyamên etîkê cih digirtin. Rêjeya vegotinê li gorî wê demê bi awayekî eşkere kêmbûnê jî, nayê wê wateyê ku vegotin ji holê rabûye.

¹¹⁵ Fred Feldman, h.b., r. 33-34

¹¹⁶ Doğan Özlem, *Etik-Ahlak Felsefesi*, Say Yay, İstanbul, 2010, r. 73-74.

ENCAM

Me di vê xebatê de di çarçoveya Teoriya Folklorî Fonksiyonalîst de hin çîrokên gelêrî yên herêma Mêrdînê bi rêbazên zanistî berhev kirin û fonksiyonên wan ên perwerdekirina zarok û civakê, ligel peyamên wan, ji aliyên civakî, psîkolojîk, aborî û etîkî analîz kirin.

Di Beşa 1ê de Folklorî Fonksiyonalîst ji perspektîfa hin teorisyanên ku di heman demê de lêkolînên qadê jî kirine, hat nirxandin. Di vê nirxandinê de hat dîtin ku ev teorî bi giştî ji bo perwerdekirinê sûdmend e. Sedema hilbijartina vê teoriyê jî xwe spart parastina nirxên folklorîk ên ku êdî ji holê radibin. Çîrokên gelêrî jî wan nirxan in ku ro bi ro wenda dibin.

Di çarçoveya vê teoriyê de li ser çîrokên bi Kurdiya Kurmancî tu xebatên akademîk nehatine kirin. Bêguman xebatên hêja yên berhevkerinê hene, lêbelê ew xebat li ser bingeheke teorîk ên folklorê nehatine kirin. Ku mirov tevahiya referansên li ser vê babetê bi kurtî rave bike; derdikeve holê ku kereste û metnên wan bi serê xwe rijî ne. Divê têkiliyên wan ên civakî û psîkolojîk bî lêkolînkirin û famkirin. Ev xebat, ligel kêmaniyên xwe, îddîa dike ku pêşiya xebatên akademîk ên bi vî rengî were vekirin.

Di heman çarçoveyê de li ser Fonksiyona Çîrokan Perwerdehî hat sekinandin. Hat dîtin ku ji demên kevin û heta niha di nav medeniyet û dewletên pêşketî de fonksiyonên çîrokan ên perwerdehiyê ji aliyê pedagoj û filozofan ve hatiye zanîn û bi zanînê hatiye tevgerandin. Hem di dibistanan de, hem li civatên gund û bajaran ev perwerdekirin her dom kiriye. Herçiqa asta teknolojiyê pêşketî be jî û *dijminê zargotinê* hebin jî heta ku diyardeya civatê di nav mirovan de zindî bimîne, dê çîrok jî û fonksiyona wan a perwerdehiyê jî dom bike.

Di beşa 2yan de li ser cure, tekst, peyam û analîza peyamên çîrokan hat sekinandin. Tekst, li gorî cureyan hatin senifandin. Mirov dikare bibêje ku di senifandina çîrokên Kurmancî de û bi navê cureya *Çîrokên Derewan* yekem car bi çîrokên “Kose, Berkose û Safikose”, “Sê Bira û Topê Cawê Wan” û “Dikançî û Derewa Li Ser Fîlê” re hatin tomarkirin. Bêguman çîrokên ku bi naveroka xwe

dikevin nav vê cureyê dê hebin. Di warê senifandina çîrokên bi vê rengî de ev cure belkî ji îro pê ve were bikaranîn. Herweha ji ber ku wateyên hin peyaman nêzîkî hev bûn; ew di binê sernavê analîzekê de hatin dayîn. Di çîrokan de muxatabên peyaman bi her awayî civak e. Loma jî endamên civakan jî helbet hewcedarê psîkolojiyê baş in. Di çîrokan de bikaranîna peyamên psîkolojîk ji vê hewcedariyê tê.

Çîrokên ku ji hemû binbeşan peyaman di xwe de dihewînin ango çîroka ku ji aliyê hejmara peyaman zêde ye, ya bi navê Elik û Fatik e. Yek ji sedemên vê yekê dirêjbûna çîrokê û belavbûna vê çîrokê ya li gelek herêman e. Ji ber navdarbûna çîrokê, gelek guhertoyên wê hene.

Ji aliyê naverok û hevbeşiya peyaman ve di her 25 çîrokan de jî wek xalên hevbeş derdiketin pêş. Mirov dikare kakilê hevbeşiyên wan peyaman bi kurtî weha bide: Neyîniyên xerabiyên, qencîxwestin, bext, rêzgirtina li hemberî adetan, qedirzaniya li hemberî jinê, sebir, musamaha, tehemmul, camêrî, mazûvanî, hezkirin, şîretkirin, alîkarî, tevdîr, qezenca ji kar û xebatê. Herweha wekî ku tê zanîn, ev peyamên kakilî di nav civakê de jî wekî pîvanên etîkê tînan qebûlkirin û dikevin çarçoveya Teoriya Havilperestiyê jî.

Di beşa 3yan de jî me cih da nirxandina analîza çîrokan. Di nirxandinê de derket holê ku tu çîrok ne bê peyam e; ango peyamên wê xwedî fonksiyonên perwerdehiyê ne. Lewra hat dîtin ku ev peyam ji aliyên civakî, psîkolojîk, aborî û etîkê ve fonksiyonên xwe yê perwerdehiyê li ser zarok û civakê bi cih tînin.

Ji aliyê wateyê ve hin peyam nêzîkî hev derketin. Mirov dikare bi kurtî van encaman ji xalên hevbeş derxîne: Qencî, başî û asoxî zora xerabî û nebaşiyê dibin. Lê divê mirov ewqasî jî ne xweşbîn be; lewra, mirovên ku dixwazin zirarê bidin me herdem dê hebin. Loma jî divê em zû bi zû bi mirovan bawer nebin û bi tevdîr bin. Mirov dikare tevdîrên xwe ligel hevalên xwe yê dilsoz bigire da ku ew me li nêviyê rê nehêlin.

Wekî ku tê dîtin hemû dane nîşan didin ku çîrok, xwedî fonksiyona perwerdeyêke pîralî ne. Ew di civat, dibistan, kargeh, gund û bajaran de di pozîsyoneke fonksiyonel a perwerdehî de ne. Herçiqas di vê serdema ku teknolojî

gelek pêşketejiye de bikaranîna wan kêr bûbe jî, rastiya fonksiyona wan a perwerdehî dê tim di rojevê de be û him bi him dê lêkolînên berfirehtir li ser wan bînin kirin.

Wek encam, ji bo ku girîngiya çîrokan bêtir were famkirin hewcedarî bi hin pêngavan heye:

* Girîngtirîn pêngav ew e ku bi taybetî ji zarokan re vegotina çîrokan bê berdewamkirin.

* Pirtûkên çîrokan, bêtir bînin çap kirin û belavkirin.

* Çêkirina animasyon, filmê karton û amadekirina lîstikên şanoyê yê zarokan ku mijar û lehengên wan ji çîrokan hatibin wergirtin.

* Çêkirina bernameyên çîrokbêjan. Ev bername dikare hem li hin mekanên çand û hunerî hem jî di medyayê de bînin çêkirin û tomarkirin. Lewra bi qasî ku girîngî ji bo dengbêjan tê dayîn, divê ji bo çîrokbêjan jî bê dayîn.

* Weşandina kovar û fanzînen ku çîrok û vegotinên din dihewînin.

* Rûmetdayîna xebatên berhevkarîya çîrokan.

ÇAVKANÎ

- Akyol, Hîlmî, *Dengbêj û Çîrokbêjên Amedê*, do, Stenbol, 2014
- Akyol, Hilmi, *Kew û Kew*, do, Stenbol, 2010
- Akyol, Hîlmî, *Mamê Rovî*, do, Stenbol, 2008
- Akyol, H., *Senem Xanim*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2000
- Barîk, Mahmut, *Ax Piştî Min*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2003
- Bascom, William R., “Folklorün Dört İşlevi”, *Halkbiliminde Kuramlar ve Yaklaşımlar 2*, Geleneksel Yay, Ankara, 2010, (71-86)
- Bates, Daniel G., *21.Yüzyılda Kültürel Antropoloji*, Stenbol Bilgi Üniversitesi Yay, Stenbol, 2009
- Bazîdî, Mela Mehmûdê, *Cami 'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, Zîya Avcî(amd.), Lîs, Stenbol, 2010
- Bazîdî, Mela Mehmûdê, *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*, Jan Dost (tpg.-lêk.), Nûbihar, Stenbol, 2010
- Bilgin, Nuri, *Sosyal Psikoloji Sözlüğü*, Bağlam Yayıncılık, Stenbol, 2007
- Boratav, Pertev Naili, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Gerçek Yay., Stenbol, 1969
- Celîl, Celîlê, *Çima Deve Xeyîdî?*, Wardoz, Amed, 2018
- Celîl, Celîlê, *Zargotina Kurdên Sûrîyeyê*, Wardoz, Amed, 2018
- Celîl, O., - Celîl, C., *Zargotina Kurda II*, aram, Amed, 2013
- Celîl, C. – Celîl, O., *Gotinên Pêşîyan*, Wardoz, Amed, 2018
- Cindî, H., - Evdal, E., *Folkloru Kurmanca*, Avesta, Stenbol, 2008
- Çobanoğlu, Özkul, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ, Ankara, 2012
- Devîren, Mehmet, *Doxîn 18+*, J&J, Stenbol, 2013
- Doğan, D.Mehmet, *Büyük Türkçe Sözlük*, Vadi Yay, Ankara, 2003
- Dorson, Richard M., *Günümüz Folklor Kuramları*, S.Gürçayır-Y.Özay(wer.), Geleneksel, Ankara, 2011
- Farqînî, Îdrîs, *Bi Zarê Êzîdiyan Çîrokên Gelêrî*, J&J, Stenbol, 2011
- Feldman, Fred, *Etik Nedir?*, Ferit B.Aydar(wer.), Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi, İstanbul, 2012

- Fidan, Mesut, “Ji Hêla Perwerdeya Zarokan ve Vekolîna Çîrokan” (Projeya Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013)
- Frolov, İvan, *Felsefe Sözlüğü*, Aziz Çalışlar(wer.), cem yayınevi, Stenbol, 1997
- Gennep, Arnold Van, *Folklor*, Pertev N.Boratav(wer.), Ulus Basımevi, Ankara, 1939
- Goldstein, Kenneth S., *Sahada Folklor Derleme Metotları*, Ahmet E. Uysal (wer), Başbakanlık Basımevi, Ankara, 1983
- Görgü, Ali Turan, “ Masalların Çocuğun Bilişsel ve Duyuşsal Gelişimine Katkısı”, *II. Ulusal Çocuk ve Gençlik Edebiyatı Sempozyumu*, Ankara, (0406/10/2006), r. 537-544
- Güneş, Hasan, *Eğitim Bilimleri Terimleri Sözlüğü*, Ütopya Yayınevi, Ankara, 2015
- Hikmet, Bedran, *Teorîyên Folklorê*, Lîs, Amed, 2016
- Kanad, H.Fikret, *Pedagoji Tarihi*, Milli Eğitim Basımevi, Stenbol, 1963
- Kantarcıoğlu, Selçuk, *Eğitimde Masalın Yeri*, MEB, 1991
- Kızılkaya, İlhan, *Fêrbûn*, Rûpel, Stenbol, 2014
- Köymen, Oya, “Bronislaw Malinowski”, *Türk ve Dünya Ünlüleri Ansiklopedisi*, c.7, Anadolu, Stenbol, 1983
- Krohn, J.– Krohn, K., *Halk Bilimi Yöntemi*, G. İçöz(wer.),F. Türmen(tpg.), Türk Dil Kurumu Yay, Ankara, 2004
- Malinowski, B., *Bilimsel Bir Kültür Teorisi*, Kabalcı, Stenbol, 1992
- Mazî, Çiya, *Baxek Ji Folklorê Kurdî-Ji Derdora Mêrdîn-*, berbang, Stenbol, 2014
- Omerî, Bro, *Carekê Ji Caran*, avesta, Stenbol, 2013
- Ozdemîr, Feysel, *Rûpelên Binaxkirî*, J&J, Stenbol, 2013
- Özbudun S., Şafak, B., Altuntek, N.S., *Antropoloji, Kuramlar/Kuramcılar*, dipnot, Ankara, 2006
- Özlem, Doğan, *Etik-Ahlak Felsefesi*, Say Yay, Stenbol, 2010
- Pertev Ramazan, *Zarok û Çîrok*, Doz, Stenbol, 2008
- Püsküllüoğlu, Ali, *Arkadaş Türkçe Sözlük*, Arkadaş Yay, Ankara, 1994
- Şahin, Mustafa, “Masalların Çocuk Gelişimine Etkilerinin Öğretmen Görüşleri Açısından İncelenmesi”, *Milli Folklor*, hj. 89, r. 208-219
- Şirin, Mustafa R., *Masal Atlası*, Kök Yayıncılık, Ankara, 2007
- Tan, Nail, *Folklor (Halkbilimi) Genel Bilgiler*, Halk Kültürü Yay, Stenbol, 1985

- Tarduş, İbrahim, “*Bikaranîna Çîrokên Kurdî Di Perwerdeya Zarokan De*” (Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstîtuya Zimanên Zindî yên Li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015)
- Xamo, Zinarê, *Hebû Tunebû*, rûpel, Stenbol, 2014
- Yavuz, Muhsine H., *Masallar ve Eđitimsel İşlevleri*, Cumhuriyet Kitapları, Stenbol, 2009
- Yıldırım, K., Pertev, R., Aslan, M., *Ji Destpêkê Heta Niha FOLKLORA KURDÎ*, MAÛ TYDE Yay, Stenbol, 20

ÇAVKANİYÊN DİJÎTAL

- Aykaç, Yakup, “Bîbliyografyaya Tezên Beşên Kurdolojiyê Yên Li Tirkîyeyê (2011-2016)”, 2017, *The Journal of Mesopotamian Studies (JMS)*, C.2, 119-135, <http://jms.artuklu.edu.tr/issue/27754/294524>, (05/03/2018)
- Çevirme, Hülya, “Masal ve Efsanelerde Halk Eđitimi”, 2004, <http://www.pegem.net/akademi/3-8211-Masal-ve-Efsanelerde-Halk-Egitimi.aspx>, (22/07/2017)
- Sosyologlar, “Kültürel Yaklaşımlar: Temel Antropoloji Kuramları”, <http://sosyolojisi.com/kulture-yaklasimlartemelantropolojikuramlari/3057.html>, (29/01/2016)
- Şimşek, Esmâ, *YukarıÇukurova Masallarında Masal ve Tip Araştırmaları*, 2001, (<https://turuz.com/book/title/yuxari-chuxurova-masallarinda-motiv-ve-tip-arashdirmalari>), (30/12/2017)

